Şêx Eskerî

# IQDÊ DURFAM



Stockholm 1989

# IQDÊ DURFAM

## Şêx Eskerî

Wergêr ji tîpên Erebî:

Zeynelabidîn ZINAR (Kaya)

**Weşanên Apec-tryck & Förlag**

Iqdê Durfam
Weşan no: 4

Utgivare: APEC-TRYCK & FÖRLAG
Box 3318
S 163 03 SPANGA
Sweden

ISBN 91 87730 16 - 2

Weşanên Apec-tryck & Förlag
© Z. Abidîn & Apec-tryck & Förlag



Şêx Eskerî 1898 - 1952

## PÊŞGOTIN

Nivîskarê hêja hozanê berêz î giranbiha û dilovan şêx Eskerî di sala 1316 an ( 1898-1899) de, li gundê Axtepe hatîye dinê û di sala 1952 an de jî çavên xwe ji dinya jîndar girtine û li gundê Çolê di wargeya xwe ya daîmî de radikeve û kurê şêx Evdirehmanê Axtepî ye. Ewî destpêka xwendinê li cem bavê xwe di xwendegeha Axtepê de kirîye, di pey dilovanîya bavê de, li nik birayê xwe şêx Kerbela domandîye.Şêx Eskerî di hin deman de li gundê Hilerê ( Çêrmûk) û li gundê Bîrsinê (Egil- Diyarbekir) bi malîtî maye.

Şêxê me yê hozan li pey xwe ji me re du pirtûk diyarî hiştine. Yek ev pirtûka IQDÊ DURFAM e, ya din jî dîwanek e. Lê mixabin heta niha yek ji wan jî, çap nebûye. Belam melayek bi navê Z.Ç. her yek ji wanakan bi destxeta xwe nusxeyek bi tîpên Erebî, di sala 198O de derxistine. Fotoqopîyên wan herdukên destxetên wî Meleyî bi alîkarîya hin biraderên welatparêz gihan destên me. Me ew herdu jî wergerandin tîpên Latînî û pêşkêşî xwendevanên hêja kirin.

Nivîskarê hêja di wan demên tarî û li bin xwînxwarî û barbarîya Komara Tirkîyê de bizivîye û di şûna şûr de xameya devjehrî lipikandîye û ew herdu pirtûk nivîsîne. Hem jî çi nivîsar! çîrokan bi helbestkî nivîsîne. Meriv guman dike, ku wê pirtûkên bi vê rewşê li dinê tinebin, yan jî wê pir kêm hebin!

IQDÊ DURFAM çewa ku me got, hin çîrokên Kurdî ne, ku şêx Eskerî ew bi helbestkî ristine. Bi kinatî Çîrok weha ye:
Derwêşek bi rêbiwarî bi rê ve diçe, dibîne ku lawikek ji birçîyan digirî. Ew parîyek penîr dide Lêwik û li riya xwe dikudîne diçe. Di pey de ew penîrê xwe datîne erdê da ku serçavê xwe bişo, qijikek diçe wî penîrî digire û difire diçe li ser darekê datîne. Îcar rovîyek jî, di dev de ew penîr dibîne û ramana çêkirina dek û xapan dike û xwe dixe şûfê sofîyekî zahid û diçe li bin Darê dikeve zikr û cezbeyan û bi navê "Şahê bilbilan" gazî Qijika penîrdevde dike û li serê gelek helbest û xezelan dibêje. Di pey de, Qijik bawer dike, ku ew şahê bilbila ye û xwe berî erdê cem Rovî dide. Hema ew penîr jê distîne û diçe, di rê de li parîyek dûvê pez rast tê. Ew diçe ku wî parîyê dûv jî bixwo, tunebê nêçîrvanekî faq vegirtîye û Rovî tê de asê dimîne, heta ku Nêçîrvan tê û serê Rovî jê dike.

Nivîskarê mêrxas, li ser daxwaz û bi pêşnîyarîya kurmamê xwe Behcet dest bi vê pirtûkê kirîye. Lê mixabin bi kurtedemek li pey destpêka wê, Behcet koça xwe ji dinê bar dike û Şêxê me jî, ji nivisandina wê dilsar dibe û qelema xwe disekinîne. Gelek sal derbasdibin, paşê hin dost û hevalên wî bi birayê wî şêx Kerbela ve diçin cem û lê doza temamkirina Iqdê Durfam dikin. Her çiqas ew xwe ji ber wan diçerixîne jî, lê wî mecbûr dihêlin ku nivisandina wê kuta bike. Nivîskar weha dibêje:

*"Dizanim îltîfatê nadinê kes*
*Ji ber ehlê huner kêm in mededres"*

Sedemê nivîsandina bi zimanê zikmakî jî weha dibêje:

*"Gelek şêrîn e ev ezmanê Kurda*
*Derîxa! me ji dest yekcarî berda"*

Hozanê hêja sedemê giringtirîn weha beyan dike:

*"Pesindîde nîne Kurmancî ye saf*
*Xuya ye ne huner tev gotin û laf"*

Şêx Eskerî di sala 1938 an de dest bi nivîsandina Iqdê Durfam kirîye û di sala 1942 an de, li gundê Bîrsinê kuta kirîye. Dema ku wî ev nivîsîye, temenê wî 39 sal bû.

Pirtûk ji 13 beşan ava ye, beytên wê bi kêş û qafîye ne û hemû li ser yazde kiteyan in, her du rêz jî bi yek qafîyê ne. Hejmara malikan 2584 in. Lê çewa ku Hozan di paşîyê de bi qelema xwe nivîsîye, dibêje ku: "Hejmara tevekê kitêba Iqdê Durfam digîje 2579"an.

Di vî karê me de dibe ku hin şaşî û nerastî peyda bûbin. Lê bi hêvî me ku wê xwendevan li me biborin, çimkî ev karekî piçûk bû ku me ji zimanê xwe yê "qedexe" re kir û bi umîd im ku dê pir feyde bigîjîne kultura Kurdî. Hem pirtûk ji mirinê difilite û pêşkêşî xwendevanan dibe, hem jî pirtûkxana Kurdistanê dewlemendtir dibe. Herweha dilxweş û şad im, her çiqas ger bi hindikayî be jî, berpirsîyarîya li hember gelê xwe yê bindest tînim cî.

**30.05.1988**

**Zeynelabidîn Zinar (Kaya)**

# BENDÊ EWEL

## DER MEBHESÊ TEWHÎDÊ XUDA WE 'EZMÎHÎ

Bîsmîllahîrrehmanêrrehîm
Dikim hemd û senayê te Kerîm

Dibêjim pur selat û hem selaman
Li ser Peyxember û al û sehaban

Şukur bo wî Xwedayê xaliq û ferd
Qelem perwazî da ez quwweta hemd

Bi hemd û teslîye em bûn mûşerref
Quwet pur jê girêda name der kef

Bi îsmê te neqiş kir Nameya me
Bi hemdê te kuşade Nameya me

Bi hemdê te me xame hate perwaz
Bi cumbuş hate zikr û coş û awaz

Bi namê te mûbarek namê Name
Ji hemdê te mûzeyyen neqşê xame

Bi hemdê hate quwwet ev kemerbend
Neqişbend in li ser kaxiz xetê çend

Neqiş kir xame ber name delîlek
Bi hemd û şukrê Heq saf û cemîlek

Bi van min îftîtaha nameyê kir
Di ewwel pê me neqşê xameyê kir

Gelek mesûd im û sahibse'adet
Ji tesîra evan îsmê hîdayet

Hezaran hemd û şukrê bê nîhayet
Ji bo te hadîyê rahê zelalet

Tehîyyat û senayê pak î tahir
Dikim her ez ji bo te heyyê qadir

Xwedayê mutleq î, qudret'ezîm î
Xwedanê fezl û îhsana 'emîm î

Çiqa hemdê hene faîq ji bo te
Kerîm î, mun'imê laîq ji bo te

Qedîm î, layezal î û besîr î
Semî' î, hem li kullê şey qedîr î

"Huwel ewwel, huwel axir" ew e her
"Huwel batin, huwe'zzahir" ew e her

Neborîne li ser wî weqt û ezman
Ne ewwel axir e, ew zatê Yezdan

Bi zatê pak ê xwe qaîm e ew tek
Ji bo kes ra ne muhtac e bîla şek

Mûnezzeh zatê Barî bê mekan e
Û hem bê lewn û reng û bê nîşan e

Welê nîşanê ilm û hikmeta wî
Ji alem tête zanîn qudreta wî

Ew e heyyê letîf ê bê xur û xwab
Neşebhî zatê pakî bî dê yû bab

Ji xeyri wî Xwedayê heq muqeddes
Heme eşya fena dê bin heme kes

Ew e bo her kesî rezzaqê mutleq
Xwedayê erd û esman Mexrib û Şerq

Ku ev esman û ev hicmê sitêran
Dida seknandinê bê pişt û kêran

Mûzeyyen kir bi mîsbahan sema pur
Diîse her yekî tê da wekî dur

Wucûda alemê tev emrê KUN bû
Hinik hişyar û hin mestê sexun bû

Mûtî'ê emrê bûn tevde yekayek
Çi teqdîrê hebû bo wan bîla şek

Çi hedd û cur'eta xelqê xeternak
Bi der bêtin ji emrê Xaliqê pak?

Tu yî qadir, bi yek emrê te yê KUN
Mûkemmel bûye alem bê ser û bin

Bîla 'eyb û tilî îcada 'alem
Te kirye, ey hekîmê zatê e'zem

Hemî fanosek û tê da şemalek
Te danî nûrê pur husn û cemalek

Ji wê nûr û cemala ehsenî yar
Hemî hey bûn û hin genc û hinik mar

Muzeyyen kir hemî ev xaneya xak
Ku tê heyranî mane ehlê eflak

Bi ma û me'den û gulzar û heywan
Xusûsa ba qed û sîmayê însan

Şukur daîm ji bo xellaqê alem
Mûzeyyen ku heme alem ji Adem

Evê dunya ku şubhê sînema ye
We lê emma 'eceb sun'ê Xuda ye

Motora qudret û emrê îlahî
Dişuxle tê de her dem an û gahî

Evan îliktirîqê hîv û rojan
Dikin tenwîrê vê perdê wekî can

Zeman mislê şerîd e şan û ehwal
Hemî pê ve dibin ba şikl û eqwal

Ji ilm û qudreta Rebbê mûqeddes
Dibin zahir peyapey bo heme kes

Evê makîneya alem te çê kir
Hizaran îşê mexlûqê xwe pê kir

Di nav hev de diçin-tên çerx û dolab
Şev û ro jê dibin şêrîn û şorab

Di nav de sedhezaran şan û ehwal
Dibin zahir, nizanit kes çî ye hal

Çi ehsen întîzam e ya Îlahî
Ji erşê heq heta bê ga û mahî

Eger encum û ger eflakê der ger
Çi maddî, me'newî mexlûqê yekser

Hemî tevde mûtî'ê emr û ferman
Dikin xizmet mudamî ba ruh û can

Didin şehde ji bo ferdîyyeta te
Mûqîrr in tev bi me'bûdîyyeta te

Çiqasa hikmet û qudretxuya yî!
Ji vî sun'ê 'ecayîbî Xweda yî

Di yek lehze hezaran alemê dî
Dikarî xelqî kî bêşubhe min dî

Hilînî destê qudret wê dema tu
Ji çerxa makîna van alema tu

Mu'ettel dê bibin xurde hemî tev
Mûheqqeq wê fena bin ev ro û şev

Heqîqet gotîye pîrê Xezalî
Ewê behrê me'anî pur lualî

Çi rast e "leyse fîl îmkanî ebde'"
Ku "mîmma kane" xweş bûye mûsenne'

'Ecayîb qudret e îcada alem
Wuharenge mûtî'ê emrê ne hem

Temamî kes nizane hîkmetê te
Evan neqşê xerîb ê sen'etê te

Îlahî em nizanin dê çi bêjin
We hem pur naqis in, medhûş û gêj in

Zeîf û rûreş in bê quwwet û jar
Zelûm û hem cehûl in axik e sar

Wekî ku tu xuda yî, zilcelal î
Heqîqetnasikên tevlî vî halî

Bi vî halî çewan dê te binasim?
Eger rehmet nekî nîne xelasim!

Di taristana nefsê kor û gêj im
Bi koranî bi mehcûbî dibêjim

Yeqîn im em nezanê lal û e'ma
Xerîq in der gunahê mislê derya

Ker û lal in Xwedaya der fena ne
Feqîrek rûreş in ber der geda ne

Bêxayet rûsîyeh, bê çeşm û goş in
Di nav mewcê guneh bê eql û hoş in

Gelek bê quwwet in ya Reb eman e
Bi ezdadan dizanim em bina ne

Bi van dîwarê axê mubtela me
Ji ba û ab û ateş libs û cam e

Wekî teyrê qefes zîndana wî bit
Hezaran reffê xem mîhmanê wî bit

Ji seyra bax û bostana cuda be
Perakende bi derd û bêseda be

Di dam û tora xem dil par û xwûn
Ji xewf û heybetê mehzûn û mecnûn

Ji ahînê, wê bêtin bihna buryan
Di hepsê dil bi nar û dîde giryan

Qefes ew jê qebes kit ateş û nar
Tenê tenha di gerden pêçê reşmar

Hezîn û dilbirînê cem'ê murxan
Di sîne sewta ney bêtin ji efxan

Tu der halatê teqdîsê nig û kar
Tedennus bûye perde ser minê jar

Ku em yek qetreyê abê fena ne
'Enasir muxtelif tê da civane

Çi heddê me îlahî rûreş in em
Gunehkar û hezîn û dilxeş in em

Bi vê qasirnerîna xwe cîgerxwûn
Ku waqi' bin li kunha zatê bêçûn

Binasin em bi laîqî çi mumkin
Xwedayê erd û esman însî yû cin

Xwedayê ku ji yek qetre menî-av
Çi şekl û sûretan ew tîne ber çav

'Ecaîb lê di vê avê nuqûşan
Dirêje hem suran der cam û şûşan

Ji bo rûafitab û çavxezalan
Dide xal û xetan dil pê be talan

Ji ber pertawê bisk ê wechê dîlber
Xezalan ketye gerden miskê ezfer

Hezar û gul ji husna dîlbera gul
Gerîbançak in û dildax û pur kul

Şukur bo te Xudaya sed hezar bar
Ji xal û xet bi qeyd in dil birîndar

Dikin hêvî yû mînnet her dema pur
Ji dergahê te û nûra hemî sur

Bi 'işqa te hebibî her bi dil bin
Ne ku mexrûrê dunya  dil bi xil bin

Dikim şukr û sena bêhedd û xayet
Ji bo te xaliqê sahib'înayet

Ji behra rehmeta bê pa û bê ser
Te danîne wucûdê ba ser û ber

Mûzeyyen kir seraser ev qed û qam
Ji lutfa xwe li me îhsan û îkram:

Şukur da me dev û nutq û şehadet
We hem çehv û guh û 'eql û feraset

Hewasê zahir û batin kerem kir
Mûkemmel girtin û dil tê de cem kir

Didin şehde bi van bo zatê wahid
We hem bo wan kesê ku bûne qasid

Xusûsa Mustefayê rehber û heq
Ji bo cumle resûlan şah e mutleq

Muhemmed rehmet e lil alemine
Ji bo me rehberê dunya û dîn e

Bi cumle bawer im herçî Xuda pê
Kire emr û ji bo me nehyê kir jê

Şukur bo te bi şehde bûn mûseddeq
Zeban ba dil dibêjit gotina heq

Ji wan ehlê heqîqetnasî nîn im
Welê yek kelbekî dilxwazê dîn im

Ev e ummîd û cîsekna min î bed
Ku yek teqlîd e der dînê Muhemmed

Dikim şukr û sena û hemdê her car
Te kirne ummeta mehbûbê muxtar

Şukur bûn tûleyê xeyru'rrusul em
Bi fezla xaliqê rezzaq ê alem

Sipas û minnetê purpak û enfes
Ji bo wî zatê bêçûn ê mûqeddes

Ku da lutf û 'înayet bo minê jar
Kirim kelbê neazad ê derê yar

Tu yî şahê cemî'ê padîşahan
Tu yî bexşendeyê wehm û gunahan

Qusûr û qebhet im cumle 'efû ke
Kîtaba zenbê min tevde mehû ke

Heta axirnefes nûra Muhemmed
Ji bo me bêkesan kî rehber û ked

Hifiz bin pê ji wî şeytanê mel'ûn
We hem jî pê ji vê nefsa gelek dûn

Heqê ni'met li ser me pir bûye bar
Di bin de mane aciz, jar û naçar

Di bin van ni'metê heq puştîxwar im
Şefa'et ke hebîba şermîsar im

Li ser wî Ehmedê çû Lamekana
Di her gav û dem û an û zemana

Bibarin pur selatê Xaliq ê kul
We hem jî, ew selamên herwekî gul

Bi heqqê wî hebîbê pak û tahir
'Efû ke Eskerî ey Rebbê qadir!

# BENDA DUWEM

## DER MEBHESA SELAT Û SELAM
## Û ÎBTÎDAYA NÛRA MUHEMMED ssxl.

Were saqî di vê subha munewwer
Bide hin camê mey tê bihna dîlber

Serê min çingeçing e dil xuroş e
Ne eqlê musteqîm ma tê de, boş e

Ji îhsanê şerabek telxîweş xweş
Bide, bêhûşî ma dil bînite heş

Di roja ewr(i) meyxwarin sewab e
Bide te'mîrê kim qelbê xerabe

Û hem barana rehmet tête xwarê
Hewa nerm û letîf e wek buharê

Heme esbabê keyf û şadîmanî
Şukur tev hazir in bêsergiranî

Welêkin mame bê ehbab û bê yar
Tenê mame ji dûrî dil bûye nar

Bi destê xwe nedî ey serwîazad
Du-sê cam û qedeh da dil bibit şad

Li me bêşubhe tev derd û 'ezab in
Di dil da yek bi yek xar û kulab in

Tu zanî her tu yî sebra minê jar
Sebata vî dilê sergeşte bêwar

Şev û rojan hevalê min xem in xem
Nema çare ji vî derdê demadem

Esîrê dama işqa dîlberê ne
Ji keyfa vê cîhanê dilbiri ne

Eger îhmalê kî vê xwestina min
Tedawî nabe ev dilgestina min

Bi destê xwe bide çend cam û saxer
Defî' kim van xemê qelbê xwe pê her

Bibînim qameta şubhê sipîndar
Di wê sayê bela bin derd û ekdar

Wefa nîne di vê qehpa cîhan da
Xusûsa ku di ebnayê zeman da

Umîda min bi kes nîne rehet bim
Di kî bawer jin û ba xal û met bim

Perîşan im ji destê firqeta yar
Ne min îş û xebat û feyde û kar

Ji tîrê qewsê dîlber dilbiêş im
Wuha bêîxtîyarî derdîkêş im

Ji dil re her dibêm:Ey bê ser û pa
Eya miskînê ehqer ser tijî ba

Qe nabînî tu halê dîlbera xwe
Evî poladê qelb û dîlbera xwe?

Çira nakî nezer carek bi dîqqet?
Peyapey her dixwî jê zor û zehmet!

Bi şîret geh dibêm geh herb û ceng e
Ji vê sewdê veger, guh nake deng e!

Li ku qedrê te ey bêçare sersem
Çi beyhûde dibî sergeşte pur xem?

Bibînî şahê xûban ew perî reng
Ewê nûra mûcessem nazik û şeng

Hebîba keckuleh purheybeta şah
Zerîfa nazika pursir dilagah

Semenqedda qewi ba qedr û şewket
Kesê wek te bibînit bê heqîqet"

Vegêra dil cewabek xweşdil û qenc:
Qe nabînî Suleymanê xwedîgenc?

Digel wê heşmet û qedrê îlahî
Nezer dêra li mûra bênewayî!

Çi kêmî hate qedr û şewketa wî?
Çi nuqsan bû ji xewf û heybeta wî?

Hemî peyxemberanê hemî nûr
Bi vî hawî dibûn memnûn û mesrûr

We pir waqi' bûye şahanê pêşîn
Xudanê fezl û rehmê peyrewê dîn

Peya bûne li mala pîreka jar
Perîşanê ji dewrê dil tijî jar

Wuha der xaneya bê şem' û cîrax
Dirûniştin ji lutfê ber serê ax

Ji îhsanê gelek derman û merhem
Li cerhê qelbê wan danîne dirhem"

E'jê zêde hezîn û bê mecal im
Bi hêvî me bişewte dil bi hal im!

Bi naz û şîwe sultanê cîhangîr
Bi rehmet nezer ke bînite bîr

Kerîm e dilbirehm e purkemal e
Yeqîn şehzade ye şahê cemal e

Kesê ehsen bitin ba şiklekî qenc
Çi mumkin ew bikit xeddarî yû renc?

Çi mehzûr e ku ew şahê cemalî
Me geh geh bînitin bezma xiyalî?

Qe bawer nakî ma ew şahê şêrîn
'Înayet ke li Ferhadê cîgerxwîn!

Temaşa kit bi zar û cîlweyên xweş
Li kûhê bê sitûnê qelb ê bê heş

Dikim hêvî yû pur ummîdîwar im
Li kûhê dîlberê yek axîsar im

Li dergahê nîgarê xakîrah im
Di herdû aleman her ew penah im

Ku bêt serwa rewan saye bide min
Ji paya saye yê maye bide min

Sebir tal e, û lê şêrîn e fêkî
Sebir ke, lazim e ta ew ku çêkî!

Mi dî ku rasite ev gotina dil
Ne ku beyhûde ye hem sotina dil

Welêkin zêde sergerm e wekî nar
Bi işqa nazik a şehzadeya yar

Meger îhsan bikî pur şûşe û cam
Dibit ku bîte teskînê dilê xam

Li dil her pendê şubh ê ba ye der nar
Çiqa ba bê, dibit ew nar ê dişwar

Ji bo aşiq nesîhet ger tu bêjî
Çiqa bêjî tu dil zêde dipêjî

Bide saqî tu dermanê dilê dîn
Ji wê meyxaneya pîrê rehê dîn

Bi yumna badeyê ev qelbê serkeş
Bikin pê re mezaza gavekî xweş

Tu zû ke hiş dewa ke vê seqîmê
Ku rehwan bim li rahê musteqîmê

Ku belkî karibim çend setrê mewzûn
E'jî binvîsime teşbîhê Mecnûn

Heta Mecnûn nebim der işqa Leyla
Nekim der kûh û sehra wayêweyla

Li etrafê me şêr û teyr û xergûş
Xezal û ademî însanê xergûş

Bibin heyran û tevda goşîdar bin
Bi can û dil şîyar bin hûşîyar bin

Çuqasa rûhber û mexlûqê der xelq
Ji zora dîlberê ew xwarik in helq

Ji kû dê karibim şi'r û qesîde
Bibêjim hem bi me'nayê guzîde!

Bi kullî daweşînim per ji derdan
Ku belkî karibim bêjim xeberdan

Were ey saqîyê bezma perînaz
Ji bo me lutfi ke hin badeya raz

Ji rûhê wan gulê pîr ê mûxanî
Bide çend camê raz ê erxewanî

Di vê xilqîyyeta alem de çend soz
Hinik razê dilefrûz ê cîgersoz

Ku bêjim karibim van nukteyê hûr
Evan esrar û me'nayên di pirnûr

Beyan kim razehayê her wekî rûz
Ji nav perda şevê herfên dilefrûz

Dema hez kir ewî xellaqê alem
Ku bêt zanîn, wucûd kir rûhê Adem

Ji Adem ademîyyet bigre ey can
Ku rûhê e'zem e mehbûbê Yezdan

Ji nûra xwe qebiz kir nûrekî tam
Kire rehmet ji bo şey'ê xwedînam

Ji ber wê şûleyê bû Ademî xak
Beser lê ruhnî yû hey bû, gelek pak

Ji tesîra wî rûhê e'zem e her
Ji fezla zêde ye Adem bûye ser

Girêda ehsenu'tteqwîmi ew xak
Bûye mesken ji bo nûra 'etirnak

Ji feyz û pertewê wê nûrê, ehsen
Bûye genca heyatê w sirra mexzen

Heme esmaî pê te'lîmi kirne
Ji lew esrarê wê teslîmi kirne

Ji pertaw û ji enwara wî Rûhî
Bûye Ke'be xwedanê her futuhî

Melayîk jî, ji bo Nûra mezin bû
Ji Adem re birin secde gişan zû

Û hem der Ke'be Adem ew tecellî
Didî, pê tate teskîn û tecellî

Yeqîn ew Nûr e der Ke'be wekî can
Ku bûye qîbleya cumle musulman

Ne ew qedr û şeref bit, Ke'be seng e!
Yekî sengê sîyeh bêsewt û deng e

Çi qedr û qîmet e bo çari dîwar
Ji ax û seng mebnî bit, serî dar?

Çi hedd û wezfe ye bo sengekî reş
Bibîtin qîblegaha alemê xweş?

Li nik min bêşik e ev îşê dînî
Şeref girtî mekan bûyî mekînî

Ji temsîla sedef ba durrî bûme
Dibîtin eşkera ev sirri bo me

Eger ne qedr û tesîra durê bit
Ne ca yû meskenê wê pursurê bit

Sedef kengê dibû wek xizne û kan
Ne tesîra durê tê da be, ey can !

Ji ber wê hemnişînê xalis û qenc
Ewê qîmet girêda şubhetê genc

Xuda girtî ji nûra xwe hinik nûr
Gerand eşref kire şem'a dilê kûr

Ku rakir wî ji nûra xwe cemalek
Ji wê husnê veda işqê şemalek

Dema ku bû cuda ew Nûra ehsen
Ji hubb û işqa Heq re bûye mexzen

Xuda hez kir ji wê Nûra yekane
Xerez ew bû ji emrê KUN fekane

Ji pertawê cemala Nûra pursur
Sedeq çê bû û dil ma jê re ew dur

Mûşe'şe' Nûra safa pak î tahîr
Wekî durrê Yetîm tîsa sena kir

Museffa bû ewê Nûra xudayî
Xulase kir we lê dayî cudayî

Gelek salan mûsebbîh Nûra macid
Û hem şûle veda ew şem'a qasid

Ku hilbû şu'leya şem'a cemalê
Ewê perwaneya işqa wîsalê

Li etrafê şemalê hate perwaz
Ku cewlan da li dor şem'a serefraz

Ji işqa aşiqî ew Nûri bû nar
Kete coşê wuha ew Nûra muxtar

Kelî Nûra hebîbê pak ê Yezdan
Peyapey qitre jê weryane ey can

Resûl û enbîya rûhê mûqeddes
Hemî çêbûne pê bûne mededres

Ji wê nûra mûzeyyen cumle eşya
Bûye peyda, çi? mîna berr û derya

Nîhayet çendî çêbû masîwellah
Ji wê Nûra Hebîbê ekrem û şah

Hemî hatên wucûdê lêkî sersem
Ji hîcranê gera ev çerxê alem

Ji dûrî dilbirîn û ahîkêş in
Ji derdê narê qelb ê xwe bi êş in

Heme alem ji şewq û berqê an Nûr
Wuha medhûşî ma pur coş û mecbûr

Hinan jê badeya mestî vexwarin
Ji reşmarê gulî dilgestê mar in

Hinik perwane asa bê xeberdan
Wucûda xwe didin bona rûşem'an

Hinik rûgul cîger pur xwûn wekî gul
Hezaran eşkê bulbul têne ser dil

Gerîbançak in û dînê fîraqê
Gehî ew der Hîcaz in geh Îraqê

Hinik bulbulsîfet zarîn û dilkul
Nedîn wextê seher bişkuftenê gul

Dibin sewdaser û mecnûn û sewda
Meger wextê wîsalê man di xew da

Hinik mislê sedef dur dane der dil
Hinik jî sunbul in der gerdena gul

Ji fezla te hemî ev ni'metê xelq
Li erd û asîman tev tê de bûn xerq

Xusûsa xil'etê bala yê dîlber
Ku alem serteser pê bû mûnewwer

Ji wî wechê hesen-nûranî yê yar
Hezaran hîv û ro bûne zîyadar

Evê nazikqed û çeşmê di mexmûr
Di wan da cîlwe da pertawê an Nûr

Ji lew hinde bi şewq û purcemal in
Şêrîn û dilruba sahibkemal in

Çi nûrek pursur e serda xet û xal
Ku alem jê bûye purgotin û qal

Ewê nûra mûcessem ku xuya ye
Çi rûhê e'zem e sûretnuma ye

Hemî can û cesed nûra nefîse
Ji bisk û xal û xet her tev diîse

Evê durdaneyê der durceyê can
Çi nûranî gerand ev alema han

Eger dur, ger sedef, ger bulbul û gul
We ger rûh, ger cesed, ger işq û ger mul

Bi te zîqîmet in sahibsitar in
Ji işqa te bi feryad û bi zar in

Fesahet işqê daye bulbulê zar
Fesahet daye tûtîyê şekerzar

Dirêje sed guher ezmanê bulbul
Dixwit sed şaxê şekker tûtîyê dil

Bi te bulbul bi fexr e pursena ye
Ji îhsana te tûtî bê rîya ye

Dema fexrê bidî rûbehê jar
Dibe mehbûsê bend û faqê dişwar

Xurûr û ehmeqî ger bo qijalê
Bidî, dê bit perîşan û cefa lê

We lê seylabê qehra te bi yek car
Dibit xar û xesan der behrê pur nar

Dema bit agirê işqa te zahir
Dibin xar û xesek der xurdê agir

Xes û dirî yû pêt û şûle û nar
Ji bo têra dikin xizmet bi yek car

Welê bo te ji nar û nûrê der dil
Dikit işqê ji zerr û xakê hasil

Mûseffa dê bibit xakê wucûdê
Mûhessel dê bibit zerrê şuhûdê

Mûneqqî û mûberra şubhê gewher
Bi der bit ez sedef ew bûteyê zer

Dibit layîqê husn û xulq û temkîn
Sezayê tac ê şahan û selatîn

Bizan ew nûr e bû peyxemberê me
Hebîbê heq Mûhemmed rehberê me

Di nav xilqîyyetê eşref gerandî
Ji herdu aleman her ew hebandî

Şukur ya Reb ji bo te heyyê qadir
Kerîm î zîlcelal î ewil axir

Xudayê işqîbexş û talibê kam
Tu yî ellah û rehman û rehîm nam

Ji roja ku te işqa xwe kir eşref
Heta roja bikî tu işqa xwo xef

Ku yanî dewr û saatê zemanî
Mu'ewwic mustewî wadih nihanî

Di her sal û di her hefte di her meh
Di her roj û di her şêv û di her geh

Di her hîn û di her lehz û di her dem
Di her an û sine der sûr û me'tem

Mukemmel, muttesil, xalis, mutehher
Mûfessel mu'teber etwel çi eqser

Selatê ba tehîyyatê gozîde
Li ser şahê guzîde nûra dîde

Şehînşahê rusul seyfê hîdayet
Kîtabê heqq û emwacê 'înayet

Li ser yaranê dînban ê xezenfer
Ebûbekr û 'Umer 'Usman û Heyder

We hem ser al û eshabê di cindî
Hezebranê Xweda Esyafê hindî

Li ser cumle îmam û peyrewê wan
Heçî ummet bitûn mu'mîn musulman

Nebit qet' û nebîtin hesr û tedwîn
Ne ser jê re hebit ne bin ne payîn

Qebûl in ba cû bo me xakîpa tac
Sîracê bo feqîran der şebê dac

Ji emrê pak ê te ez şermîsar im
Li ser qibh û gunahan zêdekar im

Heçî emrê te gotî jê fedî me
Feqîr û dilfikar û pur ketî me

Bi hêvî me ji dergahê te şahî
Bi zarî me ji hukmê padîşahî

Ji bo me bêkesan her çaresaz î
Ji bo her şahîbazan şahîbaz î

Kerîm e padîşahê padîşahan
Rica min her ev e 'efwa gunahan

'Efû ke van gunahê min eya şah
Yekî kelbê gunehkar im li dergah

Kesê ku bendeyê dergahê bîtin
Umîda 'efw û rehmet şahî bîtin

Wuha ez bendeyê wan im di şehrah
Feqîr û dilşikestî her wekî gah

Di weqta ku li me çavan girêdin
Qefesxalî bi hêlîn û birîd in

Di bin barê giran ê wek cîbalan
Ji rehma te nekêşin ah û nalan

Çiku em rûreş in fê'lê me pîs in
Li ser qibh û gunehkarî herîs in

Şefa'et bexşî ke ey pîrê pîran
Şefî'a merhemet ke bo me kwîran

Xelas bin pê ji mîzan û hîsabê
Bi fezla te ji çengalê 'ezabê

Zemanê ku ne roj e ne şev e yar
Şefa'et ke ji bo vî layîqê nar

Li min xalib bûyîne nefs û şeytan
Perîşan im di her gavê ji dest wan

Ne dunya û ne 'uqba ye me der dest
Wuha ez mayîme heyran û bedmest

Nema çare ji bo min ger ku maye
Hebîbê heq Muhemmed Mustefa ye

'Efû kit her evî kelbê gunehkar
Bibexşîne sehê eshabê Muxtar

Me û dê, bavê me cumle hevalan
'Efû ke setrî ke van bêmecalan

Me ummîd û rica ye her ji Barî
Nekêşit Eskerî qet şermîsarî

# BENDA SISIYA

## SAQÎ-NAME

Ela ey saqî(yê) canbexşêbo dil
Bide keyf û fereh ez badeyê gul

Ji ber berfa xeman şubhê cîbala
Me ser bûz e w sipî dûman e hala

Ji lew dest û pîyê min sarî bûne
Wekî wî îxtîyarî jarî bûne

Bide hin camê ateş abê nûrî
Ku xalib bêt li vê berfa zerûrî

Bi baranê surahî wek durê ter
Bibarîne li vê berfê seraser

Peyapey her bide camê bibarîn
Li vê berfa xeman wê abê narîn

Ku da mehw û fena bîtin ser û ber
Ku bit wek nûbuharê min dil û ber

Tu rake vî giranbarê li ser me
Ji dil da derkevin derd û keder me

Bide da sehlî bit ev îş û muşkil
Kulaba gul dilê kul kir gil û mil

Werîne mey ji qelbim re heyat e
Ji işqa bulbulî re gul sebat e

Bide saqî heta kengê bi nakam
Binoşin em ji vê cama serencam

Bide da camê bûsî kim bi dilxwah
Ji kêfan dil bitîsit şubhetê mah

Mûferreh ke dilê me bendewaran
Di camê da xuya ye rengê yaran

Kerîmane keremke ba du sed naz
Ewê seyda di nêv pencan wekî baz

Hela gavek ji vî bazê cîhanê
Ji vê qehpa durû, şora zemanê

Dibin asûde bê xem nê li hoş in
Bi saya pîrê rindan badenoş in

Sehil bit pêtîyê qelb ê bi hesret
Evan îş û xemê zêde ji taqet

Were ey saqîyê gertac î cansîm
Hîlalebrû û sîmagul, dehenmîm

Hîlalê mahîrû carek nezer ke
Bikim îftar û mey der camê zer ke

Ji bo me rûzedaran mahê yekşeb
Xuya be da bibexşî rûzîyê leb

Ji tesîra rehîqa nabî dêrîn
Mûferreh bin ji wê pertawê şêrîn

Ji wan camê kuhen hindek birêje
Peyala qelbê daîm mest û gêj e

Evê xemra wekî merhem di xom de
Bi ser cerhê dil ê mexmûr û gum de

Ji ber hîcra nîgarê bêsikûn im
Serasîme civandî şubhê nûn im

Mûdamî abê cû me mislê mahî
Cîger ateşxurê dîdarê şahî

Ji çahê xom derîne ateş û ab
Di hev mexfî ke saqî pertew û tab

Bide da pê ji ekdaran hela bin
Xelas, û gavekî ev xem bela bin

Liyada dîlbera qamet wekî ney
Bi şadî da vexwum çend cer'eyê mey

Di vê qehpecîhanê îstîrahet
Qe nîne, xeyrî pur zulm û xeyanet

Me dama xwe veda goya ji bo seyd
Me dî nageh du payê me ketin qeyd

Dilê bîjensîfet der çah û zindan
Li ser daîm şev e der qeyd û bendan

Di wê çaha zenexdanê esîr im
Bi zulfan beste me zar û feqîr im

Şecî'ane wekî Rostem xuya ye
Li ser çaha ku Bêjen tê numa ye

Bide saqî bike îhsan reha ke
Bi mey bo dîlbera xanim fîda ke

Bi rehmet Rotema ba fezl û îhsan
Bike ferwarê bîne der ji zîndan

Were saqî digel saz û mûxennî
Kelî rehmet mekin fikr û tu zennî

Bi cewlan be bikev nêv kêf û coşê
Mûxennê saz û mutrib kin xuroşê

Ne ferxende w xunuk ev dewrê gerdûn
Neşab e pir'ecûz e abê nexwûn

Demek xweşdem nehat der dama xemxwar
Demadem demdeme dil derd û naçar

Pesendîde me ra ayed zi her dem
Xurem xwîna surahî ne dema xem

Du şêran pence bir sîne dirandin
Dil û hestî hemî pêkve helandin

Bi sunbul sosinan bestî melê me
Xelet da marê reş gestî dilê me

Bi rehmet saqîya bîne surahî
Ji dengê bulbul e tê dil ferahî

Bide saqî dilê mecrûhî key ke
Ji bo dil noşîdar û abê mey ke

Lebaleb ke rehîqa nabî pursur
Di wê cama sedef wî rûhê wek dur

Sikendercamê bîne dûribîn bit
Bide saqî vexwum dil hûribîn bit

Bi zerrîncamê Cem saqî bide mey
Ji bo ev defterên xem cumle bin tey

Binoşim xakî bim xakê derê yar
Bi mujganan vemalim her dem û car

Çira? Bit bo me koran der şebê kûr
Ji dîde rabitin sed pertewê nûr

Dewayê qelbê min camê şerab e
Ne dunya mislê leylan û serab e

Bizane ta ku meşxûlê me'aş im
Qe rahet nabim û heyran û şaş im

Bide ta ku rewa xwe jê hilînim
Bela bin xem li dil mani' nebînim

Tesewwur kim xiyala dîlbera nûr
Di wê sayê ku dil bit şubhetê Tûr

Gelek enwar û berq ê lê zihûr bin
Dema ekdar û xem jê dûrî dûr bin

Were saqîyê sîmînsaqê pur dil
Birêje abigîne şebnemê gul

Ji dev şûşe meya safî durê ter
Bibarîne dilê cama wekî zer

Bi ser xweşyê lebaleb ke qedeh tu
Bike zêde di qelbim de fereh tu

Di vê bezma wuha dilşah û purkeyf
Ji wê camê vexwin çend qurtê bi heyf

Ku zêde kelleyê min germî bîtin
Ji işqa dîlberê bêşermî bîtin

Verêjim derdê dil bêjim gelek pirs
Rehet kim qelbê kul bêxewf û bêtirs

Mûheyya saqî yû bezma me xelwet
Hela lê de mûxennî sazê 'işret

Hîcaz û Kurdî yû hem Esfehanî
Eya 'uşşaq û Newrozê eyanî

Ji bisk kakulan bîne meqamê
Bi hawa û seda xweş ke nîzamê

Ji ahê sîneyê nay ê Îraqê
Ji wê 'irqê xem ê rahê fîraqê

Beyan ke rahê purxwûn ê xezînan
Ji lêvan xwûy bide cerh û birînan

Lebê germ ê xwe deyne ferqê nayê
Bibûse wê elemkêşê belayê

Bibarîne ji dîde eşkê purxwûn
Li ser wê pur xem ê teşbîhê Mecnûn

Bide ber sîneyê xwe tuflê bêkes
Bi gazî ke, ne yar û ne mededres

Ku cumle neysitanê der du alem
Digel weh ew bi nal in ba kul û xem

Ji nexme ey mûxennî ateş û nûr
Bike şem'a dil û goş ê minê kûr

Bide engoştê serzêr û bemê zar
Binalîne kesê hesretxurê yar

Newayek rastî lê de gahê sîgah
Ku şeyx û zahid û sofî bikin ah

Seba lê de mûxennî der seba bit
Ku Hudhud bê bi mizgîna Seba bit

Bi awazê ney û qanûn û tenbûr
Xeberde lê ji Belqîs û dilê mûr

Newa ku mitrib û saqî binalin
Digel sazan ji mahê rû bikalin

Ji remzê dîlbera saqî yû sazan
Bi goşê dil bibîzin sirr û razan

Xwe wenda kin bibîn "Qalû bela" ye
Hezaran can û dil bo te fîda ye

Mûhemmed Eskerî rehmê ji dîlber
Bixwaze, ne ji qewm û gewher û zer

# BENDA ÇARA

## SEBEBÊ NEZMA KÎTAB

Were saqî bide camê dilefrûz
Ku em pê vê şevê kin şubhetê rûz

Ji zû de tarî ye bê roji mane
Di hîcra dîlberê dilsoji mane

Ji hîva wechê saqî şu'le werbin
Ji camên wek sitêran bê keder bin

Bide tezyînê bit esmanê dil pur
Bitîsit hîv û ro lê şubhetê dur

Mûnewwer ke semayê vî dilê tar
Mûşe'şe' bî ji bo me pertewê yar

Tu zanî mey nedî zar û ketî me
Ji ber hicra hebîbê dilmirî me

Bide ta şi'r û eş'aran rewan kim
Ku xweş bim mexsedê bêjim eyan kim

Dema xurşîdê alem zulf û kîsû
Li hawirdorê berda hem li ser rû

Ji zulf û xal û xet wek perde rakir
Ku reşmaran xwe berda şev xuya kir

Te go perde ji bo exyari çêkir
Mûzeyyen kir bîsat û neqşi lê kir

Niha sertaci heybet çû di burcan
Verêtin qelbi ber can rengê murcan

Nîqaba Yûsifî poşî kerem kir
Wekî ahû meşî qesda Herem kir

Ji tesîra mey a subha "Elest"î
Ji sirra kaf û nûnê cumle hestî

Wusa pertawê rêtin şemsîtaban
Heta îsa qemer bû afîtaban

Bedel şahê li esman wê numa rû
Li cumle eskeran da emrekî zû

Emir da şehsupehsalarê leşker:
Hinik reqsê bikin mestane hin ger

Di hifza şemsê alem bê xur û xwab
Bi newbet bin hemî ba lerze û tab

Li ser wechê zemîn însan û heywan
Nebat û camid û maê di ceryan

Hinik bûn serserî hin mest û bîmar
Ji bihna miska marê gerdena yar

Hinik hişyarî bûn hin b'aqil û dîn
Hinik jê mane xafil bêdil û dîn

Bi vî eqlê yeman her kes diseyrin
Ji vî hukmê giran zêde diheyrin

Di vî halê wuha reş mest e ser dil
Ku nageh îbnî 'Emm im her wekî gul

Dihate bihna reyhanan ji etraf
Li sîmayê gula rûşebnemê saf

Numa miska Tetarî ce'dîbûyeş
Veda bihna gulab a werdê rûyeş

Ji wê bihna xweş û zewqa temam em
Wuha mest û mû'etter bûn û bê xem

Mûheqqerxaneyê bende bi dîdar
Dilê tengî feqîr i jar û naçar

Mûferreh kir bi dîdar û lîqayê
Mûweşşeh kir bi nûr û îrtîqayê

Ji puştî silsila behs û kelamê
Ji paş tefrîh û tewsî'a meqamê

Wuha teltîfê kir yarê ezîz im
Nîhalê gulben ê 'Emm im, temîz im:

-Ku îro ev zemanek pur yeman e
Ji qetl û fitneyê pertewfeşan e

-Ne me'lûm e çi setrinc e çi nerd e
Ne mestûr e çi herr e yan çi berd e!

-Ji Rom û Turk û Tacikan û Zengî
Sîwadê abînûsa herb û cengî!

-Ji nûra wechê mehbûba hemî nûr
Ji cîlwe w 'işweyê mesta di mexmûr

-Beyaz in hin ji wan sewdaserî ne
Çi şah û ferz û qewmê leşkerî ne

-Digel esp û rûx û fîlê bi heybet
Sipî ne tev bi hev re têne xîret

-Telebkar in dikin se'yek ezîme
Ji bo şeh ra dikin ala û xîme

-Vedigrin xîme û xergahi bo şah
Di nav de şeh mûnewwer her wekî mah

-Li dorê ew dibin her wek sitare
Di qel'e şeh diîse wek sitar e

-Mûheyya sef dikin qel'e wekî nûn
Çi qel'e çun sedef dil durrê meknûn

-Ji zulfanê sîyahi ejdiha xwar
Ji wan qismek Sîyapûşê şebê tar

-Heme reş bû dilê sultan û esker
Ji ber qelbê xwe dan ser gewher û zer

-Dibin wek qertelê napak ê bêwa
'Eceb ew bo leşê morde dibin şa

-Çu marê reş xelek hesretxur û renc
Di hifza zerr û mal û gewher û genc

-Temamê wan bixwe gurg in di bendi
Xefî ne ew di libsê Kûsifendî

-Mûheyya der kemîn in ka ji bo wan
Xuya bit Kûsifendê demperîşan

-Ewan gurganê teb'an der kemîn in
Kesê dermande ew carek bibînin

-Ku dîtin furseta xwe gurgê devxwûn
Hucûm kin Kûsifendê jar û mehzûn

-Perîşan dê bikin wî bêkesê zar
Wuha giş mubtela bûne setimkar

-Qijal in ew bi bulbul têne meydan
Qe nanêrin xwe û payê di qeydan

-Ji kibra xwe dibêjin:Bulbul in em
Bi hawa û seda û xulxul in em

-Bi sewta naxweş a xwe bûne bê hiş
Bi hawayê xwe mefrûrê hewakêş

-Fikir nakin hene rûbahê pirfen
Dikin bazî bi kelle pê dikin ken

-Dikin mehrûm dibin pennîrê dev wan
Dimînit ehmeqî der destê êşan

-Ji rizq û qismetê xalî ku bûn ew
De hê namîne bo wan rahet û xew

-Mûheqqeq dê bizanin ku qijal in
Ne bulbul bûn ji mefrûrî dinalin

-Wuhareng e di vê xana hewayê
Mûxalif şan diçin tên şibhê bayê

-Dibînim exlebê ehlê zeman e
Bi fexr in hin hinik tedbîrê dane

-Hinik şubhê qijalê pir bi fexr in
Wekî rovî hinik pir fennîsexr in

-Nizanim ev çi dewran û zeman e
Çi kan e mûxtelîf tê da ciwane?

-Gelek aciz ji vê dewra sîyehkar
Wuha qelbê me mecrûh e birîndar

-Ji dewra vî zemanê bêser û bin
Ne rahet qelbi ênan û dilê cin

-Zemanê me hemî derd e seraser
Dil û can perçe bûn tê de, birader!

-Wuha cari dikim zêde xeberdan
Ku çêkî tu ji bo me meyweyê can

-Ku yani yek dirextê meyweşêrîn
Heşîn ke nû di vê dunyayê dêrîn

-Mûlebbes ke direxta taze zîba
Bi libsê etles û qummaş û dîba

-Şecer purşaxî be ba çîçek û gul
Di her şaxê benale qelbê bulbul

-Xulase, yek hîkayeya serencam
Tu menzûm çêke bo me rind û gulfam

-Ji bîra kin hinik em vî zemanî
Ji wê rahê bide vî rûh û canî

-Zimistan e li ser me, ne buhar im
Ji eş'aran buharê çêke yarim

-Hewesreng û letîfe bîne bezmê
Rihan û lale, sunbul têxe nezmê

-Temaşa kin fereh bî qelbê xemgîn
Li ewraq û gul û şaxan biheyrîn

Me gotê:"Ey 'Emûcezadeyê qenc
Mede hinde ji bo me zehmet û renc!

Di vê roj û şeva mest î fezayed
Dibîtin, lê me ra ekdari zayed

Çi mîgu yî tu ey nîk û tebîet
Xîyalê în cîhanamed bedîhet

Ne layîq e dilê xwe pê girêdin
Ne meqbûl e ne rah e lê bi rê din

Dilê min jî ji vî marî bi dax e
Ne me'lûm e dirîstan e ne bax e

E'jî tê da gelek heyr im nizanim
Ne hiş maye ne dil ma natuwan im

Dibêjî, lê digel min eqli nîne
Zîyade bêhiş im dil pirbirîn e

Ji mehbûbê gelek dûr e dilê jar
Bi ah e bîxwûd e wek bulbulê zar

Wekî perwaneya dilsûzê şem'ê
Ne can û quwwet hem goşê sem'ê

Ji xalan û xetan dil bûye pare
Ne aram û sebir çibkim, çi çare?

Dibehce wechê te ey Behcetê pak:
Gelek heyr im û hem pê me ferehnak

Ji bo min barekî zêde ji taqet
Dibêjî, bîne dîde abê şefqet

Dikî zorê li me ey bulbulê qenc
Welêkin wek qijal im ne soxensenc

Ji derdan şerh e sîne, dil birîn e
Ji vê zewqa me tal e, ne şêrîn e

Bedel şêrînîyê dil şor e daîm
Di leylê firqetê hem kor e daîm

Gula fikra me pur nûşabî nîne
Di qaf de ew durê xoşabî nîne

Eger çendan dibînî sor e ev gul
Dehen der xende pêçayê bi sunbul

Di hev wertên xeraman daneyê dur
Li sîma û rûyê werda me da pur

Hemî xwûna dil e werda me sor e
Ne ku şada biye tev zulm û zor e

Xedengê qews ê ebrûyê şebabê
Perîşan kirne dil daye kebabê

Dihen her kes dibîne ku guşad e
Ne şad e w xurrem e gulahîzad e

Ne sunbul sosin in, tev tîr û xar in
Ji qewsê dîlberê her lê dibarin

Ji narê qelbê qelb e çeşmigiryan
Dirêje dane û dur eşkê buryan

Ji ber vê tûtîyê fikra me jar e
Şekerxwarin ji bo wê re zirar e

Ji derdê şekkerê şêrîn dinale
Çewa menzûmê şêrîn bê, mehal e?

Teberzed nîne der mînqarê tûtî
Teberzed ber serim zed yarê tûtî

Tehî fikra me wek cama dilê kal
Behî gotin ne karê wî kesê lal!"

Wuha min gotê:"Eya îbnê 'Emmê min!
Ji bo min şadî yû hem jî xemê min

Zîyade her dikî teklîfê bo min
Hezaran kûhê xem tezîfê bo min

Dikî ferman ji bo me yek hîkayet
Mûzeyyen ke bi nezmê xweş ke xayet

Bi kurdî bîne nezm û întîzamê
Bi adab û edeb bîne nîzamê

Me nîne genc û sermaye birader
Bi xeyrî gencê dîde tê durê ter

Nezimgotin wekî durrê buha ye
Ji heddê min gelek zêde xuya ye!

Suxen şah e ji bo her padîşahî
Tefewwuqkerdeyê ber mihr û mahî

Xeberdan me'dena me'rîfeta ye
Sebeb xilqîyyeta erd û sema ye

Suxen nûr e çiraxê leylê tarî
Çi xweşşêrînber e der baxê yarî

Nedared quwwetê meywe dirext im
Xusûsa meyweyê şêrîn ê bextim

Suxensencî me ra hîret fizayed
Zi ney şax im şekermeywe neyayed

Şêrîn ew kes dirêje ku şeker bit
Serapa qedd û qamet nayê ter bit

Bi abê hem şekerperwerde bîtin
Dilê tuxmê şêrîn efşûrde bîtin

Bi şêrîn pertewan neşw û numa kit
Ewê hê karibit şêrîneda kit

Nebatê henzel e baxê dil ê min
Qijal e ne hezar e bulbulê min

Ruteb nîne direxta me çûbîd e
Ne serw e hîz im qamet xemîd e

Suxen durrê beha ye şebçirax e
Kesê wek min ne tûtî, mislê zax e

Belaxet der suxen hate zuhûrê
Keramet ba suxen hate zuhûrê

Binê Qurana Heq nezma qedîm e
Çi î'caz e çi rahek musteqîm e

Mûzeyyen bû dirext û şaxê însan
Mûsenne' ba suxen bû kaxê însan

Mûkerrem bû benîadem bi gotin
Suxen bû da dilê 'uşşaqi sotin

Di baxê me wuha ew meywe nabe
Ji xaran kî dîye ev meywe rabe?

Ne bostan im diristan û dirî me
Ji vî emrê dibêjî ez berî me

Kesê pare nebit bazari sar e
Ji bo wî alê virî eyb û ar e

Ne dînar û derem destê me xalî
Bi çi ez dê bigîjim durrê alî?

Me ra sermayeyê zîn behrê nîne
Suxen ra qîmetê der dehrê nîne!

Xusûsa ev zimanê kurdîya me
Ku maye hedye ez bav û diya me!

DIVÎ WEXTÎ DE ŞEM'A ILMÊ KURDÎ
QE NATÎSE NEMA TÊ ZEYTÊ, MIN DÎ!

Pere nake dizanim ev ezîyyet
Wuha qîzek bi husn û xeml û qîmet

Evê qîza bi zêr û zînet û qenc
Ber û sîne qed û qamet wekî genc

Dizanim îltîfatê nadinê kes
Ji ber, ehlê huner kêm in mededres

Ne şah û sermîyanek rexbetê kit
Ku qedrê wê bizane mehbetê kit

Dizanim vî zemanî pare nake!
Ji vî derdê mi re kes çare nake!

GELEK ŞÊRÎN E EV EZMANÊ KURDA
DIRÎXA ME JI DEST YEK CARÎ BERDA!

Gelek dûr û diraz e macera dil
Çiqa kin qet'ê kin pir baş e hasil

Bi vî destê xwe yê xalî nikarim
Perakende biçim sûkê, nikarim

Hîkayeçêkirin ba nezm û eş'ar
Gelek zor e me xame nade îş'ar!

Ji bo min muşkul e zêde ji taqet
Dizanim dê bixwim beyhûde zehmet!

Wuharenge 'esîr e emr û ferman
Ji bo me pur hesîr e emr û ferman!"

Gelek teklîfê kir wî meyweyê 'Emm
Ku peyda bû di bostanê şeh ê Cem

Digo:"Der çerxa dewran bê xur û xwab
Di dama xem dilê min lerze û tab!

Ku elhasil ji bo me yek serencam
Letîfe çêke, têxe gerdenê cam"

Du-sê newz û şahî zêdeyê min
Temaşa dîtibû wî dîdeyê min

Xelasî min nedî, emrê bira bû
"Belê" min go, welê zehmet xuya bû!

Me "Bîsmîllahî" go xame hilanî
Me da ber destê xwe name 'eyanî

Ji mecbûrî du-sê elfazê kurdî
Di nav hev lef kirin çend razê kurdî

Sela qet nîne tesdî' û fesahet
Ji bo me bû beyan qibh û kerahet

Pesendîde nîne Kurmancî ye saf!
Xuya ye ne huner tev gotin û laf!

Ne ew bezm e sefabexşî bide rûx
Ne ew nezm û nîzamê babê meftûh

Ne zîba tawus e zax e w qijal e
Çu mekrê su'leban sihr û xîyal e

Ne ew kilkê felek fulkê necat e
Ne ew zulmat e tê abê heyat e

’Erûsane ne zîba ye ’ebûs e
Ne sîmayê sipîd e abinûs e

Ne puxtemeywe ye xam e ne e’la
Wuha tal e ne şêrîn e ne helwa

Meger pîrê moxan hîmmet bikîtin
Bi lutfê lê nezer de dê bibîtin

Wegerne mane mehcûb û perîşan
Di nava alemê pur derd û êşan

Dikim hêvî bi şefqet lê nezer din
Kerîmane bi rehmet jê xeber din

Ne malê sirqetê ye zikrê fikr e
Çuqa nalayîq e lê fikrê bikre!

’Eyane tê huner nîne ji dilxwaz
Letîfe hûn bizanin çendi elfaz

Çi qudret min heye tê da çi bêjim
Ne şah im ku duran ez lê birêjim

Feqîrê bende yê şah im sîyehrû
Îlahî ’efû ke vî bendeyî tu

Bixwe ez muhre me durdane duwer
Di nêv ’ummanê qelbê sade nuwer

Kesê mûrî be qedrê wî xuya ye
Ji mûrî ev hedîyye pur buha ye!

Dikim hêvî Suleymanê selîman
Neke red hem nede destê elîman

Me dilxweş ke bi cama fezl û rehmet
Nekêşin şermîsarî nebne qebhet

Mûhemmed Eskerî wek kelbekî jar
Binale her li babê rehmet ê yar

Û bêje, ya îlahî her dem û hîn
Mûweffeq ke di rahê dîlbera dîn.

## EV ZEYLA SEBEBÊ NEZMA KÎTAB

Me pêş de gotibû hinek xeberdan
Di behsa vê qisê mutleq ji derdan

Welê îcabi kir tekrari bêjim
Hinik derdê di pur dîse birêjim

Ku ekdaran bibêjim belkî pê ez
Rihet bim hem bibûsim doxterê rez

Berî enha bi huvdeh-hijdeh salan
Me dil pur bû huba xeşfê xezalan

Dikelya daîmî ew işqi der dil
Dibû zewqa mezin jê bo me hasil

Gihabûm bîstî salê terhegeh tam
Li me xweş meywe dabû ew qed û qam

Cuwanê hûşîyar û ba hewes bûm
Bi yar û ehlê dil re hemenfes bûm

Li ber çeşmê me dunya wek kitanî
Rizandî mehrûwa ebrûkemanî

Li nik me gîtîya şubhê xiyalî
Bi tîrê mujjegan ebrûhilalî

Dikir lê tîrê baranê peyapey
We hem mabûne wek murde, ne wek hey

Ne hemser bû ku derdê ser hebit min
Ne ewladê 'edû ne fitneê jin

Wekî serwasehê azade bûm ez
Bi işqa dîlberê purbade bûm ez

Buhayê saxîya me yek nefes bû
Hela dunya bi yekcarî teres bû

Xiyala nazika nûrîn î serbest
Bi şewq û zewqê pir dil kirbû sermest

Reva çogan ê zulfê dîlbera dil
Girêdabû bi tayê sunbulan mil

Li şewqa werdisîmayê gulendam
Dikir feryadi her vî bulbulê xam

Di dil xar û xesê dunya nebû qet
Hemî işqa hebîbê kir, bû qet-qet!

Disûza tev di kûra qelbê pur nar
Çi xar û xes hebûn işqa perîyar

Bi şîrê ebrû û şêrê du çavan
Bi zulf û kakulê teşbîhê davan

Bi naz û şîwe geh gahî dikir ceng
Mûsexxer kirbû mulkê vî dilê deng

Ne dunya û ne 'uqba bû tenê yar
Dikir ferman li textê qelb ê bêwar

Bi işqa yar û noşa bade û cam
Ji bo me xweş diborîn weqt û eyyam

Ji zenga vê cîhanê neynika dil
Muberra bû ji işqa yara kamil

Di wê wextê de bû ibni 'Emmê min
Cuwanê rehmetî şekkerfemê min

Li min teklîfê kirbû wî hîkayek
Welêkin rengletîf e bêbuhayek

Di nav re musweda sê-çari bendan
Ji hemd û teslîye hindek ji pendan

Sebeb nezma kîtab û halê derwêş
Ji bexçe nîvico ew hatibûn pêş

Ji asîb û belayê asîmanî
Ji herb û ceng û fitna wî zemanî

Veda ewrê ecel xergah û xîme
Mirin jê barîya xewfek 'ezîme

Di mesweddê de man bê nav û nîşan
Perîşan bûn di ewraqê perîşan

Seferber bû gelek rûhber hilak bûn
Evê man jî, ji ber dil çakîçak bûn

Cîger bûn pare pare, dil du nîm e
Dikêşan alemê derdê elîm e

Xela çê bû wusan xelqê nikarî
Heta goştê sehan hinka dixwarî

Heçî ku qabilê Herbê hemî çûn
Di Herb û j'birçîyan exleb fena bûn

Bi sed derd û belayê ku reva bûn
Ji destê wan îmamê wek gura bûn

Çi dîtin ezyet û malê didane
Digel wan pîrekê bêçare mane

Xem û derdê peyapey rê nedan hev
Heta enha eger roj e we ger şev

Ji ber vê ev şecer lew bê semer ma
Hîkaye bê xeber bû lal û ker ma

We hem jî nûra dîde îbni 'Emm im
Zîyade kirye huzn û kerb û xemm im

Du-sê sal e perende morxê rûheş
Hetawê cenneta alî gelek xweş

Ku ev derdê fîraqê jî bi ser ket
Ji fikra me hîkaye çû bi der ket"

Jibîra bû temamî ev serencam
Wuha bêhasil û meqsûd û encam

We lê geh geh bi zora cam û fincan
Di nav wan yar û eshabê wakî can

Dibû der xatir û hem jî digotin
Xeberdanê ku wan pê dil disotin

Dikirne lewm û gazin vê hîkayê:
"Çira nakî temam da bê nîhayê?

Dikî îhmalî lewra ev hîkaye
Wuha bêhasil û bêxaye maye

Temamî çêke da bête xîtamê
Ku da em jî, ji wê bigrin meramê!

Ji bend û rind ê pendê hikmetamîz
Ji bihna yar û wan neqşê dilawîz

Ji esrarê nîgar û işqa dilsûz
Ji bezm û neşeya camê dilefrûz

Ji pîrê meyxuran û merdê meyxur
Ji vê dunya durû w pîranaya hur

Ji şi're şekkerîn û me'nîyê xweş
Ji xem azade bin pê dil bibin geş

Ji van behs û beyanê dil tijî sur
Ji van hikmetmîsalê xizne yê dur

Bibit pê şad û jê bigrin hisa xwe
Temam kî ger ji bo me vê qisa xwe!"

Digotin her bi îlhahek zîyade
Disotin pê re dil wan fewqê ade

Dikir puşt guh, me sersarî digirtî
Bi hawa perdeya 'uzra digirtî

Welêkin tev ne bo keslanîya min
Ji vê behsê wuha pes manîya min

Li alîkî fîraqa dîlberê zor
Li alê dî xemê dunya, şer û şor

Bi rengarengî dil cerh û birîndar
Bi vî terzê perîşan û fedîkar

Ji ber vê her dima ev qisse û behs
Ji derdê vê cîhana fitne û nehs

Heta du-sê meha pêş rojekê tev
Civabûn dîse ew yarê bi dil hev

Xiraman saqîyê sîmîn (ê) saqî
Bi naz û 'işwebazî daye raqî

Bi çend cur'e, meyê tev rakirin xem
Ji bihna zulfê dîlber şa kirin em

Kelî xwûna dil, û dil pir bi coş hat
Ji 'işqa dîlberê pur bade noş hat

Ku wek sîmabê mey lerzî di fîncan
Me noşî, pêlê da behra dil û can

Gehî şi'r û xezel, geh behsa dîlber
Geh dest efşadin û reqse ser û ber

Geh ba keyf û letîfe ba hewes bûn
Geh gigîn û bêhiş ba cewlanferes bûn

Geh mestê bîxûd û gahî teles bûn
Gehî ba nale û zarîceres bûn

Ji morxê sirr ê yarê re qefes bûn
Li qummaşê me'anî geh meqes bûn

Li xennasan gehî mîrê 'eses bûn
Geh enwarê rû yê yarê qebes bûn

Di qelban qet nema hubba cîhanê
Ku pertawê rox ê dîlber didanê

Ji ber wê, coşê da behra kelamê
Zîyade şewqê çê kir, nûra camê

Ji camê ta 'erş, û ferşê di jêrîn
Geh ehwalê kûbîn geh halê dêrîn

Xeberdanê letîf e gahi hîkmet
Me d'gotin hem ji wan behsê bi 'îbret

Nîhayet ew qisa mabû di pêş de
Deranîn meclisê anîne pêş de

Hevalan dîse îlhah û tehekkum
Di vê behsê kirin zêde tekellum

Ku:-Îlla dê xîtam kî qisseta xwe
Temamî noşi ke vê şerbeta xwe

Birayê muhterem, muşfiq wekî bav
Muhemmed Kerbelayî wî j'dil û saf

Mi zanî meyla yaran kir di ev car
Wuha go:-Çêke çîrokê, bike 'ar

-Bese sarî, bike xîret di ev îş
Temam ke qissetê, bes wan bike rîş

-Hevalan bes biêşîn, xwestina wan
Bide, êdî bese dilgestina wan

-Evan yarê wefadar ê fîdakar
Ji bo çi wan dikî hinde birîndar?

-Meke red gotina van yarê dêrîn
Meke mehzûn ewan zêde meyêşîn!

-Temam ke vê hîkayê bes ke îhmal
Zîyade bes bibêje gotin û qal

-Ji bo wî xatirê îbnê 'emm ê pak
Ewî teyrê di cennet da ferehnak

-Dibêjin hinde ev ehbabê yekrû
Wekî ferz e, gelek şerm e, bese zû

-Gerek des(t) pê bikî bêsekn û te'xîr
Weyane dê ji te bim zêde dilgîr

-Temam çêke tu çîroka dilefrûz
Ji bo wî, da li me bit îd û newrûz

-Li navê wî, berê jî Name bunyad
Nuha dîse ji bo wî me bike şad

-Ku da zayî' nebe dilxwestina wî
Bike zencîreke zêr bestina wî

-Bi vê dê şadî be morxê ruh ê wî
Di baxê cennetê pir zewq ê pê bî

-Emê jî pê muferreh bin, exê pak
Çi ne ev weswese w wehmên xeternak?

-Bira bê cî guzîde gotina wî
Emê pê muntefî' bin dotina wî

-Tu çendakî bike xîret bixwe zor
Xîtam kî înşeellah bê şer û şor

-Dixwazin qissetê çêkî xweş û gur
Welê pur muntezem wek 'iqdeke dur

-Letîfe w nukte tê da wek dur û mas
Bira şûle bidin bo cumleyê nas

-Ji van xal û xetê wek şev 'eyanî
Bira pur jê bizên şemsê me'anî

-Me'anî w lefzê şêrîn tev di nav hev
Wekî şîr û şeker memzûci ke tev

-Tumûmê cism û can tê 'aşîqane
Bisûzîne li rahê sadîqane

-Gelek perwaneyê şem'a cemalî
Bi cewlan bên li etrafê şemalî

-Bira bezmê mu'etter kin rû û bisk
Gul û reyhan û sunbul herwekî misk

-Ji qedd û qamet û şiklê nîgarê
Ji wan fetl û gerê reşmarê yarê

-Xet û me'na binexşîne j'xedd û xal
Bixemlîne xetan, jê xame bit lal

-Neqiş ke jê xetan, Erjeng û Manî
Bibin heyran, xeta wan bête zanîn!

-Bezîrû bim neyê bîne sebayê
Hemî sazê dunî bêne xetayê

-Bira sazê hewa bêje seba pur
Ku hudye bê ji Belqîsa Seba pur

-Ku bînit hedyeyê nûrîn ê 'alî
Ji wê yara munewwer laubalî

-Ji çavê bulbulan hindek xunavê
Bide sîmayê gul xweş ke hinavê

-Di gava ku hinavê xwe bi ker kin
Ewê jî hem gulavê bexşê ser kin

-Bi mislê bulbulan goyende bîne
Hemî mestane dilcoyende bîne

-Nucûma Muşterî bîne qumaşa
Gelek seyyahi dê bêne temaşa

-Suxen tûtîsîfet şekkersuxen bin
Bi şukrê zêde şabê dilkuhen bin

-Ji zulmatê derîne abê rewşen
Heyatê jê bide werdê di gulşen

-Xemê qelbê tenê tenhayî bi yar
Bişo pê jê munewwer ke tenê tar

-Ji tarê zulf ê tarî hem derîne
Ewanê der tenê tarî xumîne

-Ji moşkên neqşeha yê setrê mewzûn
Semensayê qed ê sîmînê meymûn

-Xuya ke da di wan zulfanê mensûr
Ku bin heyrani hem Mecnûn û Mensûr

-Xwe û Mensûr û Mecnûnan fena ke
"Enel heq" layîqê kî bit xwiya ke!

-Mehû ke cumle can û dil bike şeq
Bibînî Heq dibêjit her "enel heq"

-Xomê xê xemrê jê derxe bike xêr
Xumaran pê bike mexmûr û dilsêr

-Xetan pur xalî ke, sef ke xetîran
Ku jê xweş be dil û qelbê xebîran

-Xelîlê xwunxur ê narê gula geş
Ji neqşê xameya reşbext î demkeş

-Perengê ateş ê Nemrûdi pestan
Ku da lê sehli kit Erjengi destan

-Mubeddel ke bi bax û bosîtanan
Muferreh ke dilê pîr û cuwanan

-Bira tarê ten û abê ji dîde
Bibîte şem'a vê bezma gozîde

-Ku ev bit şem'ê bezma weznê eş'ar
Ewê her kes bibin jê hisse û par

-Umîd e nailê xeyr û sewabê
Bibî, paşê nedî dil ber kebabê!

Ewî bazê ku destê şah ê xûban
Ji bo wî aşîyane her dem û an

Ku piştî bo me ev pend û nesîhet
Kir, û hem emri kir da bikme xîret:

"Nebî berdî tu vî emrê bira yî
Di zulmatê dimînî bêçirayî"

Emir kir wî bira yê mestirê min
Ewê behra me'anî bê ser û bin

Edîb û 'alim û şa'ir, ferîd e
Di vê 'esrê de bê misl û wehîd e

Gelek nukteşunas û 'aşiqê heq
Di rahê (de) ewî kir can û dil şeq

Di cayê dê yû bavê xweyî kir min
Di îşê dîn û dunya rehberê min

Ji dara dê yû bav im ew semer ma
Ji bo me 'unserek 'alîguher ma

Ji şem'istanê bab ê muhterem ew
Tenê maye ji bo me şewq û pertew

Ji ewladê peder min ew bira ma
Ku der dunya û dîn im ew çira ma

Tenê (e)w ma bira, dîger bira çûn
Ku her yek durr û elmas û çira bûn

Ji wan durrê di xalis ma tenê her
Ji derdê 'işqa dîlber bû wekî zer

Ji wê genca duran ew dur tenê ma
Wekî yaqûtekî pir zerdisîma

Di bax û gulşenê raz ê peder de
Tenê ew bulbulê pur 'işq û derd e

Ji sewt û nexmeya wî bulbulê xweş
Gula pejmordeyî qelb im dibit geş

Ne ew nexmê rûhefza be gula dil
Di nav xarê dunî ma pare dilkul

Dibin rahet bi wî cerhê dil ê min
Bi wî cumle diçin derd û kulê min

Hemî tên saxîyê, êşê dil ê zar
Ji nexmexwendina wî bulbulê yar

Ji bo min destegîrê her belayî
Di dunyayê tenê ma Kerbelayî

Dehî bêjim çi, ma karim xeber dim?
Mebada qelbê nazik pê keder dim!

Dibîtin, ma durust e ew ji bo me
Emir teltîfê ke carek bidome?

Li min ferz e bikim namûs û xîret
Mutî'ê emrê bim, nedmê tu muhlet

Cewabê "na!", mi dî nabe bibêjim
Eger çenda ji dil xwînê birêjim

Nema çare me îlla biyîme dav
Me gotê "min qebûl e, ser ser û çav"

Me dî ku tewqê emrê kefte helq im
Çiqasa ger ji ber zêde diqelqim

Li min pur zehmet û ezyet xwîya ye
Li dil ev barekî mislê çîya ye

Çikû nîne me me'lûmatê zêde
Di îşê şi'r û me'nayên bi fêde

Me tewfîq û meded xwestî ji Xaliq
Perîşan tê nebe bêçare 'aşiq

Ji nûra wechê yar û pertewê cam
Quwet bigrim bikim xîret wuha tam

Ku lutf û himmeta pîrê moxan her
Mededkarî ke bo dil ba zeban her

Bigînim xayetê vê qisseta xweş
Bi tewfîqa Xuda tê nebne rûreş

Eda kim vê wezîfa xwe bi dilxwa
Birader ba hevalan pê bibin şa

Ku da bo me du'a kin cumleyê yar
Bixwînin ya, çi weqta bête efkar

Eger çi zêde mabû qisseya me
Di sundoqa dilan de hisseya me

Evê 'Iqda Duran bê qerdenek yar
Wusa mabû diîsa şubhetê nar

Gelek te'xîrî bû ev godekê zar
Nedî neşw û numa da bit serefraz

Evê mana wuha jê hikmetê pur
Gelek tê da hene bêşubhe hem sur

Ne sade bêxwedî mabû li çolê
Ne ku mexrûqî bû bêjî di golê

Di yolê xwey di yolê ba keder bû
Di rehma maderê ew xwînîxwer bû

Ji vê te'xîrê bû tuflê serencam
Di cayê teng û tarî xwînxwir û xam

Heta bû şîrî ew xwûna sîyehreng
Kete pûstanê mader saf û bê zeng

Bi derket ronîyê ew jê ferehnak
Wuha bê bak xuwarî şîrê pur pak

Evî şîrî dixwe tiflê derê yar
Û lê dîse dibe xwûn der dilê zar

Bi kel tête di qelbê wî zîyade
Dibîtin ew bicarek saf û sade

Ji dîde tête xwarê mislê kanî
Şukur dîse di dil dibne me'anî

Îlahî lutf û tewfîqê di her kar
Bide da Eskerî nebte fedîkar

# BENDA PÊNCA
## FERQ Û TEMÎZA XEBERDANA QENC Û XERAB Û FEZÎLETA SEBRÊ

Were saqî bide camê soxenrîz
Soraxê bigre kef ez cayê berxîz

Ji wan pertawê ab û ateşê cam
Bikim poxte dilê napoxteyê xam

Bide saqî temaşa kim li dewran
Bisûze perdeyê, bêjim xeberdan

Muheyya û lebaleb ke di camê
Buxara agirê işqa kelamê

Kellamê tal û şêrîn ez cuda kim
Çi xweş tefrîqê kim şêrîn eda kim

Şêrîn û tal binivsînim 'eyanî
Ji bo tal û şêrîn paşê bizanî

Çi talî ne ku şêrîn tê esas e?
Çi şêrîn in ku talî tê n'esas e?

Tu guhdarî nekî tefrîqê name
Di dil de xar û xes tehrîqê nabe

Teemmul ke xeberdanê tu pir baş
Tefekkur ke ku da tê da nebî şaş

Nekî sebrê û guhdarî nekî pur
Ji hevdu nasi nakî morî û dur

Ji abê telxîweş hin camê gewher
Bide, şêrîn bidim te meyweyê ter

Heta talî nexwim sebrê bikêşim
Ji tirş û talê dunya dil naêşim

Fena nebne di nîva kûreya dil
Xes û xarê cîhanê cuzî yû kul

Ji kû dê qelbê nûrîn şu'lewer bit
Heta der xakê derdan pur keder bit?

Bide der dil ku da mani' bifewtin
Heçî xeyr in bila tev tê bişewtin

Ku pur ekdari be dê bêxeber bit
Di alem da ewê her ga û ker bit

Bide da qelbê me pur şewqi kit ew
Ku pursê tal û şêrîn zewqi kit ew

Munewwer bit me pê 'eql û ruh û dil
Çi eyn e dê bibînim kîje ye zil

Bide ta daneê sebrê biçînim
Ji abê dîde û mey lê reşînim

Ji sebra telxê tu ber şêrîn dane
Biçîn, kî bendeyê dergahê xan e?

Di nîva mezre'ê sîne defin ke
Ji derdê sîne ra dane rehin ke

Ji herrê can me'adin bînite saz
Ji ahê dil buxarê rake efraz

Hewa weqtê sebayê ba hewa bê
Ji alê dîlbera mesken-Seba bê

Ji bihna sunbul û reyhanê dîlber
Digel xwe bînitin bê pa û bê ser

Cunûnane serîsersem cîgersûz
Ji narê qelb ê xwe leylê bikit rûz

Ji ahê dil evî ewrî belakit
Cîger par e çû deşta Kerbela kit

Ji hukmê hakimê dil derd û çavan
Bibarînet hewa ava xunavan

Bizane Eskerî ewrê bi hesret
Xunavê wer dîyare w derdê firqet

Nesîmê zulfê lê daye dibare
Muqîmî gazî yû daîm hewar e

Bikêşe abê sar û cûyê sîne
Bi mey safî bike hem goyê sîne

Xuyaye mezre'a te hişki maye
Ji bo te av û cû hazir xwîyaye

Bi barana ji ewrê çavê têtin
Xunava ku ji derdê navê têtin

Birêje qelbê cam û noşi ke mey
Di milkê qelbê da dane bike hey

Di erdê sîne serefrazî ke wê
Ji ekdar û xeman pur razî ke wê

Bi eşkê ateşî perwerde ke heb
Ji wê ebrê dirêje hesretê leb

Ji camê çeşm ê meygûnabê lê ke
Ji talî daîma xwûnabê lê ke

Ji narê işqa yarê germi bîtin
Ji bo ew taze û nermi bîtin

Heta 'irqê xwe berda û heşîn bû
Ji bîxê pir qewî pence neşîn bû

Ji ber ku terheha şubhê nîgarê
Ji bisk û gîsûwan tezyînê darê

Ji exsanê qewî mestûr ê der dil
Ku bû tekmîli ew dara cîgerkul

Ewê pur meyweyê şêrîn bide der
Ku çêtir be ji mal û cewher û zer

Bi vî halî me dara xwe mezin kir
Ji ewwel ku me dane tê defin kir

Çewan zulfê nîgarê zehrînexş e
Me jî vê sebra darê zehrîbexş e

Bi tuflî terbîye daye bi zehrê
Wuha pur noşi kirye xwîn di dehrê

Hemî xwîn e evê dara seraser
Welê der xwîn e ruhê taze û ter

Nuha şêrîn şeker da tûtîyê dil
Xenî bûne goher da qotîya dil

Şukur şad û muferreh pê bûyîn em
Hemî şêrînî bûne ew tal û xem

Di nêv mînqarê tûtî de şeker pur
Soxen şêrîn e nayê ba kemer pur

Zîyade hulw e ev şekker 'eyanî
Welê têkil ke hin talî nihanî

Veşêre tûtîya vî şekkerê xwe
Hilîne pence tu deyne nerê xwe

Ji derdê dewrê, dewranê bibêje
Hinik talî bi şêrînî birêje

Wuha çend meyweyê şêrîn beyan ke
Ji tuxmê talî, lê bo me 'eyan ke

Ku tuflanê ney û newbacê mircan
Bibexşit bo te şêrîn taca mircan

Serê şaxê şecer jê dîde bit nûr
Û hem bo meyxwiran bit baxê engûr

Ji pertawê evê dara xeberpur
Munewwer bit hemî 'eynê beşer pur

Fereh bexşî ji bo me sosin û gul
Rihan û nerkis û wan sunbulê mul

Qelem lew neqşê bisk ê misk(î) daye
Ji "'e"yn û "l"am û "m"îma biskê şa ye

Ji "n"ûn û "s"ad û "r"ayê zulfê her dem
Şukur mensûr in û dil şah e wek Cem

Qed û qam e tecellî daye darê
Ber û fêkî xed û xalê nîgarê

Benatê vê nebatê newresîd e
Di her şaxî heye tacê gozîde

Berê ser şaxê vê işqa hebîb e
Eger zehr e vexwe haziq tebîb e

Were ser qisseyê ey ney veger tu
Birêje nameyê dîse şeker tu

Bizan aşê zemanê me çep e ger
Çi ab û aletê tê da ne û ber

Wuha ye asîyayê vî zemanî
Hebê fitne dihêrit her 'eyanî

Bi dewr û çeqçeqa dewra zemane
Nexapî pê emanet bêeman e

Evê kulxaneya kohne xwiya ye
Fena ye, ev 'ecûz a bêbeqa ye

Diza qelban e, ev pîra sihirbaz
Eva pur mekr û hîle şîwe û naz

Derewrey, qehpe û dilrevîn e
Dixapîne ji bo qelbê te bîne

Dîqet ke, daîma hişyari be her
Li vê şora denî pir fitne û şer

Ewê meqsed ev e da dil bibîtin
Ku dil çû êdî yê mayî diçîtin

Dilê her wek hezîna dur û gewher
Ewê sirqet ke, paşî dê bibî ker

Sebir ke Eskerî gêtê tu berde
Temaşa ke çi derman e, çi derd e

Heta dunya huba wê der dila ye
Li dil her daîma derd û bela ye

Bi kullî der bide vê afita zor
Ji dil, ku dil nemînit sermest û kor

Ji destê saqî yê safî vexwo cam
Bizanî da bi heqqê poxte û cam

Ku da me'lûmi bîtin tal û şêrîn
Ji ehwalê cîhana dil tijî kîn

Teemmul ke şeker bigre di munqar
Merêje ber piyan vî şekkerê yar

Fikir ke, gul kî ye, kîjane xar e
Kî ye yar û ji bo te kî neyar e!

Hela durd e gelo, yane sefa ye
Ji bo te rahet e, yane cefa ye?

Xeberdanê ku gotin guh bidêre
Hela dilxwazî ye, yan bo penîr e!

Şîfa ye, derd e guhdarî bike baş
Bihêre her xeberdanê wekî aş

Ji yarî têne gotin yan hewaye
Hela dil tarî ye yane zîya ye

Di mîzana 'eqil bîne nîzamê
Di fikrê de biweznîne kelamê

Tesewwur ke xeberdanê bibîne
Teemmul ke xeta da tê nemîne

Pesendîde dixwazî ey ruh û can
Ku da xalis bibe ruhê xeberdan

Di kûra sîne hilke ateşê yar
Di nîva kûreyê bo te ku bû nar

Derûnê kûreyê bû nar û ateş
Ku tê de bûte bû wek xemreya geş

Kesê nutqê bike teqrîrê bo te
Birêje kûreyê lê têxe bûte

Soxengo wê xeber anî xîtamê
Bide nîva dilê bûte kelamê

Di enbîqê tefekkur da bi kel bîn
Heçî durd e, tu jê carek bi derxîn

Heçî pirsî kesê bêjit bi tehqîq
Ewê xalis bibe der qelbê enbîq

Bi narê işqa yarê hate sotin
Xulase dê bibit bêşubhe gotin

Zeman mislê wekî rovî bizane
Hinik mislê wek qijal pur hewa ne

Ji xeflet wek yetîm hin bûne dilşeq
Hinik zalim hinik baş û hin ehmeq

Beniâdem dibînî şikl û sûret
Xweda wek hev nexelqandi bi hikmet

Qîyafet muxtelif çawa xuyane
Tebî'et jî muxalif wan bizane

Gelek qencî w xerabî fi'lê dijwar
Di alem de hene bê hedd û hijmar

Zîyade gohidarî ke di her îş
Ku paşî pê nebî mehzûn û dilrîş

Kesê hişyari be ba dil xeber de
Li ehwalê xwe û xelqê nezer de

Museffa dê bi der bê gotina wî
Bizan bêfeyde nabe sotina wî

Ku elhasil nebêjî bê teemmul
Soxen safî bike der me'dena dil

Di sebrê, gotinê tehlîlê ke tu
Wuhareng e xeber teqlîlê ke tu

Bi vî terzî eda ke nutqê şêrîn
Ku bî yek merdekî purqedr û temkîn

Bizane lazime sebrê bikêşî
Gelek tal e, divê pê zêde neêşî

Xusûsa aşiqan her lazime dil
Bidin sebrê, ji bo şêrînê rûgul

Cemalek nûra wî Xeyrulbeşer bû
Di çahê da sebir jê ra kerem bû

Di ateş de Xelîlê Heq sebir kir
Ji nûra wechê dîlber bû debir kir

Heta ew nari lê bû bax û bostan
Digel mayên di carî destê bestan

Hebîbê Heq çiqa wî dil bûye xwûn
Çi kêşaye ji dest kuffarê mel'ûn

Sebir kir seyyîdê cumle mekana
Heta ew çû gihişte Lamekana

Temamê peyrewê dîn, pakê nûrîn
Bi sebrê tev gihane 'izzeta dîn

Yeqîn ke, sebr e mîftaha ferec her
Dibin pê fethê her dem qapî yû der

Xusûsa, hadimê qehra xema ye
Muferrehkerdeyê can û dila ye

Sebir ke, sebr e taca ferqa şahan
Li nik Heq rehm e, hem 'efwa gunahan

Evê sebra dibêm, ew sebra qenc
Ne ku humqa himarî te'b(e) û renc!

Îlahî bêkes im wek xakê rah im
Sebirsiz kelbekî dergahê Şah im

Bi heqqê nûrê sebra van sebûran
Bi hemd û şukrê Heq herdem diboran

Minê bêhilm û sebr ê pur gunehkar
'Efû ke, bexşê ke sebra dilê yar

Kerem ke lê ji wê sebra xwe ya qenc
'Efû ke Eskerî ey merhemetgenc!

# BENDA ŞEŞA

## GOTINA HINEK HÎKAYEYÊ PÎR 'EQIL Û BIJARTINA ÇÎROKA QIJIK Û ROVÎ

Bide ey saqîyê nûra du 'eyn im
Giran bûye li min xem barî deynim

Sivik bim da seyahet kim di alem
Bi dil, ku def'i bin ev şîn û matem

Du deryayê (di) dîde bûne yaqût
Ji hûtê qelbê min re bûne xwînqût

Zimerwarîdê çeşmê hesret ender
Zemîrê kîseyê ma pur zi gewher

Bide ey saqîyê peymane yê şah
Metirse pir xenîme şukru lîllah

Mukerrer ke tu wê cama cîhanbîn
Munewwer ke me pê çav û dil û dîn

Fîraqa dîlberê kuştim hewar e!
Cîger sota, ne min war û dîyar e!

Çi narek hilbûye der dil wetî Tûr
Ji işqa nazik a mexmûr û mestûr

Li kû ez dê bibînim yara xwînxwar
Perîrenga ewa bê mesken û war

Bide, dil safî bit, ey canê saqî
Xîyalen dewrê kim, belkî tufaqî

Bibînit vê hebîba şehper î dil
Rehet be gavekî pê ev dilê kul

Şîfabexşî yû dermanê te şafî
Ji min re kafî ye cama te safî

Hela bîne 'ilacê xeste me ez
'Ecaîb xeste me dilheste me ez

Me zahir cismi sar e dil heme nar
Di vê de dûqîtor tev mane naçar!

Dizanim ez, tu zanî 'illeta min
Ev e hêvî her ji te minneta min

Dewaya derdê min cam e 'eyanî
Tu jî camê bide, ey canê canî!

Di vê çola denî de bêkes û jar
Mehêle bêdewayî qelb(i) yekcar

Qedeh dîsan bidêre bo me telmî'
Dilê teng, dilê me pê ke tewsî'

Ji cama pîrê rindan mey binoşim
Hinik fikr û zekawet bête hoşim

Bi dil seyranê kim der vê cîhanê
Çi der mîr'ata qelbim bê 'eyanê

Ji îşê hikmet û ehwalê 'îbret
Bi hev xim 'iqdê durfamek hîkayet

Beyan kim rengletîfe bînime pêş
Ji ezmanê hinik seyyahê derwêş

Di zahir wek hewes, batin gelek sur
Birêjim ez ji vê genca tijî dur

Ji bo me rawî yê 'eqlê hunerwer
Ewî pîrê soxendan ê munewwer

Nişînê sedr ê dîwana me'anî
Zehî xewwasê 'umman ê lualî

Bi xewwasî durê nasufte anî
Gelek sencîde û pezrefte danî

Durê nadîdeyê şehwar ê namê
Goherhayê kîramîter kîramê

Bi minqarê belaxet suft û qul kir
Di silkê me'rîfet tenzîmê kul kir

Ji nav cumle hîkayat û serencam
Wuha bû întîxab ev 'IQDÊ DURFAM

Wuha gotî ji bo me pîrê dana
Refîqê dil, şefîqê ruh û cana

Hîkaye neqli kir wî 'eqli xweş bû
Ji bo me da rîwayet awiha go:

Ji ehwalê zeman çend merdê derwêş
Seyahet bû li dunya wan her û îş

Gehî sehra newred û geh di bajar
Geh der bax û çîmen gahî di gulzar

Gehî berfa çîya, germa newala
Li ser lewhê dil ew kirne mutala

Gehî çeşmê xezalan dil dibirne
Ji nazê dîlberan gahî dimirne

Du reşmarê herîr ê gîsûwê yar
Gehî dil gestine wan marê pir jar

Bi xwûna rezgehê ew mest û medhoş
Geh wek perwane wan dewrane û coş

Ji xedrayê çîmen avên di carî
Ji wan deryayê pur dur û mirarî

Ji qaz û qumrîyan û kundê meşûm
Ji bulbul geh gul û perwane û mûm

Ji her yek hisseyek geh qisseyê pur
Sitendin geh bihîstin nexmeyê sir

Mubarek bûn geh der erdê muqeddes
Ji wan re Ke'beya Heq bû mededres

Ku çûn şehrê Medîne ew guhê Tûr
Supuhrê 'izz û ref'et qubbeya nûr

Çi genc e tê de ye Qurana e'zem
Çi kan e jê bûye hey cumle alem

Ji babê qîbleyê 'uşşaqê muştaq
Ku jê her 'erşê Rehman rewşen û aq

Fuyûzatê îlahî wan li dil hat
Hedîyye lutf û îhsan û fezil hat

Ji Wadîeymenê wan sîne pur nûr
Ji kohê dîlberê dil bûn wekî Tûr

Turaba barîgah a Ke'beya dil
Vemalîn wan di dîde her wekî kil

Munewwer bû beser hem ba besîret
Li wan pîran ê dil daîm di hîret

Tecellî ser tecellî remz û esrar
Peyapey hate qelbê wan ji rû yar

Ne ew nûr û tecellî be yeqîn 'erş
Di zulmatê dimîne, bigre ta ferş

Hemî tev bendeyê helqe bi goş in
Ji 'işq û mehbetê daîm di coş in

Gunulden aç kulagin dinle bir bak
O dur 'uşşake kible, olma ahmak

Wuha geşt û gozar e wan şeb û rûz
Heta çûn cayekî xedra dilefrûz

Wekî baxê Îrem bexçayekî xweş
Temaşa kî tu lê dê bî tu serxweş

Di nav hev tên diçin enhar û kanî
Zulal û safî wek maê cenanî

Welê abê heyatê ne seraser
Ku hinde saf û berraq in wekî zer

Di nav wan maê carî de semek pur
Diçin-tên ehlî yû wehşî gelek pur

Sipîdarê ku tê de sîmê endam
Çinar û bîdê mişk û cewz û badam

Erûk û bûrî yû leblab û xetmî
Binefşe şiftelî gulnar û hermî

Turunc û purteqal û sêv û xenna
Qedîfe nergis û lîmon û mîna

Bih û nar û rihan û lale qitmer
Kiraz û ewşen û sosin seraser

Ji engûr û ruteb enwa'ê eşcar
Gelek tê da hene bê hedd û hijmar

Nebat û çîçek û eşcarê bînxweş
Tuyûr û meywe tê de hem gulê geş

Hemî yasemn û serw û sunbul û gul
Li ser wan qumrî yû şalûl û bulbul

Qulung û kebk û ordek û qitk û qaz
Tezerw û tawus û tûtî digel baz

Bi sewtê muxtelif nexme digotin
Dil û can û cesed jê tate sotin

Hezaran kûkûyê qumrî yê dilkul
Dicerhand nexmeyê xweşxwanê bulbul

Bi şeb ta subhê tûtaka cîgerşeq
Serajêr daliqa wê d'gote, ya heq

Qulung û qazê qingîne bi feryad
Welê kebkan zîyade qehqehe şad

Tezerw û ahûyê xweşmeş di seyran
Li tawus û li tûtî mane heyran

Bi cewlan bazê eşbeh şaqîşaq e
Kebûd û qumrîyan her jê fîraq e

Bi ref ref, rengi reng enwa'ê teyran
Bi ezmanê muxalif nexmegoyan

Di nav de pur xezal û şêr û xergûş
Gur û gûr û rûbahê positên pûş

Zerafe kerkedan û fîl û meymûn
Hebûn tê mar û ejdirhayê reşgûn

Li dor wî bexçeyî sehra û bêşe
Hebûn koh û gelek gir, dar û mêşe

Zimihn û zemzeme pir sewt û deng e
Dikî zen daîma lê herb û ceng e

Kenarê ser weke mewzûn û serkeş
Kirin te'yîn ji bo xwe cayekî xweş

Li etrafê ewan Derwêşê dilpak
Gul û reyhan wekî cennet 'etirnak

Ku rûniştî di nav wan xanê xane
Bi xanî xwanê bexşî çar-i dane

Di vî cayê ferehefza wekî mah
Di nav wan şah, û tevde bendeyê şah

Yekayek penc-i Derwêşê yekane
Bi hev ra yek elîfê elfê xane

Te go, ew cismek in, yek ruhi tê da
Wekî fulka ku hakim Nûhi tê da

Ewan dilşahê Derwêşê xwedansur
Diîsa qelbi her yek şubhetê dur

Ewan helqe bi goşanê derê pîr
Ewî pîrê moxan kole, şeh û mîr

Di nav wî bexçeyê teşbîhê cennet
Girêdan helqeyek tê ferz û sunnet

Gulê ku rû numa, bulbul kete coş
Bi gerden hem sorahî xulxulan xwoş

Kete dewrê û xwoşî saqîyê raz
Gul û reyhan û sunbul des kirin saz

Bi can û dil mutî'ê emr û ferman
Ewan helqe be goşanê Elîşan

Ji zarê bê zebanan ra zeha pur
Bihîstin goşê wan qelbê tijî sur

Gelek esrarehayê lamekanî
Li qelbê wan zuhûr bûne 'eyanî

Ji sûzê şûle yê narê dilê wan
Munewwer bû seraser xaneyê xan

Ji ber xarê li etraf ê rûyê gul
Ji ber gîsûkemenda hakinê dil

Ji wê heybetmilûka rind û dîlber
Ji ateş pertewê wechê munewwer

Ji xewfa xemzeyê şêran ê şahid
Ji ber serpenceyê sîmîn ê sa'id

Ji xewfa xemzeyê şîran ê şahid
Ji ber serpenceyê sîmîn ê sa'id

Dilê wan meskenê tîrê ji nûnan
Wekî nûnê cîgersûz ê 'uyûnan

Ji ahê serdê nar ê qelbê giryan
Zeban sûzî kir û dil kirye buryan

Kebaba sîneyê sed daxi lê ne
Wekî mehmel ji tîra çaxê lê ne

Ji wan derwêşê meynoş ê di pir nûr
Ji vê deryayê dewrana bi der dûr

Yekî incî w dur û yaqût û mircan
Bi xewwasî deranîne wekî can

Hemî wî derci kir durca dilê wan
Bilakirne hemî derd û kulê wan

Ji nûra gewherê pîr ê xumaran
Nîzamek zêde hate qelbê yaran

Ji işqa dîlber a qamet hemî nûr
Tecellî hate qelbê wan wekî Tûr

Zîyade 'işret û enwa'ê suhbet
Kirin der bexçeyê teşbîhê cennet

Îlahî Eskerî ba cumle yaran
Ji nûra suhbet a pîrê xumaran

Meke mehrûm û bêbehre di her dem
Munewwer ke dilê wan pê hilîn xem

# BENDA HEFTA

## BERAYÊ MESLEHET ÇÛNA DERWÊŞEKÎ JI BEXÇE

Gelo zanî tu ey saqî çi hal im?
Çî ye îro xem û derd û xîyal im?

Hevalê wek dur û elmasê mexzûn
Cuda me j'wan wekî yaqûtê mehzûn

Ji cama cewherîn saqî du-sê cam
Bide dûr û diraz e min serencam

Helandin agirê hîcrana dîlber
Ne min 'eql û hiş e,sewda ye yekser

Ji dîde încî yû mircan dibin rêz
Nema halek di min de taqet û hêz

Geh "d"al im,geh "elîf",geh şubhetê "n"ûn
Gehî b'aqil geh mest û gahî mecnûn

Girêda Dîcleyê çav im pira zer
Diçin lê karîwadê derd ê dîlber

Ji mijgan geh dirêjim daneyê dur
Tijî kir gencê sebra wek sedef pur

Bi derdê dîlberê pur dewletî me
Pir in xizn e,ne yekcarî ketî me

Bide bade bila sekn û teweqquf
Metirse xom tijî ne bê teessuf

Di wê xomxaneya pîrê moxan da
Gelek xom hazir in pur mey di wan da

Kerîm e ew dide qet'a metirse
"Hela maye nemaye" lê mepirse!

Lebaleb ke ji bo me cam û kase
Heta karî bide nabit xelase

Xulase, qet meke qet'ê bide mey
Ji bo pê qelbê mecrûh ê xwe kim key

Xemê xumrî kemendê zulf ê mehbûb
Xerabe kir ji bin dil kirye meqlûb

Eger çendan diwxim derdê fîraqê
Umîd im rojekê yar bê tifaqê

Dixwim derd û meraqê yara muhsin
Ji lutfê deyne pa ser dîdeyê min

Bibînim wê cemala pir helawet
Bibarînim gelek eşkê meserret

Birêjim ber qedem van cewherê xas
Ji dîde le'l û încî,dur û elmas

Bigîjim yar û ehbaban temamî
Bi wan zêde muferreh bim mudamî

Me pêşîn behsa Derwêşan beyan kir
Ji wan û bositan hindek 'eyan kir:

Ku wek cem'a Sureyyayê cemi' bûn
Di qelbê bexçe her yek wek şemi' bûn

Ji qelbê wan munewwer qelbê bexçe
Muzir tê da şikandin çeng û pence

Ji nexme xwendina wan morxê pir pak
Ji eş'arê ewan 'uşşaqê dilçak

Gerîban perçe gul bulbul bi çeç e
Tijî bû xwîna nû der qelbê xunçe

Serî danî li ber wan serwîazad
Senayê şahi kir tev bûne pê şad

Heçî ku mufteris bûn cumle tewbe
Kiri,hatin yekayek newbe newbe

Munewwer bû ewan qelbê di tarî
Bedel bû narê wan ba nûra yarî

Ji çeşmê nergisî nêrgiz fedîkar
Ji zulfan bû dilê sosin girehdar

Lebê wek sora gul,gul kir perîşan
Dehen xunçe kirî mehbûb û êşan

Xeracek zêde çeşm û gerdena yar
Li çeşm û gerdena ahû kire bar

Gul û bulbul qulung û qaz û qumrî
Kirin pence kemendê zulf ê xumrî

Ji nûra suhbeta wan bexçe pir xweş
Ji cama destê wan tev bûne serxweş

Çiqa heywan hebûn dar û ber û çem
Ji noşanoşê wan bûn mest û sersem

Ji tîrêjê rû yê yarê,dilê wan
Felek e'ma kirî der burcê esman

Bi narê qelbê cama pur muberra
Ewan sotin dilê pîra muherra

Hesed kir piştî kûza dil tijî kîn
Ji wan yar û hevalê 'işreta dîn

Ewê nehsa ne xêrxwaha wefasiz
Qumaz ew kîmseyî rahet belasiz

Veda dama xemê der keyf û şahî
Ji bo wan serxweşê mexsed îlahî

Ji bo dîse ku ew çoganê çep kit
Dilê wan bêkesan ku şubhê şeb kit

Xiyanet eşkera kit çerxê mîna
Keder da balê mînayê emîna

Bi dûrkirna yekî ehbabê dilkul
Ji wê bezma mu'etter her wekî gul

Gelek pur şadî bû pîra belacû
Ji hev başqe ku bûn yarî di xweş bû

Ku xem bête dilê ehlê dilan pur
Muferreh pê dibit çerxa yeman pur

Wuha îcabi kir îşê nihanî
Berayê meslihet yek pîrê fanî

Muheyya bû ji bo rahê sefer ew
Ji hîcranê dibû zêr û zeber ew

Di enban wî hebû hin zexre û zad
Du-sê perçe penîr û nanê pur dad

Ji yaran xwesti xatir wî bi hesret
Ji dîde eşki rêza şubhetê şet

Cuda bû ew ji ehbab û hevala
Ji wanê wek sedef ku dil ne vala

Di zahir hin gulî berdane ser mil
We lê batin pur in durdane der dil

Ji nûra pêç û fetlê gêsû yê wan
Munewwer bû wuha her çar sûyê wan

Hemî pur dil ji neqşê neqşibendan
Wekî xomxaneya pîranê rindan

Ji wan Erjeng û Manî şermîsar in
Li teswîr û nuqûşan destîsar in

Hemî esrarê heq neqşê dilê wan
Sitara alemê,porê milê wan

Ji sirra Lamekanê dil tijî sur
Ji genca canê can ê dil tijî dur

Ji nûra şemsa tewhîd a dilê wan
Sîyahî têtе vê roja li esman

Ji wê nûrê nebit bawer ke ev roj
Dimînit bê zîya,tarî yû bê soj

Ji ber vê ni'metê şukrane xorşîd
Dikîtin secdeyê lerzane wek bîd

Dicoşe zahir û gerçî di perde
Ji xewf û heybetê,lew rengizerd e

Û lê rengê zerî hin kirne meşxûl
Ji wê hubbê gelek pê bûne mesûl

Ji çavê wan ra zîv û zer cîla ye
Nizanin ku dil pê pur mubtela ye

Di dil de sikkeyê zer wer kutane
Heta qelbê cehennem jê bi jan e

Çi lazim ku dirêj kî vê kelamê?
Were ser qisse û behs û meramê!

Tu karî guh mede van îşê napak
Weyane dê mu'ezzeb bî cîgerçak

Heye dêrîn xeberdanek bi hikmet
Negirtî jê gelo hindek te 'ibret?

"Bizin,mêşin bi lingê xwe bi dar de
Dibin",ey rind û qellaşê di kar de

Çi îcabê dikit ev gotin û qal?
Li halê xwe nezer de ey di her hal!

Li saz û saqî yû mey dîlbera qenc
Temaşa ke ku da qelbê te bit genc

Ji vana her yekî zewq û sefayê
Bigir,da mulkê alem bê fenayê

Dîqet ke Eskerî îşê tu tê de
Meke behs û beyana xelqê zêde

Hela saqî bide camek civatê
Ku zêde zihna me bînit xebatê

Beyan kin halê Derwêş ê di rê da
Çewa bû aqîbet behsa me rê da:

Dema çû ew ji cem wan yarê pur xal
Di halê qelbê wî alem hemî lal

Ji îlham û tecellî dil hemî nûr
Ji sidq û rasitî "nûrun 'ela Tûr"

Ku nûra mihra siddîqî di qelb e
Ne wek me haşe dilmexşûş û qelb e

Hezaran keydê nefs û mekrê şeytan
Dilê me daxi dane,kirne buryan

Esîr in em di qeyda nefsa amma-
re de,dil jê perîşan in çi emma

Eger ne şahê dil Derwêşê dilşah
Ji rehma pur me bîne cade û rah

Me rê şaş e fena dê bin wekî seh
Di çola pur gunehkarî de bê reh

Umîd û hêvîya min şahê mestî
Ji vê çola fena derxîne hestî

Xebîs û bêheya şermende me hem
Derewrey kelbekî bêfeyde me hem

Welê telbê derê wan im di bê kes
Ji xeyrî wan nehin min kes mededres

Nehêlin bêxwedî tûlê derê xwe
'Efû kin hem bikin sedqa serê xwe

Li dunya û li uxra kelbê şah im
Egerçi pir xebîs û rûsîyah im

Li keyfa navê şeh hin cam û bade
Bide saqî ku dil bit saf û sade

Muferreh bin bi dil em derkevin der
Ji vê dunya gewende pîra pur şer

Mucewher qefesek nûranî ye dil
Muşe'şe' kohekî tûranî ye dil

Bûye ax û turab ev qelbê rewşen
Bûye xar û dirî ev bax û gulşen

Bi herdu desti bigre qapîyê şah
Ji bo dîse biîse dil wekî mah

Di wê sayê ku bî aza di her dem
Biborînî tu 'umrê şad û xurrem

Ne ew pertawê nûrîn be tu zanî
Dikêşim saqîya çi vî zemanî?

Beyan ke Eskerî vê qisseta xwe
Ku belkî jê benasin 'illeta xwe:

Weda' kir şahê Derwêş ê derûnpak
Ji yaranê wekî miskê 'etirnak

Me go,xatir ku xwestî wî ji yaran
Ji xem hêstir dibarand şubhê baran

Di wê weqta perîşan ê zemanê
Berê,şanê ji ehwal ê cîhanê

Ku yanî pîrekî merd ê derûnsaf
Ne ew ehlê gezaf û gotin û laf

Ewî merdê Xuda pakê ne şakî
Di şehrahê meşî ba teb'ê xakî

Wekî wan merdomê dilpare û çak
Li xakê bû rewan û ew bi xwe xak

Bi xwe ehl û digel nefsa xwe cafî
Li rê her ew diçû ba payê hafî

Bi sîne daîma meşxûl û guhdar
Ji reşmarê nîgarê dil tijî jar

Gula dil xwûnxwirê derd ê feqîran
Hezarê dîde yê mestê hesîran

Keder qût û demê dil abê dîde
Ji dîde xwûnê dil her dem çekîde

Kerîm û dil bi rehmê bêgunahan
Li dil daxê kesê zîndan û çahan

Xerîbê merdomê ehlê cîhanî
Siyapoşê xemê 'alî mekanî

Cudayê yar û ehbabê xerîbî
Cesed bêtaqet û dil bêşekîbî

Li rahê xurbetê mestane maşî
Dikir şerha kitêba sîne haşî

Heçî şerhê di sîne neqşi dabûn
Xet û xalê ku bê sewt û seda bûn

Bi kilkê tîrê qewsê mojje yê yar
Bi hubra eşkê cavê cam ê pur nar

Dikir pare dilê herf ê tijî xwûn
Ji nû haşî didane pertewê nûn

Sufûfê setrê mest ê nameya dil
Ji neblê zehrîdarê qews ê rûgul

Fîxanê nale yê nayê vedane
Te go,ayîneyê heşra Xuda ne

Ji nîşê mojje yê mestanê serxweş
Sipî me'na bi derkeftin xetê reş

Ji pertawê dema heşra Xudayî
Qîyama sa'etê tê re xuyayî

Bi vî halê me go,Derwêşê dilnûr
Ji ehbabê xwe ew bû dûr û mehcûr

Meşî mîqdarekî ew zatê pur pak
Welê hîcrana yaran dil kirî çak

Bi sidqê safî dil da dîlbera xwe
Fîda kirbû di rê de wî serê xwe

Çîya û deşt û wadî bexçe û bax
Gelek dîn şêr û rovî qijik û zax

Koşad e daîma çeşmê dil ê wî
Hemî guhdari bûn cuz û kulê wî

Heçî şey'ê bidîta wî bi diqqet
Nezer......................ret

Li sun' û hukmê heq her dem tefekkur
Dikir wî qencê pak î dil tijî sur

Ji wan pur vêketin der qelbi enwar
Gelek fanos û fîndê remz û esrar

Wezîfe ger çi bû heqqî eda kir
Di rahê heq de bê mozd û seda kir

Sena û hemd û minnet bê nîhayet
Ji bo Rebbê xwe wî kirne be xayet

Vegerya cem hevalan merdê alim
Sipîrû qelbinûrîn sax û salim

Bi hev şad û muferreh bûn zîyade
Li hev gêran bi şahî cam û bade

Ji keyfa 'işreta wan ev dilê jar
Dixwaze saxerek noşim bedel yar

Bi lutfa şahida şehbaz û şehzad
Ji bo gavek rehet be Eskerî şad

Muferreh bit li vir bendê xîtam kit
Rehet bit qissetê paşî temam kit

# BENDA HEŞTA

## VEGERA DERWÊŞ CEM HEVALAN Û BEHSKIRINA EHWALÊ YETÎMÎ JI WAN RA

Bide saqî ewê raha wekî ruh
Ji rîhê wê rewişde geştîya Nûh

Bide filkê dilim hin narê meygûn
Temaşa kim li vê behra hemî xwûn

Çira dil her kesî tê da bi xwîn e?
Çi zulm e ev çi dem der abigîn e?

Ji eşkê çeşm ê engûri hinek dem
Bide da ku bela bin ev kul û xem

Ji vê xwûnabê çend cur'e bide min
Binoşim,ev çi xwûn e bê ser û bin?

Ji xwûna gerdenê yar û xerîban
Di helqê helqe deynim dilkebîban

Were saqî bide bîne xîyalê
Ewan daxê li dil dane şemalê

Birêje saxerê xwûna rû yê gul
Bi zehra sunbulan teskînê ke dil

Ji hicra badeyê reng yarî mest im
Bi mestî xakê dergahê te qest im

Di bezma me qeyam ke saqîyê can
Ji firqet 'eynê min teşbîhê mircan

Ji vê tesîrê da 'eyni di nav im
Ku ew jî bûye xwûn ez der di nav im

Muhemmed Eskerî xwûna hinavan
Ji îsm û cismi tê mislê xunavan

Were ey saqîyê bezma hebîb im
Ji zûde pir bi derd im bêtebîb im

Were saqî bide saqî ji bo me
Xunava ebrûwê taqî ji bo me

Di vê taqê qewî bê taqet im ez
Bi rox zerd, û bi dil bê rahet im ez

Tijî ke saqîya "qul lî hîyel emr"
Ji bo goşê me jî pur neş-e kit emr

Hewasê min ku jê tev zewqê bigrin
Ku da em jî ji wan pur şewqê bigrin

Were canê beser ew pertewa tê
Bi te qelbê me her tê te sebatê

Rehîqa nabî bîne yarê şahî
Bide ey saqîyê gewherkulahî

Mehella ke qedê nazik kerem ke
Dilê bêçare carek bêelem ke

Mukehhel nergisê mestan bidêre
Ji gerden pêçê reşmaran vegêre

Gula bê xar û pur saf a herîfan
Hela rake ji ser "dal" û "elîf"an

Du şeq ke turreya ber cebhetê sîm
Li etrafê sîyehxal ê wekî cîm

Kitêba wechê ehsen bîne carek
Muferreh bin bi wê wechê mubarek

Bedel yara perîpeyker sîfethûr
Sehîserwa mucessem heykela nûr

Li te gavê temaşa kim bi mestî
Ku da hingê rehet bin qelb û hestî

Çikû bihna hebîba şahê xûban
Ji te têtin,dibin rahet dil û can

Herîfane bide saqî binoşim
Seraser zahir û batin bi coş im

Lebaleb ke qedeh dîsan bi nazî
Jibîra kin hemî şîb û firazî

Bide 'eynê 'uyûnê abîdade
Ji bo me badeyê yaran ê sade

Bitîsîne xet û xalê di nûrîn
Bikin zewqa heçî şey'ê ku borîn

Werîne bulbulê gulzar ê weznê
Fereh ke bendeyê pabest ê heznê

Were saqî bide camê ji bo me
Beyan ke meqsed û kamê ji bo me

Ji derwêşan çi dur hate mezadê
Bide saqî beyan kin vê muradê

Ji wî durrî çi şûle da dilê me
Çi şebnem hate sîmayê gula me

Di lewhê dil me dî ev resmê hanê
Wuha îsa ji bo me dur di kanê

Di kanê da xuya bû pertew û nar
We lê berqa ji yarê bê dilê yar

Ewê berqê dema ser da xed û xal
Hîlalê rû li dil da tîrê pur al

Di bedra dil nezer kir reşmê 'alî
Mûşe'şe' bû bi 'işqa yarê halî

Xezîne şûle û gewher bi der hat
Ji tîrêjê,dilê me ev xeber hat:

Berî enha me go Derwêşê dildax
Vegerya cem hevalan salim û sax

Ewî dilşahê kohne libsê hafî
Gihîşte kenzê durran pak û safî

Diîsan her wekî şemla li esman
Munewwer bû hemî alem ji ber wan

Çi nûrîn zat in û alîsîfat in
Mûşe'şe' bûn li dor hev çûn û hatin

Meya nûrînşû'a'î wan di dev da
Şûa' û şûle wan dane di hev da

Te go, qey perçeyek esman e ew bax
Ji wan pur şewqi da dar û ber û tax

Hemî bexçe bi misbahan muzeyyen
Ji wê der terdi bûn şeytanê mel'en

Felek şeq bû dilê wî der semayê
Ji narê qelb ê xwe ser da hewayê

Ji kerban şems û hîv û necmê tê de
Hemî bêşewqî bûn roxzerdê zêde

Li dil da çerxê mîna daxê hesret
Nema tê de bizan qet zewq û lezzet

Ji nûra dîlberê yaranê sadiq
Ji hev re tevde me'şûq in hem aşiq

Li dor hev çûn û hatin wek tewafê
Wekî sîmorxê cewlan kit li Qafê

Ji wan ra Ke'be kafî bû rûyê yar
Xwe cumle yarê dîn ez nûrê bisyar

Ji wê cama surî der qelbê enwer
Bîla mani' didîn sîmayê dîlber

Di zahir gerçi wan çend cism û can e
Û lê batin bizan yek ruhê wan e

Di fanosa ruhê wan şem'a mehbûb
Mûşe'şe' bû gelek ew nûra pur xûb

Di wê şewqê wusan mehw û fena bûn
Tenê yek ma û ê dî cumle rabûn

Fena bû tê de fanosa qefes wan
Nema xeyri hebîbê hîçî kes wan

Fena û mehwi bûn mîqdarekî man
Di narê nûra husna dîlbera can

Ji sirra wê hedîsa "lî mee'llah"
Ewan dîtin gelek remzê rû yê şah

Ji camê wesla dîlber mesti bûn ew
Ji marê dîlberê dilgesti bûn ew

Ku turyaqê fîraqa yarê serkeş
Kire camê vexwarin hatine heş

Ji nû de varqilîne ew li hevdu
Li dil vêket ji hicran ateş û dû

Tesellî dane hev dîse vexwarin
Dur û mircan û încî wan bijarin

Wuha gotin hevalê xwe mu:Ey can
Te kirbû hin seyahet geşt û seyran

Heçî tiştê te xwarî afîyet be
Di can û cismê te nûrîn qewet be

Welê şey'ê ku 'îbret bû te dîtî
Weya pûstanê hîkmet bû te mêtî!

Hela bêje ji wan hindek qisa xwe
Ku da em jî,ji wan bigrin hisa xwe!

Dibin saye li ser eynê qedehnoş
Di nîva sebzê de pîrê sîyehpoş

Soxen sencîde kir Derwêşê wek nûr
Ji bo yaran evan durranê meknûn

Goher da rişteyê pîrê gohernas
Evê 'iqda durê da gerdenê nas

Telûl kir goher ber cewherê cam
Di camê şûle da ev 'IQDÊ DURFAM

Zîyade şewqê da narê evînê
Ku aşiq jê dirêjin eşkê xwînê

Temewwuc kir muhîtê qelbê her wî
Bi der anîne jê durr û goher wî

Bi yaran da ewî ba serfîrazî
Evan durrê xefî der kenzê razî

Bi le'leynanê le'l ê le'l û yaqût
Ji behra qelbê wan ra wî kire qût

Sedefkenza xwe riht û şûle rakir
'Uyûnê sadiqan mircan fîda kir

Dilê ku kanê mircan û sedef dî
Ji bo xwe xizneyê durrî şeref dî

Ku ebrê çeşmê barî xwînê baran
Veda şimşîrê berqa durr ê yaran

Ji wê berqê munewwer cumle alem
Hinik hişyari bûn hin mest û sersem

Duranê durce yê qelbê sedefwar
Ji durcê hate der ney bû şekerbar

Evan xal û xetê remz û îşarat
Evan lûlûyê lalayî 'îbarat

Evan xeylê hemî feyrûzê wek rûz
Evan feyrûzeyê xedra yê dilsûz

Nuqûşê daxê Ferhad ê kemînê
Evan baxê xed û xalê Şêrînê

Evanê mest cunûdê qel'eya dil
Evan eşkê fîraqa çehreyê gul

Kemenda gîsuwan ê wê Suheylê
Sewadê pertewan ê meyla Leylê

Evan mestanê rind ê tîrîbaran
Bi can û dil serîpa yê nîgaran

Evan hesret dilê Mecnûn ê Leylê
Sufûfê cund ê xemê Leylê,wey lê

Evan pertawê qelb ê bêqerarî
'Elamatê dilê pur nar ê yari

Ji qelbê mexzen ê esrarê Derwêş
Neqiş kir şekkerê ney bexşi kir pêş

Evê zehra bi şêrînî eda kir
Ku pê qelb û dilê yaran dewa kir

Nîhayet şûle da derdê feqîrî
Zemîran da zemîranê Herîrî

Ewî Derwêşê sahibraz ê dilcû
Hîkayet kir ji bd yaran weha go:

Ji we fariq ku bûm nê cayekî dûr
Ketim behra xeman der doreke kûr

Digo ezmanê dil bîstî guhê dil
Li ku îro kuca bû lezzeta mul

Dibarî hem ji dîde le'l û mircan
Diçûm lêkin wekî yek merdê bê can

Me dabû çeşm û guh ser dil bi kullî
Bikim hissê ji îlham û tecellî

Wusan xerq im di deryaya tefekkur
Di van îşê mezin mame teheyyur

Dibêm xewn e,xîyal e ev li ber çav
Çi ne ev şikl û me'na hatine av

Hene em ey gelo ger em hene rast
Hebûn naxwazî te qet kêmî yû kast

Ji xwe hêj deh hezar alem hilak e
Ewî baqî bizan xellaqê pak e

Kesek nîne di meydana heyatê
Ji xeyri Heq ne qurbana mematê

Hemî neqşê Xwedayê daîmî ne
Di alem mezherê kul ademî ne

Çi îhsan e ewî ruhê îzafî
Kerem da cismê xak ê pak û safî

Nema şey'ek bi destê me bi yekcar
Temamê alemê bû mulkê Qehhar

Evan neqş û nuqûşê ku diçin-tên
Muheqqeq dê biçin hinkî dinê bên

Çî ye hikmet nizanîtin kesek ev?
Çi ecsad û ruh in,alem çî ye tev?

Di vê behra muhîtê ez ku werbûm
Nema ez tê de ez bê pa û ser bûm

Me wunda kir xwe û xwe çû ji destan
Wuha mebhûti mam teşbîhê mestan

Gelek meşxûli bûm bê pa û bê ser
Te go,qey ez diçim wek bayê serser

Bi vî halî meşîm mîqdarekî çûm
Di wî halî me dîn perwane û mûm

Ku ruhnî bû hinik çav û besîret
Li hawîdorê xwe fikrîm bi hîret

Mi dî nageh di reh tilmek xuya bû
Wuha pejmorde bê reng û gîya bû

Zîyade xemzede hem dil tijî dax
Gelek perkende bêçare ne wek sax

Wuha ez xerqî bûm der behra fikret
Ji dunya bê xeber zêde di hîret

Di wî halî de nageh dengê zarî
Kete goşê min î godarê yarî

Çi zarî zarîyê bê da û baban
Ji narê cerg ê tê mislê kebaban

Ku ahên wî di perda guh xeber da
Ji wî şewtê di nîva dil eser da

Ku tebla goşê min jê da gelek deng
Te go,qelbê me lê bû gazî yû ceng

Di uznê min kesê hîcran ê dîde
Xerîbê dil ji dunyayê burîde

Nîşabê ateşî da sîneyê dil
Kire pare ji nû cergê berê kul

Kemendê zarîyê wî bêkesê jar
Serê min girte bexçe dil kirî zar

Kulabê nawuk û şewkê kemendê
Gihan hestî yû xistim qeyd û bendê

Çi êş û janê daye her cîyê min
Ji ber pur sarî bûn dest û pîyê min

Dibêjî,qey li ber min sedda Çîn e
Kî ye êdî qedem zêde hilîne?

Evan marê di reş bûn helqe helqe
Dihelqim dil ji ber sed felqe felqe

Diqelqim dil birîndar û nizaim
Qîyamet rabûye ya natûwanim

Wusan tesîrê da zêde keder kir
Di vê damê da qelbê me hezer kir

Heware,gazî ye,ceng û xorûş e
Weya ew yek feqîrê derdê boş e

Serîpa ye di xana karîwanî
Di vê mihmanseraya natowanî

Di vê meyxaneya mey mewt e tê da
Di vî cayê dilan her şewt e tê da

Zimihn û zemzem e zarîn e mest im
Çi xarê bê gul e wek mari gestim

Gulê bê xarê mestûr î hîcab e
Fîxanê bulbulî bê tabî nabe

Dilê eflaki bû ateş ji ahan
Zemîn pur abê eşk ê herdu çavan

Ji wî dengî zîyade mesti bûm ez
Wekî wî tilmiki,dilpesti bûm ez

Me xîret kir hinek xwûn hate coşê
Dilê medhûş ê cuzî hate hûşê

Li etrafê xwe fikrîm ez bi dîqqet
Ji kû tê zanibim dengê bi hesret

Li zarînê bi can ez gohîdar im
Ji girye zêde bê sekn û qerar im

Çi mumkin guh nede efxan û zarî
Ewî zatê ku ber dabit mecazî

Ku elhasil mi dî nê dûr e,nezdîk
Ji nav çend dari tê ev dengê pur çîk

Heta wur çûm bi sed fikr û xiyalê
Gedayek dî me teşbîhê hîlalê

Li bin darê li ser çeşm e perîşan
Diherkin çeşmeyê xwûnabê çeşman

Eger saqî di vê navê du-sê cam
Bidî,pur qencî ye îhsaneke tam

Ji waweyla û zarînê Gedayê
Me dil zêr û zeber bû şubhê bayê

Û hem şebnîme û dil pur xeraş im
Ji derdê ruwê dîlber der telaş im

Wekî ehlê Xweda zillê hinavan
Bide ser bêkesê mest ê xunavan

Bide çend qurtê saf ê şîşeya pîr
Ji abê dîde kim wan şubhetê şîr

Bulûdê kim bibarînim li ser dil
Di vî erdê ku şîn bin gîsûyê mil

Binefşe gul rihanê yarê serxweş
Di wê mezrê bibînim bihnê kim xweş

Muferreh bim di wê sayê biçin xem
Ku bêjim qissetê ba serxweşî hem

Ji yaran re ewî ev dur eyîsan
Li lewhê qelb ê wan pir sir nivîsan

Hîkayet kir ji bo wan pakê Derwêş
Yetîmê bêkes ê dilçaki,Derwêş

Digo,ew bê newa yê dil tijî xwûn
Ji marê Leylê dewra şubhê Mecnûn

Ku hêja terhê dara nûgihayî
Di xwûnabê zeman e bernedayî

Ji bax û bositanê vê serayê
Hezarê wê nedî werda wefayê

Wefakarî ji dewrê qet nedîbû
Peyapey jê re dewlabê bedî bû

Wuha xwûnabê pur esmanê çavan
Dibarandî li ser kohê hinavan

Şirişkê xwînê te'dayê zemanî
Ji dîde tate xwarê mislê kanî

Ewî tiflê yetîm bê dê yû bê bab
Tenê narê zemîr ê yar û ehbab

Di dil wî ateşê zulma zeman e
Ewî qesmet heman eşkirewan e

. Li sîne destek û êdî di dil da
Dimû'an şîn kirin sebzê di gil da

Ewê zulma ku mislê marê dîn e
Vedabû pê,te go,bîmar û dîn e

Hemayîl destê ber sîne serîpa
Di helqê,fetlê mar ê dewra bêwa

Çu zulfê helqê xwar ê çehreyê yar
Wuha gerdenşikestî dil tijî jar

Be ser poyan û dil ehbabê coyan
Cîger buryan û ezman yarê goyan

Ji gûhistan û berrê kurreya ab
Tijî xem bû,dili ba lerze û tab

Me jê pursî:Bibêje ey weled qenc
Çira hinde dixwî derd û xem û renc?

Beyan ke ey puser halê xwe tu baş
Hela bêje çira heyrî wuha şaş?

Ji narê qelbê,her şêva te rûz e
Gîya şîva te ye,mesken di toz e

Ji bo çi hinde digrî,pur dikî ah?
Zemîn jê xwîn bû wê reş bû dilê ma!

Bi girye şîn û matem erd û esman
Heta cennet,cehennem,'erşê Rehman

Bibêje, ma te nîne da û bavek?
Weyane der cîhan suhtîhinavek?

Ku hinde bê dil î,mehzûn û mest î
Nema îlla li ser te çerm û hestî!

Wuha bê mesken û ca yî çira tu?
Ji bo me bêje halê xwe bira tu!

Vegêra dabû cabek aqîlane
Mi zanî rasite qet ne yelan e

Wuha go:Ey 'emê pur 'izzet û qenc
Ji keyfa kes dixwit ev ezyet û renc?

Nedî tava dê yû bava serê min
Ne wan xwarî ji vî şaxî berê min

Bi berxî têrî min şîrê diya xwe
Nexwarî,bûme kavir hem gîya xwe

Hene min eqruba 'eqrebmîsal in
Qerase dewletî şubhê qeral in

Serê dûva dilê wan semmê qatil
Ji hubba vê cîhanê zillê zail

Me'azellahi ger yek sailê jar
Bibînin dê vedin pê şubhetê mar

Turuşrû,rûreş û ezmanikeskîn
Dikin du pare mertala dilê dîn

Bexîl û pur teme' dunyahebîn in
Ne ew merdê Xuda şehrahê dîn in

Li cem'a mal û ga û ker herîs in
Di dil nûra Xuda nîne,xebîs in

Ceyîs û pur xebîs in nîne îman
Wucûda wan wekî zurnayê şeytan

Mudamî pêv dikit wan cismê bê xêr
Wuha her tû dike qelbê wekî dêr

Li dunya textê şeytan qelbê wan e
Di cehnem textê şeytan wan mekan e

Ji bo birçî nebin dernakevin der
Di zahir hem di batin çêdikin şer

Wuha dê hebsi kin ezyet bibînin
Ji bo çend luqmeyê zêde hilînin

Hekîmanê berê xweş gotine wan
Di heqqê van herîsên şubhê şeytan:

"Dixwazin hûn bibînin zer,perê xwe
Gûyê xwe b'xwin,gûyê xwe b'xwin,gûyê xwe"

Ewan jî ev qebûl kirne bîla şek
Di hubba malê de mane çu eşşek

Me tu aciz kirî ey qencê bav im
'Efû ke,pir dişewte qelb û nav im

Ji ber pir sotinê pir gotinim ez
Ji pêsîrê xeman pir dotinim ez

Ne ku keyf e wuha ez dûri ketme
Me pir sîle ji dest wan xwar û letme

Dikim nakim qe nasekne kela min
Ji derdê zêde ye ev helbela min!

Digot û hem digirya pê re bê hed
Dilerzî hem seraser qamet û qed

Gelek giryam û agir ket dilê min
Gelek bûn zêde derd û muşkulê min

Xulase min di berda ta ku geş bû
Me ramûsa û ser mizda ku xweş bû

Di berda û nerî lê min bi rehmet
Me kir hembêz û pir boşî bi şefqet

Me rabû hin penîr û nani dayê
Dilê wî xweş kir û îhsani dayê

Zuwa kir çeşmeyê wan çeşmê xwûnbar
Me da behra dilê xwînxurde yê yar

Dikim şîret bi can hûn qelb û guh bin
Hifiz kin vê defîna bê ser û bin

Ji ber giryê yetîman 'erşê Rehman
Ji riqqet tête lerzê ew Elîşan

Di heqqê wan de hûn bin pêştirê wan
Ji çavi (hûn) bimalin hêstirê wan

Ser û çeşmê ewan ramûsine hûn
Bi abê şefqetê geş kin dil û gûn

Hezîn û bêumîdê bê dê yû bav
Ku dirjînin ji çavan eşkê xwûnav

Li wan kin ger heye îhsanê rehmet
Di dil de sarî kin wî narê hesret

Bibêje Eskerî van şîretê xwe
Bigir namûsa dîn û xîreta xwe

Nekî gazin,heye roja hîsabê
Ku paşê dil didî şîş û kebabê

# BENDA NEHA
## SITENDINA QIJAKÊ PENÎR JI YETÎMÎ

Were pertewfişan ke saqîya tu
Ewê camê ji bo me aniya tu

Hila tekrari ke zêde bide mey
Dinalim her şev û rojan wekî ney

Nema sebr û sebat im ey dilara
Ji van derd û xeman carek Xweda ra

Ewê cama cîhanbîn lutfê ke bîn
Ji gul wechê hebîbê tê de ye bîn

Yetîmê dergehê meyxane cam e
Dewayê derdê min her tas û cam e

Hezîn û bêkes im,xestedil im ez
Nesax û ne mirî me,dilkul im ez

Bide camê,hela wê merhema dil
Hinik avê bide narê xem ê dil

Mûferreh ke hezar û 'endelîban
Terehhum ke gula baxê xerîban

Fuadê bulbul ê can xeste ye ew
Di xarê werdê dîlber beste ye ew

Xerîb û par e mêlakê hevalan
Û hem kuştim ewan çaşmê xezalan

Di hicranê wuha gêj û nizanim
Ji taqet keftime pur natûwan im

Bide saqî yetîm im bêkes im ez
Ji dewrê dil tijî xar û xes im ez

Bi hêvî me ji te ey hemdemê can
Etekbûsê derê şah ê Cemê can

Hekîmane bide min abê lamih
Çu mahî teşneem ey mahê samih

Xeraşîd e dil im saqî kerem ke
Hela çend cur'e mey der camê Cem ke

Binoşim mesti bim zêde teles bim
Nemînit xem çi pur zewq û hewes bim

Xwe wunda ke me bîne keyf û coşê
Zebanê bê zebanan bêt xorûşê

Li etrafê me dar û çîçek û gul
Bimînin tev bi dil pur hesret û kul

Perakende di bin barê xeman da
Di dil taqet nema sebrek di can da

Helandim agirê hîcran a dîlber
Bi mislê ta û derzî mame yekser

Ji bîr kin êş û derdê firqeta zor
Hela gavek bimînin bê şer û şor

Şeha bala nişîba xûba alem
Perîrenga sîfethûra ji Adem

Gelek jê dûrî ketme wayê weyla
Cîgerdax im wekî Mecnûnê Leyla

Ji vê leyla fîraqê leyl e ser me
Ziyade leylikor im der beser me

Di sehrayê fîraq û behrê leylan
Kirim dîwane wan çeşmanê ceylan

Perîşan rûzigar im saqîyê can
Were îhsan ke rahê ruhê taban

Tu zanî xakê şahê serxweşan im
Esîr û bendewarê mehweşan im

Me serxweş ke biçit eqlim seraser
Bibînim ehsenu'tteqwîma dîlber

Li wî sîmayê nûranî nezer dim
Ji husna dîlberê gavek xeber dim

Sivik bin xem li ser min sazê dîlber
Sîma' kim ez bi goşê rûh ê dil her

Tereb bête dil û can û cesed pur
Ku bêt qelbê me îlhama Semed pur

Çi reqqasê bikim der bezma 'işret
Çi xewwasî bikim der behra fikret

Bi hukmê bade û nûra rû yê yar
Ci perwanesifet bim ateş û nar

Ji yumna ayeta "Berden selama"
Xelas bin j'agiri kafir zilama

Ji nûr û pertewê husna rû yê yar
Li me ew nari dê bit bax û gulzar

Du-sê tasan bide saqî binoşim
Heraret zêde bigrim ser bicoşim

Evê ava ku teb'et agir e dil
Dilan b'aqil dike pur saf û kamil

Bide saqî delîl e cama rewşen
Ji bo zindanê zulmet bûye rewzen

Mûnewwer ke şeva me kec ke taçê
Hemî tev şah û bende bêne bacê

Xudanşûle cemala şem'ê cem'ê
Bikit qelbê ku mesticem' ê şem'ê

Ji lem'ê şem'ê pur nûra hebîban
Mûnewwer ke dilê miskînxerîban

Bide saqî meya pur saf û ronî
Olur gunlum munewwer îçsem onî(15)

Di bax û bositanê dewrê deycûr
Diîse bo me her ev pertewê nûr

Bide da îqtîbasê lem'ê şem'î
Bikîtin ev dilê mexmûrê cem'î

Ku îcar jî bidî cam û peyalê
Bibêjim halê lawik ba qijalê

Bide saqî çewa 'ekkûya bê xêr
Yetîm xafil ku ma jé girtî penîr

Ewan yar û hevalê sadiq û qenc
Bi şadî tevde hem der ezyet û renc

Cemi' bûn durr û mircanê di durcan
Di wê cayî sefabexşê dil û can

Di bax û bositanê 'endelîban
Di nêva werd û dengê bêşekîban

Di nêv hendê gulê wê morxîzarê
Di cayê mesrehê morxê buharê

Ewan morxê xweş elhanê xezelgo
Siya şaxê bi meywe çîçek û bo

Di binde meclis û resma xwe danîn
Wekî bazan kubûda xwe deranîn

Zemanê şûley ê sedra kubûdê
Qîyam kir şemsa alem çû sucûdê

Cîla û pertewê qelb ê gûgerçîn
Mûnewwer kir 'Ecem,Rom û heta Çîn

Firî morxê sipîdê afîtabê
Û hat zaxê şev û ro çû kebabê

Di hev werbû di axê qursa xûrşîd
Eser jê qet nema,ma cama Cimşîd

Ku narê qelb ê Mucnûni cila da
Cemala şem' a Leylê nû sela da

Dema Leylê xwe reş pêça û rabû
Ji xewfa pêçê reş dunya xera bû

Moje da qews û tarê zulfê kêşa
Te'ala! kîje dil ma ku ne êşa?

Dûxanê ah ê buryanê zemîran
Sema tarî kir û rengê munîran

Du şehmarê herîrê leylê Leyla
Li me xermen veda reş da Suheyla

Kemendê gîsû yê wê şahibazê
Mehabet da dili şîb û firazê

Ku reşmaran xelek da gerdena Leyl
Rihanê belg ê reş kir setrê gul meyl

Şirîba me'newî bû swarê Şebdîz
Xefiyye bû di seyra rûwê Perwîz

Û lê meyla di dil bo işqa Ferhad
Ji dil iqrari da hem ev kire yad

Hela derdê di kî Ferhadireng e?
Hela ahê di kî ba kohê ceng e?

Hela cerhê di kî derman çira ne?
Hela eşkê dikî jê ra çira ne?

Hela kî dilbirîn e,zarî nîne?
Hela kî şubhê Mem dilyarê Zîn e?

Hela daê di kî pur bêdewa ne?
Fîxanê bulbulê kî ta sema ne?

Kî ye ew tê refê qumrî yû qazan?
Di seyda wan de çapik şubhê bazan!

Hela kî Yûsifê zîndana eşq e?
Kî ye mislê Zuleyxa der di meşq e?

Hela narê di kî bostan e jê ra?
Kî ye Nemrûdê kafir can e jê ra?

Hela daxê di kî leylê xuyane?
Kî ye Mecnûnê Leylaya zeman e?

Hela derdê di kî derman e jê ra?
Hela eşkê di kî hirman e jê ra?

Bide hingan şeraba işqa bazî
Ji hingan re şua'atê mecazî

Ku wî dermanê bêhûşî kire cam
Temamê alemê ma mest û bêqam

Serê marê reşê mestî deranî
Hemî kir mestî der mesta nihanî

Kire 'ariz li alem 'illet û êş
Welê hin pê bûyin mecnûn û derwêş

Kesê bîdarê yarê be bi yari
Bila bîmar û dil bit gestê mari

Bi tarê zulfê marî mestê xeste
Bikit yarê dilê bîmarî beste

Bi zehra gîsûwan ê marê yarê
Dilê bimarî dê bête qerarê

Kesê çu rahetê zehmet kire noş
Heçî zehmet vexwarî aqîbet noş

Heçî neqş û nuqûşê ney nivîsand
Heçî xal û xetê enha tiyîsand

Zemanê bulbulan ê baxê derdan
Dinoşin cam û xwendin derdê werdan

Zeman derhal kete vî libs û rengî
Di mîna yek wucûdê merdê Zengî

Ji nû ve pîrê Derwêş ê sîyehpoş
Bi der xistî ewî qarûreyek xwoş

Serî ba muhri bû bikr û dilaram
Mîzacê rûh ê tê kafûrî bû tam

Hilanî şahîbazan tacê qumrî
Ji gerden hate xwarê xwûna xumrî

Fîdayê bezmê bû re'sê kubûdê
Ku hêja te'mê xweş jê hat wucûdê

Wekî şem'a serî jê be di bezmê
Ziyade şu'le ê çê be di bezmê

Heçî perwaneyê şem' ê ziyade
Ji lem'ê dê bikin ew îstîfade

Wekî perwane hatin dora şem'ê
Dimû'ê şem'ê,narê qelbê cem'ê

Ku qulqul da surahî bulbulê dil
Bi fulful hate camê dîde ber gul

Ku mey hate fira morxê dilê wan
Firî perwazi da ta 'erşê Rehman

Li hawîrdorê cama 'erşê e'zem
Kirin cewlanê wek perwane ba hem

Ewan qudsî ruhê morxê di bê kîn
Mûnewwer bûn ji wê qendîla nûrîn

Seraser xerqê nûrê bûn hemî ew
Çi kûhê Tûri pur bûn şewq û pertew

Gelek enwar û sirrê alema rûh
Li wan ihsani bû pey pey wekî Nûh

Kemala işqê dîtin aşiqê yar
Bi hev re camê mey noşîn bi tekrar

Ji bezl û nimetê yara hemî nûr
Mûferreh bû nûdil bûn şubhetê Tûr

Ji yaran ra ewî pîrê soxensenc
Beyan kir dîse hin razê di pir qenc

Zebanê tûtî yê Derwêşê esrar
Guher rêht û şeker da le'lê minqar

Terazû hemqiran kir le'lê zerkêş
Çi dur dan qelbê wan yaranî Derwêş

Hîcaba leylê rakir leyla efrûz
Te go,subhane Ellah leyli bû rûz

Fener da leyl û perwane ji Leylê
Heta jê şûle da qelbê Suheylê

Ku mîna hate coşê dilxuroşê
Bi le'lan camê mîna hate noşê

Zîyade sûzê razê dil 'elew da
Bi wê qelb û dilê wan dax û kew da

Ku mey da cumle wi yaranê dilnar
Hemî pê bûn xudan enwar û esrar

Bi kel hatê zemîra mislê mîna
Di mîna agirê qelbê Emîna

Siyahî da sema dîse buxarê
Kelî qelbê di nêv da narê yarê

Bixûrek daye behra qelbê mesta
Li bîna benderek destane besta

Li çeşman xermenek destan girêda
Dilê her dane sed xermen wî rê da

Li yaran xîme da wî gulşenê raz
Ji mojgan durr û mircan bexşê kir şaz

Dema xwûnabê barî ebrê çavan
Gelek agir kire cerg û hinavan

Hewayê rah ê dîlber mesti baran
Dimû'ê gewherî barî li yaran

Te go,ewrê buharê mahê nîsan
Bi saye hin goher da cem'ê insan

Wekî mader poser ber sîne bit jar
Verêjit dîdeyê xwîn,hêstirê nar

Dur û lûlû ji mircanan verêtin
Dilê wek tifli jê esrari mêtin

Dehen dane sema herçî sedef bûn
Di behra sîneyê dil pur şeref bûn

Didurce darçî û dur dane wan pir
Di dil da vêketin pir şûleyê sir

Vexwarin her ji wê ebrê dibarî
Meya der qelbê wan durr û mirarî

Derê genca dur û gewher xuya bû
Burûsk û berq û nûra narî rabû

Ewî ewrê ku jê eltaf û sur hat
Xeraman abê merwarîd û dur hat

Li ser wê gulsitanê rêhtî jale
Mûşe'şe' kir di hev durrê meqale

Me go, tenzîmê kim van durrê pur pak
Ji genca qelbê Derwêşê 'etirnak

Bi tayê hikmetê ve 'iqde ke xweş
Ji bo yaran bi hev xim bê xil û xeş

Beyan kim wê qejala pîs i bêwa
Ji bêçare dizî penîrî çawa

Welê tacê şehan qafî li ser da
Emir ferman kir û dîse xeberda

Ji behsa remz û razên dîlbera nûr
Hinik esrar û me'nayên di pir hûr

Bi şifre 'işwe û şîwe rijandin
Ji wê yara dil û sîne helandin

Ji zora emrê eynê bexşî kir xwûn
Dilê "sin"ê kire sê felqe mehzûn

Dilê "kaf"a xedengê kir kemanî
Li sînê kir wekî bendê keyanî

Ji rasti gerdena xwe xwari kir "ra"
Heman "y"ayê kuleh avête ber pa

Ji ber sergermîya camê û şewqa
Hebîba nazik û nûrîni zewqa

Çi bêjit Eskerî jê ger nebêje
Ji vê sewdê berê jê dehş û gêj e

Ji cilwe w 'işweyên şehbazê dilkêş
Hinik durr û goher dîse kirin pêş

Ewî Derwêşê mecnûn ê xwedîsûz
Kete behs û beyana Leylê wek rûz

Şerabek telxiweş xwar û şeker rêt
Hevalan dîse jê esrar û sur mêt

Rumanê le'lê minqar ê goherrîz
Dilawîze kirin morxê dilawîz

Kemerbeste kirin zulfê kemendî
Heman perwane sotin şewqê rindî

Kelamê lûlû yê ku şemsê rakir
Geh anî wî qemer vêra cila kir

Gehî anî hîlal û pîremehtab
Geh da burca Kevan sîmayê sîmab

Gehî şîrê rumûz û tîrê xemze
Gehî ahûsîfet geh şêrê şerze

Xedengê nar ê nûnaw sirrê sadî
Dida cerg û gehî wesla muradî

Ji ber wan awurê çeşm ê di mexmûr
Di çavê ahûyê de qet nema nûr

Ku nergisçeşmê der nergis eser kir
Reva xwûna dil û rû bû zû zer kir

Ku lêvê le'l ê mey da le'li da der
Dihatin reqs û bazî sunbulê ter

Rihan û laleyên wê morxîzarê
Çi mehcûb in li ber werda nîgarê

Li ber werdê rû û reyhanîyê mul
Bi reqqasî dianîn sosin û gul

Ji ewsafê gulê sîma perîçîn
Digo,sîbê goher lê bit berê "s"în

Gehî enfê "elîf" û posteyê leb
Fener da morxîzar û hucreya şeb

Mûnewwer kir dema şeb şewqêa dindan
Wekî perwane yaranê di zîndan

Li dor wê nûr û şewqê hatine tev
Yekayek ferqi nabin hatine hev

Wesif kir gerdenê mişkîn xezalan
Dil û dîn û ruh û can bir bi talan

Lebê le'lî cîla da tacê le'lî
Bi der ket meyweyê şêrîn ji te'lî

Ji lewhê sîm û pûstananê sîmîn
Digo, hem tacê le'lê narê narîn

Wekî yek efsûrê yaqût î ehmer
Bidî ser goga sîm û mermerê ter

Digo,ew qubbeyên sehra yê sedrê
Ku alem jê dibin hey têne debrê

Digo,genc in kohenşeyban dikin genc
Bi şehmarê xwe ew şaban dixin penc

'Etirnak in ewan marê xurabî
Kemenda gerdenê narê şebabî

Li pûstanan xelek bestîne maran
Li etrafê gula ne şewkê xaran

Ji wan tê çeşmeyên ava heyatê
Zuwa dêrane deryayê mematê

Kesê zehra ewan maran hilînit
Fenayî dê biçit baqî dimînit

Bi van geh şûle da yarê di bostan
Hemî bû nar di bostan mestê pûstan

Serû anî xiramê ba du sed naz
Te'ala bosîtan bû bi wê tataz

Xemîde serw û yasemn û sipîdar
Digo 'ebd in bite azad û bê bar

Elîfgo pur goher dane hevalan
Welê tevde durê gerdenşemalan

Verêtin asîmanê rûh ê cisma
Meh û xûrşîd û necm û hukmê isma

Semaê dil mûzeyyen kir bi necman
Ku şeytanê le'in pê bête recma

Ku esmanê dil ê wan hate tezyîn
Reqîban sed ji bo wan bûye te'yîn

Û dîn cayê beqayê ta lîqayê
Nebînin tê de qet mewt û fenayê

Ji tarê narê dil nexme kişandin
Gul û bulbul li xwe wan heyyirandin

Qedehbûs û bi şahî mey vexwarin
Bi şahî keyf û şahî pev biwarin

Bi mestî şûleyê şahî xuya bû
'Elem ta 'erşê e'la jê liba bû

Bide saqî di vê bezmê du fincan
Binoşim da mûnewwer kit dil û can

Jixwe serxweşi kirme suhbeta wan
Gelek pir noşî kir dil nisbeta wan

Dixwazim fezl û ihsanek ziyade
Bikî,xalî nekî fincan û bade

Ji tesîra meyê pir hal û şan bin
Ji nûra dilberê pertewfeşan bin

Bi sermestî beyan kim qisseta pêş
Ji bo wan,ka çi go wî pakê Derwêş

Ji derwêşan re Derwêşê kohensal
Hikayet kir ji neqşê nameyê hal

Bi vî rengî xeber da sem'ê yaran
Çi narek da dilê sahibsitaran

Ku lê da teblê goş ê şem'ê dûr şem'
Çi awaz û surik jê hat dilê cem'

Di nêva mecmerê wan qelbê pir nar
Bixûr û 'udê 'eksa gîsûyê yar

Di narê durce yê qelb û dilê wan
Wuha sûzende kir ta koyê bircan

Ji tesîra buxara wê bixûrê
Ji çînê zulf û neqşê rûbinûrê

Zuhûr kir zehreyê zehre dilê wan
Ji dîde şewqê zuhre da gulê wan

Gula fikri ji bo wan bulbula da
Gerîban pare kir kamê dila da

Ji genca qelbê Derwêş ê tijî dur
Xudanşûle bûyi ev durrê pur sur

Ji bo yaran ê sadiq re wuha go
Ji ehwalê yetîmê bênewa go:

Ewî morxê ne ca yû aşîyane
Serî der pence bû dildamê dane

Cenahê teyr ê pejmorde li ser pa
Bi zikrê,ya rebî ya reb,dibû şa

Di hîna ku ne serjê ra ne pa bû
Ji can bêzar û ne mesken ne ca bû

Di wî halî de bû ez çûme balê
Me ser mizda fereh da qelb û balê

Me paqij kir ji çavan hêstirê xwûn
Penîr û nani dayê geş kire gûn

Ji mecbûrî ji nik wî min qîyam kir
Welê dil wî yetîmê bê meram bir

Li rê mişyam û lê dil ma li cem wî
Gelek agir bera dayê ji xem wî

Du-sê gavan diçûm pêşde bi şûnde
Dilê min ma di wê deryaya xwîn de

Hişê min ma li ser wî bêkesê jar
Ku nîne jê re qet efxanres û yar

Di wî halê perîşan da şev û rûz
Dixut xwûna dilê purhesret û sûz

Ne da û bab e jê re qet ne puştek
Kesek nîne li dev kit avê muştek

Ku aya dê çewa bit ev perîşan
Wuha min hişt û çûm ew dil bi êşan

Diçûm û her dikir min lê nezer pur
Diket qelbê me jê dax û keser pur

Ku dûr keftim ji wî cayi ne pir dûr
Ji wî derdî li min bû cerg û dil hûr

Di wê navê me dî yek qijika pîs
Li ser yek darê wa ye girtîye lîs

Heman ew fasiqa pak a nepaqij
Wuha çû hat neseknî kir qijaqij

Mi dî firda û çû dara yetîmi
Li wê der jî çû û hate mûqîmî

Qijika fasiqa pisteb' î ebleq
Fîraz û geh nişîbe ba teq û req

Peyapey her dinêre jêrê darê
Li hevdu geh dixe çengê firarê

Te dî, dûvê xwe rakir geh perê xwe
Gehi nêri yû geh gorand berê xwe

Weki ku ew li tişkî bîte aşiq
Diçî tê ta ku ew pê bîte lahiq

Meger dîbû penîrê taze û ter
Li cem wî bêkesê bêpa û bêser

Heraret girtibû 'ekkû gelek pur
Ji derdê wî penîrê şubhetê dur

Ji lew nayête qet sebr û qerarê
Geh bala fir dide geh têtê xwarê

Yetîmê diltijî pur hesret û derd
Ji girye w zarîyan bûye wekî erd

Niyet kir ku bişo dest û ser û çav
Ku belki hinki hênik be dil û nav

Ku puşta xwe ewî da nan û penir
Ser û çavê xwe wî şûşti wuha têr

Qijalê firseta xwe dît û çapik
Revandî ew penîrê nîk ê lawik

Ku xafil ma ji penîrê xwe wek kor
'Ekû jê bir firî çû dareke dûr

Ji teb'ê vê cîhanê ye neyarî
Bikit mizawirî yû hem neyarî

Ji xulqê vê denî dunya ye tev xelq
Belakêş û perîşan in çîgerşeq

Wekî 'ekku hinik duzdê di pîs in
Hinik jî mislê rovî pur xebîs in

Ku "Larahete fiddunya" 'eyan e
Hebîbê heq xeber daye bizane

Ku 'ekkû bir penîri ew maye naçar
Me dî dîse ku degrî ew dilefkar

Gelek egir kete cerg û hinav im
Ji dîde hate xwarê xwûnê nav im

Ji wî îşê mi dî dil bû wekî nar
Evî narî me geş kir nale û zar

Te'eccub min ji vî halî gelek kir
Di hukmê heq de min pur kir tefekkur

Ku ya Rebbi me anceq hikmetê te
Tu zanî em nizanin destxetê te

Hekîmê ferd î,danayê qedîr î
Semî'ê rahim î,rebbê besîr î

Xwedayê alem î,rezzaqê alem
Eger keyfê bidî ger şîn û matem

Çira ev awuha ye,kes nikare
Bibêje nabe ev,ev jî li kar e?

Hemî emrê te ne zahir nihanî
Tu cêtir îşê mexlûqê xwe zanî

Ji tedbîra te zinde cumle hestî
Ji teqdîra te dest û pa ye bestî

Ten û dil mayeyê tedbîr û teqdîr
Welê tîrê qeder çû sedrê tedbîr

Nezer ke Eskerî diqqet ke pur pak
Çira halê xwe nakî hîçi îdrak?

Di xeflet da diborînî şeb û rûz
Di dil de nabe safî de'we û doz

Qe nabînî kesê xafil be her dem
Perîşan e peşîman e di alem

Çiqasa afetê dunya û 'uqba
Dibin peyda û tên coşê wekî ba

Di exleb xeflet e esbabê zahir
Fena bî jî eger der av û agir

Wekî xeflet çira hinde bela tê
Perîşan bûne pir şeyx û mela tê

Binêre Eskerî xafil mebe tu
Tu menşîn xafil û cahil mebe tu

Derêxe penbeyê goş ê dilê zar
Bi dil guhdari be der yar û exyar

Heta karî bike xîret şîyar be
Di her bezmê bi dil godarê yar be

Bi terzê tête yolê raheke qenc
Ji bo xwe bigre pa paşê nexwi renc

Wegerne dê bibî mislê kerê nêr
Welew alem eger bêjin bûye şêr

Di guh ke vî muress' zerguharî
Li dunya w axretê nabînî xwarî

Dema xafil dibin rebbê me hişyar
Bike hem lutf û îhsanê di her kar

Jixwe em xafil û kor in di her dem
Diborînin di xeflet gêj û sersem

# BENDA DEHA

## SITENDINA ROVÎ PENÎR JI QIJALÊ

Xuya be saqîya dil ma perîşan
Di şêva firqetê rencûr û êşan

Ji genca pîrê rindan cameke dur
Lebaleb ke ji xom dil tijî sur

Bide da noşî kim ummîdiwar im
Nemaye pur şeva hîcranê yar im

Kemala xwe dîye leyla firaqê
Nemînit zêde dil der îştîyaqê

Bi derbê 'enqerîb şemsa wîsalê
Ku heyran bin ji ber şewq û cemalê

Ku şem'a wesletê bê der wuha nêz
Ji wê feyzê ku bigrin quwwet û hêz

Bide saqî umîda min zîyade
Ji dîlber ev heye ~ hin camê sade

Hilînit kakul û zulfê wekî şev
Hilavêje ji rû rake hemî tev

Wekî şem'a mûşe'şe' derkeve der
Ji nav wê perdeya şev ew dilawer

Ku rewşen bit me pê çav û dil û can
Mûnewwer bim,mûferreh bim bi qurban

Bi ummîd û rica ye daîma dil
Xuya be zûditir ew yara kamil

Terehhum kit ji taristanê hîcran
Bi der xit ronîyê qelbê tijî jan

Seher nêz e sebûhî de tu camê
Nesîmê zulfê yarê tê me şamê

Ji şama firqetê der bin temamî
Biborînin demek der xweşmeramî

Gelek îş û ezîyyet min çeşîd e
Ji zora dîlberê nûra du dîde

Di kuncê vê sîyehrûwwa fîraqê
Dixwum xwûna dili der îhtîraqê

Bide saqî meya mislê gulavê
Xunava wechê dîlber têxe navê

Ji wê bihnê bibim sukran û serxweş
Bi dil ku bihni kim ez wê gula geş

Nîgara şehsuwar a qareqaşî
Sehîserwa gelekrind û 'eyaşî

Xumara qelbê polad a bi heybet
Li min muşkul gerandî der di fîrqet

Qe nayêtin xîyalê,yarê dişwar
Nizanim wê çewa bî dawiya kar?

Ger Ellahî seversin mey ile gel
Bana ver de olur her muşkulum hel

Bide da sehlî bit ev êş û derd im
Ku îşê vê denî dewrê bi der dim

Ji tesîra evan pertawê der cam
Defî' kim cumle ekdarê dilê xam

Şeraba wechê ehsen bîne îhsan
Bibînim ehsen-ul wechê bi nîşan

Çi şan û ev çi nîşan in şeb û rûz
Di wan têne zuhûrê remzê dilsûz?

Temamê alemê jê qelbi kun-kun
Ji ferman û ji emrê gotîye KUN

Çi rûbah û qijal e ev çi îş in?
Çi ruh in der qefes ba derd û êş in?

Serasîme di vê leyl û neharê
Cîgerdax im ji hicrana nîgarê

Cuda mame ji mehbûba Semerqend
Şepal û şox û şenga dîlber û rend

Bide bîne xiyalê halê borî
Teemmul kim wîsala yara nûrî

Werîne saqîyê esrarê dîlber
Hinek qarûre muhir miskê ber ser

Binoşin çendi caman pê bibin şad
Wegerne bûne em berbatê ber bad

Meya safî bide bê xill û bê xeş
Ku da tenwîri ke qelb û dilê reş

Hucûm e eskerê derd ê cîhanê
Bi sed rengi li dil hatin emanê

Were rehmê bide camê bigir dest
Temamî min bike medhûş û sirmest

Bi der xe min ji vê behra hemî xwûn
Şev û rojan civandîme wekî nûn

Tenê mame ne min yar û ne mûnis
Di deryayê xeman da şubhê Yûnis

Gelo zanî min ê pir hicrê dîde
Çi dîtî wer temaşa ke du dîde?

Bike şefqe li ser vî bêkesê jar
Di vî halî nehêle zar û naçar

Mûheyya ke hinik camê kohensal
Ji wê meyxaneya pîran a purhal

Mûselsel her bide vî bendeyê pîr
Ji xem azadi ke şabê bi dilpîr

Şeva tarî di deryaya fîraqê
Çi ezyetha dixwum wer îttîfaqê

Peyapey her bide vî mûnisî ruh
Ji vê behra xeman der xe wekî Nûh

Hela derdê reqîban daye ser derd
Helandin qelb û dil yekcarî bûn erd

Nizanim em biçin kê der ji dest van
Hebîsanê xebîsanê çu şeytan

Çirandin dil li me bûne wekî qurd
Hela saqî bide çend cur'e û qurt

Bide qet'a meke qet'ê heta ez
Bibêjim kafî ye her lê bike lez

Jixwe ez jî qe nabêjim bese cam
Çira zêde zeîf im mame bêqam

Ji destê van reqîbê bê muruwwet
Dixwum her daîma pur zor û zehmet

Li kîjan nuqte û erdê dinê bin
Ji destê wan dibin em bêser û bin

Li kê der aşiqê miskîn hebîtin
Mukedder her ji destê wan dibîtin

Hesûd û reşdil in dilpirbikîn in
Ji ber wan aşiqê bêdil hezîn in

Ku aşiq da negîjin tu mûradê
Dikin roj û şevan her ew fesadê

Ji ber zulma evan dunyahebînan
Qe rahet nabine mislê yetîman

Nîzanim em çi bêjin derdê her dem
Li dil xem pir girêda şîn û matem

Wuha zêde li ser xem,xem bi loqat
Dibarin têne dil qatek li ser qat

Ji destê van reqîbanê di bê dîn
Fesadê pur husûd ê dil tijî kîn

Ne rastî hem ne xwarî tê li wan xweş
Bi vî halî Xweda ew kirne rûreş

Xwe zû bighîne min saqî meded ke
Peyapey camê mey de,bê 'eded ke

Ji tîra firqetê mordedil im ez
Ji vî zêde bi derd û mişkul im ez

Eger barîhebîn î her bide mey
Ji bo qelb û dilê morde bikit hey

Bi yekcarî ji dest çû me hewar e
Meded pîrê moxan ê bordibar e

Ji wê meyxaneya pur zewq û suhbet
Ji wê daruşşîfa pur nûr û nisbet

Dewaya qelbê me lutfê ke çend cam
Mirî mane bi saye saxî ke tam

Evî rûbahê purmekr ê cihanê
Evî casûsê huqqebaz ê hanê

Ji pencê 'ekkûwa nefsî revandî
Penîrê dîlbera dil ew hebandî

Di vê rahê diraz û dûredestî
Wuha bêçare hiştin dilşikestî

Me dil pur derd û xem tê da hene kul
Çi bêjim nayê gotin hale muşkul

Ji bo me bêkesan rehmê nekî tu
Heye ma kes ji bo me,ew bide rû?

Nekit lutf û kerem ew nête rehmet
Ez'anim kes ji bo me nake şefqet

Bide saqî hela hin camê dilşad
Umîd û hêvîya min şahê şehzad

Ji rûwwê fezl û qencî seyyîatan
Bikit mehw û bide pur ehsenatan

Nexapînit me ew rûbeh be tekrar
Bike îhsan peyapey camê her car

Şerabek safa yaqûtî kerem ke
Dilê pur derd û xem bêderd û xem ke

Ewan yaqûtê leb qûtê dilê jar
Ji elmas û ji yaqûtê birin kar

Tesewwur kim tesellî pê bibim xweş
Rehet bim da ji vê dunya derî şeş

Ji mekrê su'leban carek riha bim
Ji pennîrê hebîbê têr û şa bim

Bide saqî bibêjin rûbehê pîr
Çewa xapand qijik jê girtî pennîr

Çi sehharî kir û hîle çi çê kir
Çi efsûn xwend û tezwîratê lê kir

Ji ber kibr û xurûr û xefleta wê
Ji 'ucb û ehmeqî yû qebheta wê

Heta ku jê sitend qûtê heyatê
Ji mefrûrî kete halê mematê

Di benda pêşîyê halê seyahan
Di nêva werd û reyhan û tufahan

Me hin kirbû beyan anî mezadê
Durê Derwêşê dil her der cîhadê

Di nav wî bexçeyê cennetmîsalî
Ji ber wan bulbul û qumrî dinalî

Ketin payê 'ekû ahen kelepçe
Hinavê rovîyan bû perçe perçe

Rijand altûn tebeq zerrîn kulîçe
Dilê bexçe vebû tê de derîçe

Cîger perçe gul û dem beste xunçe
Kirin dest beste pir şêr û erçe

Bi fulful hat ji ber wan teyrê bexçe
Ji bulbul bigre ta tawûs û serçe

Digo Derwêşî geh wî qisseta xwe
Hevalan jê digirtin nisbeta xwe

Gehî ser dewrê camê ew hîkaye
Dida ber hikmetê,ma lanîhaye

Heta ku xayetek jê der bixista
Bi genca wan dila pur dur bixista

Hezaran kanîyê ava heyatê
Di qelbê baxê de anîn xebatê

Heta xeyta sipî wek cebheyê yar
Xuya bû j'xeytê reş zulfê wekî mar

Ji derdê dûrîyê şev ma cîgerxwûn
Bi rê ket çû wuha bêmad e mehzûn

Wusa pejmorde û bê gûn bi rê ket
Te go,agir ji derdan wa ye pê ket

Xwe reş pêça hezîn û matemî çû
Remîde ba girîn û pir xemî çû

Şefeq mislê hebîbê kir teqeddum
Selam da aşiqan kirye teqeddum

Cemala Leylê derkeft û sela da
Dil û canê 'uşaqan pê cila da

Cîhan bû şubhê cennet wê dema yar
Tebessum kir li rû wan aşiqê zar

Gelek quwwet dida wan wê selamê
Bi şewqek zêde dewrek dane camê

Gelek dewranê kir xwûna dilê wan
Mûnewwer bû zîyade aqilê wan

Ji pertawê diran ê wek durê pak
Mûşe'şe' kir ewê bezma 'etirnak

Ji nik dîlber dema bayê Nesîm hat
Beşaret daye wan yarê kerîm hat

Ji mizgîna qudûmê yara xûrşîd
Ji keyfa wan kirin bezma xwe tecdîd

Dilê kûpê mezin hate xuroşê
Kelî fewranê kir pur hate coşê

Lebaleb kirin jê cam û surahî
Vexwarin,zêde kirne keyf û şahî

Geh zikir çehrî yû xîzarî ye wan
Geh perwanesîfet bêzarî ye wan

Gehî dil neqşê zikrê neqşîya bûn
Geh ew neqşê dilê wan wehşîya bûn

Vexwarin pur meya esrari wek dur
Vebû dergahê me'rîfet li wan pur

Fenafîllah beqabîllah di ew dem
Ji bo wan bû mûyesser mest û sersem

Hemî dar û nebat û teyr û heywan
Çi koh û wadî yû nehr û çi însan

Bi hev xistin bi zemzem xulxul û deng
Ji mizgîna hebîba nazik û şeng

Te go, qey rabûye heşr û qîyamet
Ji nû ve saxi bûne cism û qamet

Dibêjî,cennet e ew weqtê dilgeş
Ne tav û sa ye sade nûreke geş

'Ecaîb qudret e tête şuhûdê
Ku Rebbê heq seher tînit wucûdê

Evana şahid in çawaye cennet
Dikin îsbatê hem bona qîyamet

Numûne zahir e gotin çi lazim?
Bîlaşek ev xeber nik merdê alim

Di wî halî ewan Derwêşê dilnûr
Gehî hişyar û mest û gahî mexmûr

Dikin ew întîzara şemsê alî
Ewî sîmayê nûrîn ê celalî

Mûzeyyen kir xwe têkde şubhê tawûs
Li ser danî keyanî taca Kawûs

Selayê ateşefşanî elem da
Nîqaba zulmetê tevde edem da

Bi der ket ew ji burcê ba 'iz û naz
Mûzeyyen kir sema û şîb û efraz

Ji nûra wechê şemsê cumle eşya
Heyatek taze girtin bûne ihya

Diîsan şebnemê taze gelek pur
Li ser wechê gulan her şubhetê dur

Mûnewwer bûne jê Derwêşî zêde
Û hem dilxweş bûyîn pê cumle pêde

Gelek îhsan û îkramê di nûrîn
Ji feyz û şewqa şemsa wan hilanîn

Ewî Derwêşê sahibdil bi tekrar
Ji bo yaran hîkaye kirye iş'ar

Du le'lê pur şeker şekker verêtin
Hevalan jê gelek esrari mêtin

Guşa kir xunçeya yaqûtî der qal
Gelek pê qedrî bûn yaqûtî derhal

Şûa'a seffê dindan bû mûşe'şe'
Ku rakir le'lê leb teşbîhê berqe'

Derê le'lî ku rabû xizneya dur
Xuyabû jê rijandin durrê pir sur

Midadê huqqe yê yaqûti bê renc
Tijî kir milkê elmasan wekî genc

Çi xweş hatin temaşayê te'ala
Evan yaqût û lûlûyê di e'la

Wehe go wî ji bo yaran serencam:
Çi xweş tenzîmê kir ev Iqdê Durfam!

Ji wî bêcareyî ku qijika pîs
Penîr dizzî xebîsa pîs î telbîs

Yetîm ma dilperîşan û cîgerxwûn
'Ekû jî bir penîrê şubhetê rûn

Ji dûr ve ku dinêrim vê 'ecêbê
Ji vî derdî qe dil nayê şekîbê

Di vê fikr û xemê da bûm ji nagah
Diçî-têtin mi dî ew pîrê rûbah

Gee pozê xwe dixit erdê diçîtin
Disekne gahi godarî dikîtin

Welê carna dinêre çar-i etraf
Meraqa wî bibînit qûtekî zaf

Çu an pir mekrê heyyal î hunerwer
Temaşa kir bi çeşmê sihrê awer

Û dî darek bilenda şubhê 'er'er
Wekî serwasehê bê fêkî yû ber

Welêkin ser çiqê bala yê serkeş
Veniştî 'ekkuwek mirdara wek leş

'Eceb darek bilind e ser li esman
Qijik wa ye li ser teşbîhê şeytan

Xebîs-ul menzerek der jora darê
Kerîhussewt e wek sewta hîmarê

Ji reng û cîlweeş alem nufûr e
Edayeş ez tebî'et dûr e dûr e

Ji sewtê 'eq'eqeş ruh der 'ezab e
Ji cîwey nabecayeş dil xerab e

Bi şeq şeq kelbetanê canê aşiq
Bi 'eq 'eq rehberê heywanê fasiq

Ji kibr û xûlîya û 'icb û şehwet
Serê fasiq pur e ez hiqd û şeqşeq

Ger û fetle li ser her şaxê darê
Ji 'ecbê nake der şaxek qerarê

Nîhayet rûbeh çû dara 'ekû lê
Li bin darê qe nasekne diçe-tê

Ewî Derwêşê seyyah ê suxendan
Digo:Gava mi dî ew cîlweyê wan

Temamî hîretê girtim seraser
Mi zanî tê heye sir halê pur ser

Xuyabin dê niha pur hikmetê Heq
Di vî îşê mi dî bê şubhe mutleq

Xweda der alema esbabê fanî
Wuha teqdîrê kir zahir-nihanî

Nebîtin qet'a bê sebeb tu karek
Sebeb lazim û gerne nabe carek

Heçî muhtacê rizq e lew mudamî
Ji bo qûtê xwe ew dikne xulamî

Dikin se'yê ji bo rizqê xwe her kes
Ji Adem bigre ta En'am û Gerges

Hinik kesba helal û hin heram e
Hinik mizzawirî hin faq û dam e

Bi diqqet ku nerî rovî li darê
Wekî yarê nezer de rûyê yarê

Di dev 'ekkû de dî pennîrê taze
Wekî berfa çîya yê Elcewaz e

Gelek nerm û nefîs û saf û berraq
Dekêşit muştehayî cumle muştaq

Çu su'leb dîtî ev pennîrê taze
Hemandem rengê rûbeh bûye xaze

Çu în şebkerdê seyyar ê subukger
Bi çav dî ew penîrê taze û ter

Ji şehwet hilbû der me'de heraret
Buxarê da dîmax û kirye xaret

Nema wî ne hiş û ne 'eql û tedbîr
Vemaye der teheyyur rûbehê pîr

We lê ez arezûwwê îştîhayê
Qerar û sebr û sekn û cayi nayê

Bi dev 'ekkû ku dî penîrî,rovî
Ji sewda hiş nema,bû mislê kovî

Serasîme ji ber pennîrê pur xweş
Wekî dînan nema lê taqet û heş

Xwe wenda kir go:"Aya ev çi hal e?
Gelo xewn e dibînim,yan xiyal e?"

Li ber perçê şekalan qenci pennîr
Li ber çavê wî îsa şubhetê şîr

Ji destê dûr ê pennîrê xurabê
Hinavê rûbeh hatin ber kebabê

Ji ber dûr e,ji dûrî pur hezîn e
Umîda xwarinê,ken pê re tîne

Xwe rakêşa ji hev geh kir du-sê qat
Gelek girrêz û devşotik ji dev hat

Guhê xwe mîç kir û çavê xwe zûzand
Xwe danî rabû û dîse xwe telland

Ditellîne xwe,dev datîne ser penc
Bi sûskî xwe dibe tîne neyî qenc

Ji keyfa re wuha avek bi dev ket
Ji hesret agirek der dil bi hev ket

Gelek tev çû û hat sist bûye dawî
Kenandî ewdera wî pîsî lawî

Ji keyfan re geh pence datîne ser
Ji kerban gahî dûvi radikit şer

Serapa gij dike mû mislê şûjin
Ji nefsa geh ji tirsa tête sûjin

Ji nefsa re dikûze lêki hêdî
Geh hêdî çewkeçewk e,çare nêdî

Ji bêsebrî nema lê fenn û tedbîr
Ku hingî lê eser kir zewqa penîr

Gelek hawê wuha ew derdixe der
Ji kerba wî penîrê taze û ter

Ji tirsa,te didî bû şeqşeqa dev
Ji meyûsî dirana geh dixe hev

Wusan carna diqirçîne bi hiddet
Dibêjî,çîkê agir jê bi der ket

Gehî rast û we gahî çep diqelbe
Hezaran narê dûrî wî di qelb e

Te dî,car dî ji nişka ve xwe qîç kir
Kire fişkîn û guh dîse wî miç kir

Dibir-tanî ewî pozî ne bîçim
Soylerken behsini bulanir îçim

Ku goya bihn dike pennîrê xweşreng
Bi wê bihnê mûferreh ke dilê teng

Gehî tek tek û gahî herdu destan
Li erdê ew dide teşbîhê mestan

Te dî, carna esas wez'îyyetek da
Ku yanî tût bû û dûvê xwe berda

Û cerna dev te dî avête kêça
Çû û hat û xwe kir kullor û pêça

Ji bêsebrî te dî dûvê xwe berda
Gehî te'ma dihen xweş kir li hev da

Du-sê tevzî kişand û çendi bawîşk
Ji hesret lê dibûn damar û xwûnişk

Ku elhasil evî rûbahê purfen
Yapar o işlerî,gel gulmîyem ben

Di hîret de gelek ma rûbehê pîr
Ne tedbîr û ne te'bîr û ne tezwîr

Meraqa wî li ser pennîrê qaşar
Dil û sîne me'idde girtibûn nar

Zemanek ma wusa meyûs û mehzûn
Nema wî taqet û ne reng û ne xwûn

Çikû xayet bilind e nexlê basiq
Li bala danîye 'ekkûya fasiq

Ne mumkin ku here ser dara pir gaz
Û ger çû,'ekkûyê dê bîte perwaz

Bi vî terzî muhal e wesla meqsûd
Dibit lê ev penîrê taze mefqûd

Eger çi kefte ye'sê ew mûşewweş
Welêkin îştîha lê bûye serkeş

Ji fertê îştîha ew pîrê fanî
Mûsellem ev xeber lê bû 'eyanî:

Negîje ger penîrê dev qijalik
Mûheqqeq dê bibîtin rûbeh halik

Bi hal Derwêşi her godarîya wê
Li girgîn mestî yû bîdarîya wê

Bi nûranî dilê 'eyna 'ulûman
Bi goşê cazib ê her dengê mûman

Bi çeşmê qelbê pak î wek tilisqop
Bi hûşê hûrê bînî wek miqisqop

Dikir ba dîqqetek nûranîyê dil
Li rovî yû penîrê jê re bû kul

Te'eccub jê dihate pîrê dana
Neçû,seknî temaşa kir li vana

Ji wan hin halê dî jî,fehim kîtin
Hela çawa dikin paşê biçîtin!

Dibînit sihr û fennê rûbehê pîr
Li 'ekkû çêdikîtin behra pennîr

Wuha ew her temaşayî li vana
Dikîtin,ba dil û hûşî ji cana

Di vî işî de rûbeh ma perîşan
Dibawuşkî û dil pir derd û êşan

Reîsê hîlebazê mekr î perwer
Şehîrê huqqebaz ê çehre goster

Wuha ma muddetek der dehş û hîret
Heraret girtibû sîne ji xîret

Serî pur fen diket ber ez tehessur
Gelek xewte dida behra tedebbur

Ku:"Aya çareya derd im çi bîtin
Nebit ger çare canê min diçîtin"

Gelek jê ketne qelbê rûbeh kurb e
Li ber wenda bûyîn tcv rê ù durb e

Li xwe kirne 'itab û lewmê dijwar
Didan rû xwe hezaran gotinên sar:

Kî:"Ey beyhûdekirdê pîr ê ferqût
Du-sê roj e tu mayî bêxwir û qût

Heta kengê di dev 'ekkû bimîne
Evî pennîrê wek donbeh-semîne?

Bizan ey ehqerê rûbah ê fennek
Ji pîrî te texerruf kirye bêşek

Nikarî ger biçî balayê darê
Çi mehzûr e ku cibnê bînî xwarê?

Ku da çûn sihrê her wek sihrê Babîl?
Li kû man fennê her wek semmê qatil?

Hebûn te sedhezaan sihr û efsûn
Ji her yek re mûsexxer fîlê mecnûn

Nuha bêhîle û tedbîrî mayî
Ji 'iczê bêfen û tezwîrî mayî

Xenîmet hatîye ber der bi qîmet
Xebînet nîne der di ev xenîmet?"

Ji pes lewm û 'itaban rûbehê pîr
Ku pê nefsa xwe kir tewbîx û tehqîr

Nema der destê rûbeh qet wesîle
Ji nû rahişti kîzb û mekr û hîle

Cihandîde kohensalê funûnco
Mûheyyil su'lebê pîr î fusûngo

Wuha bo xwe digo:"Ey kêmîdaniş
Çira mayî tu hinde xebl û bêhiş?

Tu rabe ey neçarê keste beste
Ji birçîna te dest û pê şikeste

Bi wechê fennê tedbîrek bibîne
Ji babê sihrê tesxîrek bixwîne

Çira nakî du-sê sihrê muessir
Tu ey heyyalê bedmekrê muzewwir?

Derîne tilismê mekr ê huweyda
Qijalê pê bike mecnûn û şeyda

Bixwîne bo qijakê celcelûtê
Ku jê bistînî cumle zexr û qûtê

Kemendê fenn û tezwîratê bavê!
Penîrê 'ekkûwê bîne di navê.

Vede damê funûn û sihra salik
Di wê davê bigir seyda qijalik

Wuha muhkem ke ev damê veşarî
Zebûn bin tê de sed şêrê şîgarî"

Ji paş ev gotin û tedbîrê mehkem
Wuha neş-e dihate rûbeh der dem:

Ji cî rabû û mûyê xwe pejandin
Hunerhayê xwe cumle wa numandin:

Xwe pejkand û li xwe kurkê xwe çêkir
Welê hîle hezaran bari tê kir

'Ecayib fikrê rûbeh tên xiyalê
Ji kerba wî penîrê dev qijalê

Li hev rakir 'ecûzên hîle der dil
Bera hev dan ji bo vî îşê muşkil

Bi sihran hatine hev qewxe û şer
Di nav wan da gelek çêbû ser û ber

Hinik mexlûb û hin xalib xuya bûn
Ji wan hin mehwi bûn û hin di mabûn

Ji wan pîrê sihirbazê di mekkar
Tenê yek ma li meydan xalibê kar

Gelek bab û gelek feslê di sihran
Gelek fer' û gelek eslê ji mekran

Ji bo rûbeh beyan kirne wesîle
Hela kîjan ji bo rûbeh delîl e

Ji nav cumle sihirbazî nîhayet
Ji bo xwe rûbeh zanî ev selamet:

Bi nifqê ket lîbasê pîrê salik
Bi ahiste meşî nezdê qijalik

Serê pir mekrî rakir sûyê 'ekkû
Vekir bendê zebanê meslîhetcû

Ji ewwel mentiqî nutqek eda kir
Dilê 'ekkû bi wê nutqa xwe şa kir

Sefatê bulbulan yek yek bijarin
Li ser 'ekkû gerand û wî jimarin

Bi sed şîwe eda û lefzê dilco
Di ewwel qalê bo 'ekkû wiha go:

-Ela ey bulbulê xweşxwan ê xweşdeng
Hela ey tawusê xweşbîn û xweşreng

-Bi nexme işqîbexşê sed hezaran
Bi işqê serwerê cem'a hezaran

-Bi sewtê xweşeda şeyxê belabil
Bi nexme ehsenu'ssewtê 'enadil

-Ji sîstê şi'rê mewzûnet di afaq
Diket ateş di canê cumle muştaq

-Ji weqta min bihîstî nezm û eş'ar
Heraret girte canê 'aşiq ê jar

-Nema sebr û sukûn der rub'ê meskûn
Serasîme wekî Ferhad û Mecnûn

-Gelek teyyê menazil rahê dişwar
'Eceb qet'ê merahil kirye ev car

-Senaxwanê te ev muştaqê dêrîn
Ji dûr ew hatîye bo şi'rê şêrîn

-Bi rehmet yek nezer ber aşona ke
Ji vê mehcûrîyê carek reha ke

-Xezelhayê 'Iraqî ba Hicazî
Di babê hubbê cûyê işqîbaz î

-Ji Hozzamê bixwîne çend qesîde
Sifahan jê bibêje çend neşîde

-Rihet be qelb û sîne ev dilefkar
Şîfa be canê muştaq ê birîndar

-Xerez der dil ev e,ev derdînaket
Bi goşê xwe bibîze sewta paket

-Eger bimrim fida te îstîxwanim
Bimînim ger,ji bo te medhîxwanim

-Ji 'umrê min çi maye yek remeq heq
Bibîzim ger bi guh nezma bi rewneq

-Mirin heqq e eger ruh bête saqê
Tenê nemrim di bin barê meraqê

-Çira nadî cewabek ez bi heyran
Ji bo vî mubtelayê zar ê heyran?

Çu 'ekkû seh kir ev nezma dilawîz
Şekerrîz ev meqala sihiramîz

Temamî goşî kir,pê bûye mesrûr
Te'eccub jê dihatî bûye mexrûr

Heme mekrê ku rûbeh lê kirin bar
Jidil bawer kir ev mentûq û goftar

Ji vê pur riqqetek hate qijakê
Bi diqqet wê nezer da rûyê xakê

Çi dî,şexsek xerîb û bêmecalek
Ne taqet tê de maye,wî ne halek

Du-sê reh ixtixwan û maye tînek
Li wan pêçaye peşmîn positînek

Wekî wan merdomê sedsale abid
Ne xwar û ne vexwarî maye zahid

Bi adabên 'eceb ew der tewadu'
Heqîr û ba edeb mehzûn û xadu'

Guşad e goşe ew der întîzarê
Cewabek ta bibêje ew ji darê

Çu ev reng û eda dîtin qijalik
Vebû dil wê ji bo rûbahê salik

Bi diqqet wê sualek kir ji rûbeh
Ewî heyyalê bedfê'l ê mûnebbeh:

Kî:-Ey pîrê zeîf î salîxorde
Feqîrê bêmecal ê nîmîmorde

-Çi nas î ey sefîlê jar î naçar?
Çi şexs î hinde qor û sêfîl û jar?

-Dibînim merdomek xayet edîb î
Welêkin xayet-ul xaye xerîb î!

-Di vê sergeşgî yû reh nowerdê
Di çi fikrî,bi çi efkar û derd î?

Cewabek lê veda wî hîlebazî
Bi sed cîlwe numa yê mekrisazî:

-Ne,pêşîn 'erzi kir bo şeyxê bulbul
Vî miskînê neçar î xeste dilkul

-Ku şewqa şi'rê ateşbar û goftar
Ji dûr anîme bin darê dilefkar

-Egerçî min ji muştaq û ûşaqan
Bihîstin şi'rê te şahê 'uşaqan

-Gelek şîranî yû pur zewqê da min
Welêkin vê meraqê şewqê da min

-Ku belkî ez ji dev şeyx-ul 'enalib
Bi goşê xwe bibîzim şi'rê calib

-Heye mumkin bikî sedqa serê xwe
Nekî xayib esîrê ber derê xwe

-Me ummîd e nekî vî pîrî xaib
Bi sedqe çendi şê'r û nezmê saib

-Ku weqtê coşişet der leylê deycûr
Ji 'işqê,te digotin ser gulê cûr

-Bide ber sem'ê kemter ez gedayan
Bibe bo xwe sewab û pur du'ayan

-Rihet be çûn dilê ev pîr ê qincir
Ji bo te dê bikim ed'iyyeyê pir

-Wegerne her di bin barê fîraqê
Fena dê bim ji derdê îhtîraqê

Qijalê çûn nîyazê rûpeh kir gûş
Ji şadî lê nema ne 'eql û ne hûş

Temamê mekrê rûbah ê soxenwer
Li nik xwe wê yeqînen kirye bawer

Di canê 'ekkûyê,wan wer eser kir
Ji îdrakê bi yekser bêxeber kir

Wusan der canê ’ekkû kirye tesîr
Xwe wenda kir xurabê çûye ez bîr

Xwe zanî bulbulek xweşxwan û sadiq
Şêrîngoftarekî bû wer di aşiq

Bi cunbuş hate cezbe ew bi rewneq
Weşandin bal û perrê kurt î ebleq

Heme damarê caneş hate perwaz
Ku nageh ’ekkuya me hate awaz

Bi quwwet bazî kir minqarê şeqreq
Bi şiddet fethi kir ew fekkê ehmeq

Ji coşa işqê şaqînek ’eceb kir
Zeqarîqê wê gûşê rûbeh ker kir

Gelek bê me’ne şeqraq û şeqaşeq
Bi der ket ez dehanî ’eqqê şaheq

Lîsanek wer ku kes jê nake fehmê
Siyaqek wer ku kes jê nabe fehmê

Vekir wê ew dihanê bêhûdegû
Rijandin gotinê bê rê û bê rû

Ji ewwel wê dema kir bazi minqar
Hemandem ew penîrê taze (hat) xwar!

Ewî seyyadê purefsûn ji nageh
Ku dî seyda wî hate ber wî b’ageh

Bi şewqek tamî ez cayê xwe cist ew
Li ser pennîrê çûn donbe nişest ew

Helesta rûbeh ez can şubhetê şêr
Du-sê bûse didan etrafê pennir

Zi pes ba îştîhayek fewqî’ade
Vehona ew penîrê saf û sade

Bi şehwet rûbehê bêtaqet î jar
Qedandî ew penîrê pak î qaşar

Dehen alastî çend caran bi ezman
Şukur kir bo Xudayê 'erş û 'ezman

Çuqa ku şukrê kir rûbeh bi zahir
Digo:"Da min Xuda ev rizqê hazir"

Û lê batin di nefsa wî de şeytan
Xurûr û kibrê çêkir jê re derdan

Xwe dît û fexrê kir fa'il xwe dîtî
Ji lew ket qelbê rovî nar û pêtî

Li wî ni'met dibû 'eynê belayê
Xuda ew kori kir xiste cefayê

Vekeft û pali daye morxizarê
Nezer dûz dîde her da sûyê darê

Ku dî 'ekkû bi kibr û cûş û awaz
Dikir pir nexmeyê nasaz î ba naz

Wusan wê xaqîxaq e,qîjeqîj e
Bi nahemwarî sewtek her dibêje

Ne sekn û ne sukûn e,ne tebat e
Bi vî rengî mudamî der xebat e

Qijaqîj û qişaqiştê fuzûlî
Gelek neqnîq û tewrê bêusûlî

Mudam ba sewt û eswatê himarî
Dirêje tewr û ehwalê veşarî

Sebir kir rûbeh pir der întîzareş
Heta lê xetmi bû neqnîşîsareş

Nîhayet betillî dembeste der dem
Ji neqnîq û şehîq û sewtê pir xem

Pes an geh 'ekkûwa pirkibr û xeyla
Ku lê bû xetmî banga wayê weyla

Bi xeylayî sualek kir ji rêvî
Kî:-Ey pîrê ji min daîm bi hêvî?

-Te dî ev şefqeta min şeyxê bulbul
Wekî dermanê deynî ser dilê kul

-Evê sewta xweş û awazê serkeş
Dikit xweş xesteyê sedsale naxweş

-Ji bona xatirê te îxtîyarî
Bi sed cîlwe bi vê sewta hezarî

-Dixwendin min gelek şi'r û qesayid
Ji bo vî xatirê te pîrê qasid

-Ku da dilxweş bî bo min pur sena kî
Li nav alem evan nezman belakî

-Bizanin da heme meştaqê eş'ar
Ez im serkerdeyê eş'ar û goftar

-Ez im îro reîsê 'endelîban
Serawerdê temamê dilkeîban

-Ez im ku nezm û şi'rê xweş birêje
Ez im ku efseh-ul elfazi bêje

-Gelek îhsan me kir bo te feqîrî
Serasîme cîhanpeyma yê pîrî

-Rehet be qelbê te bo min du'a kî
Herî der cumle alem eşkera kî

-Ji piştî te bihîstin şi'rê pir kûr
Here min da ji bo te îzn û destûr

-'Eceb xweş bûn evan awazê dilbend
Evan nezmê şêrîn ev şehd û ez qend

-Xuya ye pur bi te xweş hatîye xwûş
Ji lew hinde vemayî mest û medhûş

Çû seyyadê bi fen pîrê mudebbir
Ji 'ekkû gotinê dilgîri seh kir

Ku goya xîretek jê hate su'leb
Ji hiddet pir dibû ez payî ta leb

Ji cî rabû berê xwe daye ehmeq
Kî:-Ey mordarê gende zaxa ehmeq!

-Bi vê humqê te der da rizqê hazir
Ne bêfehm î tu,ey mehcûba xasir!

-Nizanî eqbehê ne'ê xurabî
Kerîh-ul munzerê dozdê xurab î?

-Ji sewtê naxûşet min nîne der gûş
Bi min key sewtê naxûşet dibit xûş

-Heyî tu eşne'ê cinsê qiralik
Xurabek fasiq î namet qijalik

-Şeqirdaqê te şubhê sewta şeytan
Gelek jê dilnifûr e cinn û însan

-Çen û minqarê te her şerqîşerq e
Neqîqê te,nehîqê ker çi ferq e?

-Çikû nabûyî bulbul ey belakeş
Bi vî wechê qebîh û sewta naxweş

-Nizanî ma eya bêaqila kem
Ne yî bulbul,qijal î lal û ebkem

-Ji sewta naxûşet,ey naxweşawaz
Gelek xweştir evî pennîrê pir naz

-Penîrê te ji dengê te çi xweştir
Ji rengê te welê bextê te reştir

-Belê xweştir ji ev şeqraq û şeqreq
Evî pennîrî da min raziqê Heq

Digo "Heq da",û lê ba kîbreke pur
Penîr xwar,û 'ekû jî maye bê sur

Zi pes rabû meşî ew pîrê rûbeh
Ji fexr û kibra zêde çûye bê reh

Ji ber ku ket xurûrê rovîyê pîr
Neda ser rah û sape çûye bê pîr

Kire çewkîn û bahûk û çivan çû
'Ecaîb ma li xwe ta bêşivan çû

'Ekû dî rûbeh çû pennîrî tev xwar
Û hem dane rûwa pir gotinê sar

Dizanî rûber ew kir dam û faqê
Bi van sihr û xeberdanê nîfaqê

Bi sermayê berê 'ekkû penîr da
Ji bazara xwe wê dil dax û kêr da

Li dil daxê peşîmanî kişandin
Di sîne derd û xem zêde civandin

Ji ber kibr û xurûr û xefleta xwe
Ji 'icb û ehmeqî hem qebheta xwe

Ji ber ku ew yetîmê bêkes î jar
Wuha bêçare hiştî bê ked û par

Çi kirbû tevde hate pêşiya wê
Perîşan ma û dil pir êşiya wê

Ziyade hesret û ahên di pir dû
Kişandin,paşê ew peşman-i bû zû

Ji destan ketye golê masîyê qût
Wekî fîlê xizan ma qeşmer û rût

"Xesîreddîni we'ddunya" li wê hat
Fexir kir,dî zerer bû şaş û mat ma

Ji ehwalê qijal û rûbehê jîr
Ewan derwêşê dilsafî wekî şîr

Hilanîn 'ibret û pir hikmetê kûr
Ji wê behsê gelek dil pê bûyîn nûr

Geh cam û bade ye,gahi hikayê
Dibêjin,xweş diborînin dûhayê

Di guh geh pendê pîr ê dil wekî xum
Di vê çolê penîrê dil nekî gum!

Fena be da nekî kibr û xurûrê
Nekî beyhûde wek 'ekkû surûrê

Ger însanek te dî ba fexr û xwedbîn
Nîhayet ew dikêşit matem û şîn

Kesê kibr û xurûrê ke di her dem
Dibit lê keyf û şahî şîn û matem

Di vê çola cîhana qeşmer û pîs
Gelek hîle hene pur damê iblîs

Hene rûbahê sehhar ê di pir fen
Dibên goftarê xweş,pê re dikin ken

Çi şellaqî dikin sihran dirêjin
Gelek şêrînxeberdanê dibêjin

Nexapî pê emanet,meqseda wan
Hemî kizb e,nîfaq e me'beda wan

Penîrê dil dibin bêşubhe êşan
Perîşan dê bibî ey can,peşîman!

Peşîmanî tu feyde nade piştî
Wuha bêçare desvala tu hiştî

Bi zahir zahid û batin çû şeytan
Tu elhasil meke guh gotina wan

Muhemmed Eskerî hişyarî be baş
Ji dewra şaş a vê dewrê nebî şaş

Bi teşbîhê qijalê dê bimînî
Eger van gotina nakî yeqînî

Teemmul ke hezer ke Eskerî tu
Wekî rûbeh neçî da serserî tu

# BENDA YANZDA
## ÇÛNA ROVÎ Û KETINA WÎ YA FAQÊ

Bide saqî bike hîmmet ji bo me
Li dil xem cem'i bûne kom e kom e

Vexwun camek wekî agir ku pê em
Bikin ihraqê cumle eskerê xem

Eger ne sayeya serwa te bîtin
Ji dil ev derd û xem kengê diçîtin?

Bi saya qameta te serwiazad
Bibin azade û bêxem wuha şad

Şehagîsû kemenda ehsenê xelq
Bi yarî kuştime ruh hatîye helq

Gelek paşa wezîr û mîr û axa
Bi şîşa dîlberê dil dane daxa

Bi şîşa dûrî yû cama be'îdî
Sîyeh kirne li wan pir keyf û 'idî

Wekî dîna ketin sehra û daxan
Qetandin ew ji yara w qesr û baxan

Ne tenha helqi işkistî me,tenha
Ketin helqê di wan zencîr û benha

Tenê tenha me der narê fîraqê
Ne ez tenha me,pir tenha meraqê

Birin Şam û Iraqê bê kes û jar
Ji derdê dîlberê ta bûne ber,dar

Ne min dar û dîyar e dil berî çû
Esîrê zulfê kirme dil berê rû

Bizane dîlberê ruh û dilim bir
Tenek va ye û tê mane xemê pir

Wekî mûrî zeîf im bê dil û can
Çû morî bê qedir lê dil hemî qan

Sîyeh bextê min e zanim ku heqqa
Wîsala dîlberê bû teyrê enqa

Ne payê rehrewî ne çengê perwaz
Çisan dê qet'i kim van şîb û efraz?

Hezaran hîle û faqê nihanî
Hene zêde di vê rahê nizanî

Cîhana qehpe pir dami hemî jar
Di rahê bê kesan xef anîye bar

Ji lutfa şahê şehzada 'etirnam
Ji wî kûpê mezin dilenwar û pak

Bide camek cîhanbînî hezer kim
Heçî Qafê di rê da ne bi der kim

Bike îhsan evê nefsa teme'kar
Dibit qani' ji îhsana te ey yar

Xenî bîtin ji wê cama sexî dil
Evê nefsa xesîs a kêmiaqil

Mûnewwer bin ji tîrêjê dilê cam
Bibînin faqê dunya te'mik û dam

Nebit wek rûbeh hirs û tem'ê serdeng
Li me bişkînitin pa û ser û çeng

Mebe mislê (di) rovî buxlî zêde
Me têxit faqekê hîna di rê de

Du-sê caman bide da def'ê xem bin
Neheş ke belki merfû-'ul qelem bin

Rica min her ev e bînit xiyalê
Me hêsîrî ewê gerdenxezalê

Ku yar nête di mir'ata dilê min
Qîyamê radikin derd û kulê min

Ne ew fikr û umîda be mehû me
Mirî me zû ji dunyayê e(z) çûme

Meger himmet bikî quwwet bixim dest
Bibim hişyarekî pur zêde sermest

Li faqê ehlê dunya varqilîm ez
Reha bim der rehê dîlber bikim lez

Gelek seyyadê xayîn faqê anîn
Di rahê bêkesê 'uşşaqî danîn

Mûrada wan negîjin tû muradî
Xemî bin ew di nava her 'îbadî

Îlahî qet'i ke vê meqseda wan
Bi wan xe agirê der mefseda wan

Xelas ke aşiqanê dergehê yar
Ji wan munkir neyarê herwekî mar

Ewê husna munezzeh her dem û an
Meke xalî ji mir'ata dilê wan

Bi dîdara xwe şa ke dehşi ke wan
Me jî peyrew hisab ke bexşi ke wan

Bi şewqek zêde ey saqî were xweş
Di vî îşê cîhanê mame bêheş

Bikêşim kelleyê xwe zêde zêde
Tesewwur kim gelek fikrên bi fêde

Li pê hev ger vexwum çend bade bê bak
Umîd e pakî bêtin qelbê napak

Bide hin saxerê gerden tijî dur
Ku pê xweşhalî bin hem dil tijî sur

Ji xummê sala peyma ya cîgernar
Bide mey noşî kim pey pey du-sê car

Bişewtîne hemî efkarê batil
Muberra bit hela ev neynika dil

Di dil de da nemînit xeyrî yarê
Hemî mehw û fena bîtin bi carê

Bide pur camê rengtal ê museffa
Ku şêrîn kim xeberdanê muqeffa

Beyan kim qisseta mayî çewa bû
Dema rûbeh penîr xwari,kuda çû!

Berê min gotibû roja munewwer
Ku alem xerqê nûrê kir seraser

Hilanîbû ji rû terpûş û purçem
Bi cunbuş hatibûn dar û ber û çem

Temamê alemê wan îstîfade
Ji wê nûrê kirin pêde zîyade

Hela ew bexçe û cem'a hevalan
Çi bêjim kohê Tûr e,nayê qalan

Wucûda wan di Tûrê ew şecer bû
Ku enwar û tecellî her li ser bû

Di perda sirr û exfayê dilê can
Nîda:"Înnî enellah" date guh wan

Di wê subhê ewan yaranê şebxîz
Di nav wan dar û reyhanê dilawîz

Geh godarê hîkayê bûn gehî mey
Dinoşîn pê menazil wan dikir tey

Li noşa noşê wan,tev erd û sema
Dikirne gohîdarî mane heyran

Hîkaye d'gote yaran şahê Derwêş
Gelek merhem dida ser wan dilê rîş

Diran şûle bi le'l,û le'lê da dur
Li le'l û lûlû û dur te'ne dan pur

Ku şewqa lûlûwan yaqûtê da der
Te go,qûtê ruh e yaqûtê dîlber

Soxen tezyînê da ezmanê yaqût
Tijî kir qelbê yaran sirrê Lahût

Goher da cem'ê yaranê sedefwar
Dil û sîne ewan bû xizneyê yar

Xenî bû alema nasûtî jê pur
Li ser bû dil ji le'l û încî yû dur

Beyan kir halê rovî ba xurabê
Munewwer kir xet û xalê kîtabê

Ji halê rûbeh wî go ev îbare
Welê sirra dilê wî sirrê yar e

Digo:Rovî penîrê xwe ku tev xwar
Dehen alast û çû ew serserîwar

Wuha ba fexreke pur çist û çalak
Di semt û taxê min re tê ferehnak

Diçim lêkin dikim halê wî teftêş
Ji bo wî,ka çewa tê dawîya îş

Dikim hîret ji van sirrê nihanî
Ku pey pey,rengi reng dibne 'eyanî

Di şehrahê dimeşyam gavekî xweş
Ji wî halî welê ez bûme bê heş

Yeqîn im dê nemînit jê re ev hal
Ji van sihr û nîfaq û gotin û qal

Du-sê gavan diçim gavek li rovî
Dinêrim ez li wî pîrnehsê kovî

Bi rê de naçe wek sahibneyaran
Wiha ket nav ber û dar û zinaran

Wusan ba ihtîyatek zêde û tam
Diçîtin rûbehî pir tirs û ewham

Û lê qet rastî naçîtin du caran
Bi hok û çiv diçe teşbîhê maran

Geh etrafê kevirkî bîn dike tev
Ku perçayek şekal dî digirtin tev

Geh bazda geh li dor hev ew çû û hat
Dida ser sîne perçegeh dibû mat

Ku rabû geh du-sê kêçê xwe girtî
Ji nişkave te dî,wek ba buhurtî

Diloqe gahi hêdî ew diçîtin
Gehî pençe li goşê xwe dixîtin

Dehen davêje şêza geh bi hiddet
Li kêlek geh dixe dûvi bi quwwet

Dike teftêşê ew dar û ber û av
Dimîze geh dikit vala li xwe nav

Te dî,cîkî wuha zû vedxepêre
Dikit bîn û bi dîqqet lê dinêre

Ge guhdarî dikîtin pir bi dîqqet
Li dora geh dinêrit ba feraset

Xwe car nageh digevzîne li erdê
Te dî,rabû xwe pejkandî ji girdê

Ji 'ucbê geh li xwe heyran dimîne
Geh waqîwaq e ew keyfa xwe tîne

Bi vî halî qederkî çûn bi rê de
Gelek hawê 'eceb jê têne pêde

Ji hevdu nê qerîb û nê gelek dûr
Ez û rûbeh heta çûn çayeka dûr

Mi dî nagahi ew rûbahê sehhar
Wuha seknî di cî de bûye godar

Serî bir-anî yû guh zêde mîç kir
Bi dîqqet wî nerî dindani qîç kir

Bi şûnde zû vegerya çendi gavan
Te go,agir kete cerg û hinavan

Zîyade qirqilî jê hate ser hev
Dibawuşî,geh tevzî dane ber hev

Wekî ta girtibe rûbahê qeşmer
Ku hinde gij bûye lerzî seraser

Çi navkutka dike bînê dikêşe
Te go,dil girtîye lew hinde d'êşe

Li dor hev tewlebazî ew dikîtin
Geh pêşde wek dizan hêdî diçîtin

Difişke geh dinêre sax û sol e
Ji kerba gahî erdê ew dikole

Ji dûr ve bîn dikit ew fewqê 'ade
Û lê pêşde qe naçîtin zîyade

Meger yek perçe dûvê herwekî rûn
Dîye wî hîlekarê ehmeq î dûn

Muheyyer ma gelek ew rûbehê pîr
Li wî dûvî muxeddî şubhetê şîr

Dibînit rûbeh wî malê bi qîmet
Wekî hêka ni'amê pir bi zînet

Bi şewq û pur şemal e parîyê xweş
Ku jê ruhnî dibit qelb û dilê reş

Çi nerm û taze ye ew donbeyê pak
Welê rûbeh dibîte jê xeternak

Li ser vê luqmeya saf î sipî,dil
Kete fikr û xiyalan ba dilê kul

Digo:"Bo çi gelo ev ni'metê baş
Li vir maye wuha",rêvî dibû şaş

"Çira bê pasîpan e donbeyê qenc
Guşade bêxwedî ev ni'met û genc

'Eceb nîne li vir donbeh bimîne!
Qe kes nîne yekî wek min hilîne?"

Newêre zû hilîne rûbehê jîr
Evî dûvê temîz,ê mislê pennîr:

"Nebe têda hebe îşê veşarî
Bixwim,paşê li min bit şubhê jarî

Mebada tê hebin pur îş û esrar
Tenawul kim,li min bit her wekî jar!"

Newêra zû biçit ser donbeyê xas
Ji wî,lê çêdibin pir tirs û weswas

Zîyade hîleyî jê his dike her
Û lê hirsa wî ya zêde kire ker

Meraq û îştîhaya pak a donbeh
Heraret zêde kir der qelbê rûbe

Ku hinde îştîha lê zorî kirye
Ji mekr û hîleyan ew kori kirye

Nîhayet çû heta ser donbeyê pak
Bi tirsek zêde û qelbek xeternak

Li dorê çendi caran ew çû û hat
Newêre zû tenawul ke wî heyhat

Te dî,carna bi ser de çewkîya ew
Geh bîn kir heyrî ma,te d'go kete xew

Ji bo rûbeh nema sebr û qerarik
Digo:"Donbeh nexwim dê bibme helik"

Ku hingî arezû lê bûye serkeş
Di destan de nema hîle,di ser heş

Wekî dîna ku dev avête donbeh
Pekî dûv û di feqê maye rûbeh

Neda feyde hemî hîle bihurtin
Nexwari dûv,û rovî hate girtin

Di faqê dil bi kul ma,pa birîne
Çi çare b'xwekira derman tunîne

Temaşa kin,binêrin vê tifaqê
Ji hirsa zêde rûbeh kefte faqê

Ku elhasil birî zora wî nefsê
Birandin hîle lê ew kirye hepsê

Du-sê caran xwe virde wêde avêt
Li erdê da serî,pir xwe hilavêt

Gelek xebtî digel mekr û nîfaqê
Ku bête der ji nav dindanê faqê

Heçî xasûkî yû sihrê li cem bûn
Hemî wî serf-i kirne jê re xem bûn

Nikarit bête der,ne payi jê ke
Nema çare sihirbazî ku çê ke

Nîhayet maye heyran rûbehê pîr
Ji wî îşê bi ser hatî ji teqdîr

Dehî furset nema jê re bibîtin
Ji teswîr û fenê ku ew dikîtin

Geh dev davête canê xwe çirandî
Gehî êş û elem dil lê helandî

Geh pirsê pir 'îtabamîzê gotin
Bi wan can û dilê xwe daye sotin

Digo:"Kanê ewan mekrê di bê hed
Te dî,nefsa te ew jî giş kirin red

Heq û pir muskeheqqê te bikêşî
Ji ber cerh û birînan,dil biêşî

Kuda çûn babê sihr û hîle ey bed?
Li te nefsê derê wan cumle kir sed

Geber be her di vê faqê bi ezyet
Ku da her kes ji te bigrin çi 'îbret!"

Ku elhasil nemaye çare rûbah
Nîhayet çare ma "el hukmû lîllah"

Ji yaran ra digotî pakê Derwêş
Xem û derdê ji rûbeh hatine pêş

Hevalan jî ji vê behsa bi 'îbret
Hilanîne gelek esrar û hikmet

Dinoşan her peyapey cam û fincan
Heta qelbê di wan bû şubhê gencan

Ji kincan cumle 'arî bûn yekayek
Ji cisman ye'nî derkeftin bîla şek

Di 'alem de seraser qet kem û bîş
Nemabû xeyrî yarî wan bizan îş

Ji remz û 'işweyên dîlber wuha,giş
Muferreh pir dibûn hem mest û bêhiş

Bide saqî di vê navê qedehkê
Di dil de his bikin em jî ferehkê

Dixwazim saqîya pir mestî bim ez
Nebim mehw û fena ta hestî bim ez

Tu zanî nabe rahet ev dilê jar
Ji derdê vê denî dunya wekî mar?

Bide ta mehwi bim da hesti bim nû
Ji rengê dîlberê ku mesti bim nû

Bide camek hevalî ey dilara
Ji hiş xistim fîraqa yar û yara

Kerem ke dehşî mame bêyîme hiş
Di dil keyfek nema der ser tu daniş

Bi vî halî nikarim şi'r (û) eş'ar
Nezim kim,qisseyên xweş bikme iş'ar

Ji hev ketme cîger nar û şewat e
Nema min saxîyek şubhê memat e

Nekî ger destegîrî hey nedî mey
Bi vî halî diborit 'umri hey hey!

Ji camê neşe bigrim,pur quwwet bim
Jibîra kim xeman,gavek rihet bim

Vedim der mulkê dil ez dameke kam
Hela çi tête vê damê serencam

Qijal e,bulbul e,'unqa ye,qertel
Xezal e,tilkî ye,ya kelbekî kel

Ji van kîjane bêtin davika min
Xwiya be talihê vê xapika min

Peyapey mey bidî dê keşfi bîtin
Umîda min xezala xeşfî bêtin:

Te dî ku rûbeh mehkem ma di faqê
Di destan da nema îşê nîfaqê

Tu mekr û sihr û fenn û hîlekarî
Neda feyde ne efxan û ne zarî

Di wî halî de tilkî ma perîşan
Ne dad û gazî ye,ne qewm û xw'îşan

Mi dî nagahi yek merdê çû seyyad
Bi wî re hem tufek,têtin dikit cad

Bi se'y û sir'etek zêde,rewane
Welê qesda wî ew faqa yeman e

Me zanîbû ku ew seyyad e bê zen
Diçîtin wa ye ser rûbahê pir fen

Dibînim pir ne dûr e rêvî yû faq
Bi keyfek zêde ew seyyadê muştaq

Giha cem rovîyê heyyal î sehhar
Bi kerb û qehrê lê xistin du-sê dar

Digo:"Ka hîle û mekrê te yê pir
Eya qeşmer,sihirbazê şekaldir?

Kuda çûne hemî keydê xebîsî?
Li kû mane ewan fennê xebîsî?

Ji hirsa zêde zanim pur hewes bûy
Di faqê de perîşan û teres bûy"

Temayî rehberê kê bit bizane
Bi jan e,ew zelîl e w poşiman e!

Li dorê ew du-sê caran çû û hat
Kişandin rûbeh ço,qatek li ser qat

Heta kerba xwe lê rêja bi dilxwah
Ji wî halî kete halek dî rûbah

Wusan lê da heta rûbeh kire sist
Di damê de serî jê kir bi derxist

Bi sebr û ezyetek zêde geber kir
Di faqê ser birî paşê bi der kir

Helanî xiste tûrê xwe bire mal
Temam bû qisseta pir şan û ehwal!

Ji bo yaran ewî Derwêşê pir sur
Xîtam kir ev hîkaya xizne ya dur

Ji wan ra bexşi kirne durrê esrar
Di dil wan zêde bûn esrar û enwar

Ji genca şahê xûban neşeyê can
Çi xweş tenzîmê kir ev 'Iqdê Durfam!

Dixiste gerdena qelbê hevala
Munewwer pê kirin sedrê ne vala

Gelek memnûni bûn meqbûlî dîtin
Ji van durran ku dil mehmûlî dîtin

Ku axir tev ji bexçe şadi Derwêş
Bi derkeftin seyahet kirne der pêş

Ji vê genca duran ey Eskerî tu
Tijî ke dil,mebe her serserî tu

Tu rake zêde engoştê teheyyur
Teemmul ke,tesewwur ke,tefekkur

Çi ne ev cem'ê derwêşan û bexçe?
Çi 'işq e dil dikîtin perçe perçe?

Çi husn e ku dilan tînit kebabê?
Çi sirrek 'alî ye hatî turabê?

Çi saqî ne,çî ye xomxaneyê pîr?
Çî ye ev mest û medhûşanê diljîr?

Çira bulbul nîyaz û zarî ye wî?
Çira perwane sotin yazî ye wî?

Çira dil xwîn e gul mustexnî ye ew?
Çira şem'ê wuha dil pêtî ye ew?

Çira Derwêşi ew îhsan bi wa kir
Li bêçare yetîm dîde zuwa kir?

Çi zulm e pir denî pê mubtela ne?
Çi hirs e ehlê dunya der dila ne?

Çira dozdî penîrê bê kesê jar
Xîyanet kir qijala pîs î mordar?

Çira rûbeh li wê kir sihirbazî?
Te dî paşê çiqa kir ah û gazî!

Nebû qani',te dî rûbeh çewa bû
Di bîra hirs û mekrê xwe fena bû

Çi seyyad û çi faq in ev çi îş in?
Ku daîm dil ji ber wan cerh û rîş in!

Dibêjim,serteser ev 'alema han
Ji hev re 'aşiq û maşûq in,ey can!

Welê her yek bi hawakî dikîtin
Di vî cayê fena ew pê diçîtin

Ji vê 'işqa heyatê hin ememati
Dibînin lê hinik eynê heyatî!

Ji bo te Eskerî ewla ev e:Dil
Nedî xeyri hebîba pak û kamil

Bi wê şewqê vexwe camê mudamî
Di wê sayê ku rahet bî temamî

Wegerne,dê bibî zalim wekî nar
Li xwe,hem jî bikî zulmê li exyar

Mebe zalim dibî paşê tu mezlûm
Bi şûrê heqqîyê dê bî tu me'dûm

Kesî xayîn be her xayîn û rûreş
Diborîne hemî weqtan muşewweş!

Meke hîle w sihirbazî emanet
Ku paşî jê dibînî pir felaket!

Zelîl î,ger nebî qani' di her cî
'Ezîz î ger bikî daîm tu qencî

Xurûr û fexr û 'ucb e karê şeytan
Ji van şeytanî bû metrûdê dîwan

Di sidq û rasitî daîm necat e
Derewgo rûreşê der her civat e

Hesûdî şubhetê narê cehennem
Dişewtîne peyapey qelbê her dem

Kesê bîtin munafiq şubhê şeytan
Cihê wî esfelê safil di nîran

Fesadî,fitneyî bêşubhe ey can
Eşed mîn-el qetli tesrîha Qur'an

Hela hirs û teme' azû bexîlî
Ev in 'illet diya cumle rezîlî

Sexawet nûreke pak a Xweda ye
Ji dil re rehberê rahê huda ye

Li dunya û li uxra fezl û îhsan
Bîlaşek baqî ye bo cumle cinsan

Eyîlîk eyleyîn deryaye atsez
Bîlîr Xaliq eger baliq bîlemez

Eger bîlmezsen baliq,bîl kî Xaliq
Bîlîr gîzlî 'eyanî Rebbê faliq

Bi yarê xwarê xeddar ê cîhanî
Bi vê qebhê mebe bawer tu anî

Bi naz û şîwe û pur hîlebazî
Di rahê Heq,dike dil rût û tazî

Xemê jê keyf in,û keyfê di wê xem.
Çiqa jê dûri bî pur baş e her dem

Ji ebnayê xwe ra zahir çi muştaq
Û lê batin ji bo wan danîye faq

Bi yarî te'mikê sihr û nîfaqan
Çi xweş datîne ew der dam û faqan

Bi mekr û 'işwebazî vê şelaqê
Heta mehkem tu xistî dam û faqê

Heman davêje libsê dîlberî zû
Dimêrîne li rû boyaxike nû

Çû dêwê heftserî,pîra meroxwir
Li te zahir dibit ba xedreke pir

Were êdî temaşa ke 'ecûzê
Bibîne zulm û xedra piştikûzê

Bi enwa'ê 'ezab û şiddet û zor
Di wê faqê geber bî ta biçî gor

Evê dunya ku seyyad e bîla şek
Di rê da faqê danî,nê tenê yek

Tu kor î,ma qe nabînî 'eyanî
Evan tûzax û faqê wê ku danî?

Hezaran şah û sultanê xwedîtac
Di vê faqî fena bûne hemî ac

Hela carek bi teyyara fikir tu
Bi mazî da bi guhdarî bifir tu!

Temaşa ke li 'alem pur şîyar be
Zeman-i borîye,tê da li kar be

Bi goşê dil tu guhdarî bike qenc
Bizanî halê van xelqê xwedîgenc

Bi dîqqet hem veke çavê dil ê pak
Bibînî wan şehînşahê bûyîn xak

Bi musteqbel de wer fir de,nizanî
Ji bo te ka çî ye ku bit 'eyanî?

Heçî çûne nemane eşkera ye
Heçî bên jî ne me'lûm e çewa ye

Mîyanê saxî yû jîn û mematê
Tenê ma yek nefes nefsa heyatê

Me'e mafîh,neyî hakim li vê jî
Ne ku keyfî dibî dîsan dirêjî

Ku çû kare neyê,hat û neçe der
Ev e jîna cîhana zêde qeşmer

Di destê saxî ma yek nefes her
Wuha ew jî zelîl û pir teres her

Ku madem saxîya dunya wuha bit
Di bit qelbê me jî pê mubtela bit

Li xwe carek qe nafikrin bi dîqqet
Çira nakin ji bo xwe hîçî 'îbret?

Şev û rojan dixebtin bê ser û pa
Bi hubba vê denî dunya wekî sa

Çî ye hinde bi ser de kewtikewt e
Bi roj û şev me jê her dil bişewte?

Wekî wê kêzika pîs a gerîne
Me der hembêz e dunya lewitîne

Ji bo me qet ne ca yû mesken e,ev
Ne yarek ba wefa ye,xapik e tev

Neyarek pur cefa ye ev cîhana
Wuha qeşmer,evê pîra zemana

Gelek qehp û durû mislê şev û ro
Binê îro çî ye,ka çû çewa do!

Ji dil derxe huba vê pîrebûkê
Medara pê bike,der qelbê tu kê.

Evê rizqê ezel teqsîm-i kirye
Ji bo muhtacî yû te'mîmê kirye

Tewekkul ke,ewê bêtin çiqa ye
Bizane raziqê 'alem Xweda ye

Ewê hell û fesil kirne hemî îş
Zîyade tew nebe tê de cîgerrîş

Eger karî vexwe mey xem mekêşe
Welê qet'a ji te ruhber neêşe

Bi şewqa yarê bikşîne tu camê
Ku hasil kî di dil de her meramê

Ku madem sermîyan ma yek nefes her
Ewê jî serfi ke der rahê dîlber

Muhemmed Eskerî işê cîhanê
Temaşa ke bibîne hal û şanê

Mebe bawer bi vê dunya ku faq e
Heme fenn û hiyel,mekr û nîfaq e

Mebê tal e,şêrîn e,şor e,mizz e
Binoşe mey ji yarê bigre mijje

Mepirse tarî ye,roj e,çira ye
Mebêje ezyet e,keyf e,çira ye

Heta karî vexwe mey,zewqê bigre
Ji rûyê dîlberê her şewqê bigre

Temaşa ke bi dildarî li 'alem
Ji esrarê nîgarê lê mezendem

Heta ruh der nefes be Eskerî her
Bike însanîyet her dem ser û ber

Û hem xizmet di rahê yara nazik
Mebê tal, û menale,can e carik

Dibêjim,bigre van pendê wekî can
Ji genca şahê şahan ê cîhanban

Di geh geh lê binoşe bade û cam
Di rahê serxweşan bî rindekî tam

Dîqet ke da neşimtî ser serî tu
Di rahê rasitî ey Eskerî tu

Bizane rasitî nûra Xweda ye
Munewwerkerdeyê qelb û dila ye

Kesê ku rasite,nar û şikence
Qe nabînit,û ger dî xêr e,qenc e

Ewanê fikr û niyetrasitî ne
Di her cî serbilind û rûsipî ne!

Şukur ba Xaliqê ku av û agir
Di hev mexfî kir û jê şewqê rakir

Yekî mîzan kerem da sîneya jar
Me pê weznî kelam û sirrê pur nar

Di 'îda ekber û van rojê pur xêr
Temam bû qisseya wek xizne ya zêr

Bi saxî ba selamet ev hîkaye
Xîtam bû,şukri lîllah dî nîhaye

Îlahî pur gunehkar û feqîr im
Di qeyda zulfê dîlber de esîr im

Tu zanî ey Xweda û xaliqê 'alem
Eger îhsan nekî tewfîqike tam

Di deryaya gunehkarî xerîq im
Di narê hubba dunyayê herîq im

Bi der xe min ji vî halê hîlakî
Bi rehma xwe ji êş û derdinakî

Ji bo şahê Rusul,cumle sehaban
Ji bo wan alê şubhê şemsitaban

Ji bo wan 'alimê heqq ê şerî'et
Ji bo wan merdê dilsûz ê terîqet

Ji bona xatirê herçî hucac in
Ku îro der Herem mislê sîrac in

Umîda 'efwê,dergahê te ne ew
Bi roj û şev çûyin bêrahet û xew

Me jî gel wan 'efû ke ey şehînşeh
Bi fezla zêde û cûda munezzeh

Muweffeq ke di rahê dîlbera pak
Li dunya û li 'uqba dil nebim çak

# BENDA DUWANZDA

## XATÎMA KÎTAB

Du sed qintarê şekker şukrê daîm
Ji bo wî xusrewê şêrîn î qaîm

Xwedayê ku şaxek û ney bi hîkmet
Rewan kir çeşmeyê şêrîn î ulfet

Cuwê şêrîn selatê şekkeramîz
Muxalit ba tehîyyatê şekerrîz

Li ser ney şaxê yekta yê nubûwwet
Mudam carî be ta roja qîyamet

Şehê ku ez neyîstan "kaf"ê ba "nûn"
Wucûda bûye mumutazê ez nûn

Û hem ser neyîstanê al û eshab
Çû zer'ê mustewî ber saqê pur ab

Edayê şekkerî şukr û tehîyye
Ku laîqê ji bo şah û re'îyye

Tu zanî, ey şekkerxendê şêrînbar
Ji hîcret çendî telxe kamê naçar

Bedel ev tehlîya ku der dihan e
Şêrîncûyê selamê bîkeran e

Tehîyyatê şekeramîzê şêrîn
Mudam carî bitin ey canê şêrîn

Peyapey subhîrewşen ba şebê tar
Dema dem zuhr û 'esr û gah û êvar

Ji kemter bendeyê mihnet çeşîde
Li ser şaxê nebatê ber gozîde

Li ser terzê qedîm û adetê pêş
Kerem ke yek tesellî bo dilê rîş

Nema taqet qesem bîllah hebîbim
Bişîne noşîdarû,ey tebîbim

Bide destûrê bo le'lê şekerbar
Bike pare li dil sed perde estar

Ji wan le'lê şêrîn şekker binazî
Bide da qelb û ruh pê xweş bisazî

Şeker bişkîn û şêrîn eşkera ke
Ji bo xwe qelb û canê me fîda ke

Tu mest î mestê birjîn şekkerê mest
Ku şêrîn bî ji bo me şekkerê dest

Ji wan mestê te nê xwînrîzî şêrîn
Sehil bêtin bikolim cûyê şêrîn

Ji bo zewqa Şêrîn,Ferhadî rox zer
Kire da dil bi zulfê dil çû şekker

Ne mislê Xusrewan im şahê Şêrîn
Hezîn im ez çû Ferhadê cîgerxwîn

Ji şêrîn î tu ey şêrîna dîlber
Te dil bû wek kulahê qend û şeker

Te kir pare li min dil her wekî ney
Şewatek zêde tê kir wek dilê mey

Ji ber derdê te şêrîna dilawîz
Qelem şebreng û geh gulgûn û Şebdîz

Ji ber şebrengîyê zulfê girihdar
Bi sewda bûye Şebdîzê Şêrînbar

Ji gulxendîdenê Şêrîn ê gulgûn
Qedem der rahê xizmet çû cîgerxwûn

Ji bo wesla Şêrîn,Ferhadê neqqaş
Teber ber ser zed û bû laş û ma şaş

Di rê da ser me danî şubhê Ferhad
Ji dil her tên wekî ney ah û feryad

Terehhum ke şêrîna min şekerkî
Heta key dil wekî ney dax û ker kî

Tu behra şîrê Şêrîn ey şekerken
Umîd nakim qetê' kî şîrê ez men

Di qelbê xameyê şêrîn nihan e
Ku şêrîn jê bi der bê natowan e

Ji şêrînî gelek dûr im Şêrînxwû
Dikim hêvî bi îhsan pertewê rû

Kerem ke ew li vî bêçareyê jar
Kemerbeste bikit wek ney şekerbar

Dikim hêvî ji Şêrîna şekerraz
Xerîb negre ji ber tu aşiqî zar

Wekî ney tayekî Ferhadê dil dû
Ji Şêrîn pertewan xalî nekî tû

Ji pertawê te Şêrîna me xame
Dirêje pir şeker der qelbê name

Bi ummîda şêrîn ev nameya zer
Bi cûyê şîrê de çû mislê şekker

Dibîtin ku nezer de yara xwînxwer
Bi goşey çeşmê der vê nameya zer

Şukur bo xaliqê talî yû şêrîn
Di fikrê da ne şêrîna me bê kîn

Çewan ayîneyê şêrîn e şekker
Tu jî bî neynika ellahu ekber

Kulahê şekkerî ez xakê ber der
Bide ser Eskerî wek tacekî zer

Bila rûzerdê bê talî binoşî
Ji vê şekerfema sîma dipoşî

Çiqasa rûzer î tu wek zerikan
Hela sebrê bike ber tehlîya can

Umîd e zewqa pertawê di şêrîn
Bikit ev qelbê mecrûh ê wekî dîn

Dizanim talîya hîcran kirî zor
Li ser te şahê şêrîn a xwedîtor

Di damê zulfê de mayî perîşan
Ne ehbab û bira ne,qewm û xw'êşan

Tenê tenha dixwî derd û keder her
Ji wê şekkerfemê talî dibî ber

Ewa şêrînxeberdan û kenîne
Ji ber qelbim zirindar û kinîn e

Seraser cism û canim bû zilindar
Ji derdê şahê Şêrîna şekerzar

Ji marê zahir û narê nihanî
Me dîde her dizên teşbîhê kanî

Meger dîse ji bo me saqîyê yar
Bide camê di dil de sehli kit nar

Evî narê fîraqa yar a dîlber
Ku da texfîfî bin xem jê biçin der

Kerem ke saqîya hin cam û fîncan
Merez girtî ji Şêrînê dil û can

Şerabek xweşgowar û hazim û saf
Bide da mehwi kit vê 'illeta nav

Gelek sal e disojîne wekî mûm
Dil û canim helandî fîrqeta şûm

Were saqî heta kengî bikêşin
Ji nazê wê Şêrînê dil bi êş in

Nema carek terehhum ke li halim
Şev û rojan ji vî derdî dinalim

Dikalim her ev e ah û rica min
Li dil ew yara şêrîn bit xuya min

Ku da wê qameta şêrîn bibînim
Ji wî wechê şêrîn xemgîn nemînim

Bi çeşmê dil bibînim qedda şêrîn
Jibîra kim xem û ekdarê dêrîn

Muxennî ger di vî halê keşakeş
Mededkarî bikî çend haweyê xweş

Bi awazê ney û sewta kemanê
Ji vî xom piştî 'ewda pîrê fanî

Bi narê qelbê cam û nexmeyê tar
Bişewtin ev xemê der qelbê wek mar

Ji tesîra evê bezma wekî gul
Ji nû ve saxi bim der alema dil

Bibim medhûşekî dilzîrek û nûr
Bibînim wan şeyê pir dûr û mestûr

Bikim zewqa îşarat û rumûzan
Binasim halê dî pê ra şemûzan

Jibîra nabe nexmesencîya te
Heta roja qîyamet qencîya te

Çikû zêde perîşan im di hîcran
Wekî Mecnûnê bê Leyla di çolan

Sîmenqedda sehîserwa perîreng
Şepal û şox û şenga dil wekî seng

Ji hiş xistim di vê çola fîraqê
Zîyade suhtime der îştîyaqê

Ji 'uşşaq û seba sîgah û newrûz
Birahîmî yû Kurdî lêde pir sûz

Bezîrû bem binalîne dilê saz
Ji wan der dil bibîzin pir sir û raz

Ji işqa yarê der halê cuwanî
Bira dil zewqê ke dîse 'eyanî

Heçî dunya û mafîha bi der dim
Wekî perwane bêm coşê ku ser dim

Temamê deftera alem bikim tey
Bi rahê ruhibexş û naleyê ney

Bide ey saqîyê şêrînfemê min
Bi camê def'i ke derd û xemê min

Bide fîncanike pir nar-i bo me
Welê narê şemala yarê bûme

Xemê dunya û cerhê fîrqeta zor
Bi hev re cem'i bûne dil kirin kor

Bi saxî xistime gorê hebîbim
Ne sax im,ne mirî hem bê tebîb im

Ji rahê ruhê perwer noşîdarû
Bide da kesb-i kim ez saxîyek nû

Ku bêjim halê dewran û xemê yar
Ji bo te,min ji wan tiştê ku daxwaz

Di vî 'umrê sî û neh sal-i de min
Çi dîtî,ma nebîne seng û ahin

Di işqa dîlberê de rojeke xweş
Neborandî wuha min ba dil û heş

Nebû qismet wîsala yar a sertac
Di hîcrê 'umri bû talan û tarac

Kerem ke saqîya camek şerabê
Jixwe yarê cîger daye kebabê

Di bezma şama hîcranê qîyam ke
Li me tenwîrê ke,dil xweş meram ke

Bide serwa rewan yek saye bo min
Di wê sayê bide pur maye bo min

Dilê Ferhadîyê xwe pare kim ez
Dê bîtin 'illeta tê çare kim ez

Bide hiş topi kim êşa dilê sor
Jibîra kim û van derd û xemên zor

Xiyala dîlberê carek di hiş kim
Li sedra bîzebanan ku neqiş kim

Binalînim ewan jê bê xur û xwab
Biherkin eynê wan eşkê di xwûnab

Bikêşim çeşmê name kuhlê ekdar
Bila ew jî bibînit reftenê yar

Li lewhê sîne dim tîr û nişaban
Li dil dax û li gerden pur kulaban

Ji tîrê qewsê dîlber bit birîndar
Ewê hê fehmi kin êşa dilê jar

Xeraman reftinê yarim bibînit
Gelek lê şaş û heyran dê bimînit

Li xwe pur merdomê xafil perîşan
Bikin neqşê dilê dax î bi nîşan

Bide tekrarî ke saqî tu camê
Kîtaba me yeqîn hate xîtamê

Bi kullî defî' ke ekdarê gêtî
Bila der bin ji dil ev nar û pêtî

Bi zewqa cam û şewqa dîlbera tek
Xîtam kin vê kîtabê em bi carek

Bide saqî meya tiryaqî bo me
Kerem ke bo dilê muştaqî bo me

Evê pîra neyar a her wekî mar
Me jê pur xwarîye semm û gelek jar

Tedawî ke tu vî qelbê birîndar
Ku tesîrê nekit lê jehra ev mar

Me pur tecrîbe û teftêşê kirye
Nezer pur der şeh û derwêşi kirye

Gelek derwêşi bûne şah û axa
Gelek axa û şeh dil dane daxa

Bi wê jara veşarî der şeker wê
Bi şêrînxende û pur şor û şer wê

Bi huqqebazî yû sehharîyê pur
Bi şorê naheqî teşbîhê kafir

Hemî mehw û fena kirne wekî xak
Evê qehpa neyar a zêde seffak

Wuha ye 'aqîbet îşê cîhanê
Xelas nabî ji destê bêemanê

Qefes hebs e ji bo me çîsmi xak e
Mekanê morxekî pur saf û pak e

Di vê zîndana xakî ey hevalan
Nekin em tê bikêşin ah û nalan

Di hebsa cismê de dil pare û xam
Nemînin hem nebin mehkûmê î'dam

Emanet zêde daxan lê nedin em
Bi xaran wê gula baxan nedin em

Numûnexane ye w xanek xeternak
Sebir kin qeyd û zencîr in hemî xak

Xunava wê gula sîmayê mehbûb
Ewê bîtin gulê jê bîte meqlûb

Nekin ba morxê qeydê em xîyanet
Bi cuz-ê îxtîyarî xwe emanet

Ewê rokî ji bo me kêri bêtin
Di heqqê me gelek pir xêri bêtin

Bira emn û sidîqî lê zuhûr bit
Çiraxê rasitî tê da bi nûr bit

Çira em dê qeti' kin pertewê pak
Ji vê zîndana tarî perdeyê xak?

Me dunya hebsek e pur zehmet û zor
Xelasî nîne jê ta em biçin gor

Di gerden me hemî fermanê i'dam
Yeqîn e dê biçit herçî xwedînam

Tenê çûyîn nîye ma sed hezar derd
Di vî erdî dikarim ku bikim serd

Were êdî mexwe xewte dilakor
Di vê behra cîhana sade der dor

Gelek bêî'tîbar in cewherê wê
Di dil de cih mede ga û kerê wê

Ji hubba sîm û zer farix be bêxem
Ku da qelbê te nûranî be her dem

Hela ehlê cîhanê exlebê wan
Ruhê ga û kera ne,şekl ê însan

Bi naz û ni'metê dunya dinazin
Ji ber,paşî bikin efxan û gazin

Emanet dil mede dunyaperestan
Xerabtir pir ji vanê xaçîdestan

Qe nabînî ewan şahanê pêşîn
Di kîjan xakê sarî ew dikin şîn?

Di kîjan damê xem de dil perîşan
Dumû'ê dîde wek le'lê Bedexşan

Ji wê sultanîya wan ka çi maye?
Ji wan re ah û hesret maye maye

Bi kullî dil ji vê pîra sihirbaz
Tu berde dê bibî hêja serefraz

Ji ewlad û jin û pertal û şuhret
Bira bawer bike! nabî tu rahet

Eger carek bi wan keyfê bike dil
Hezar carê dî jî dil pê dibit kul

Û hem tûla emel derd û bela ye
Li teyrê qelbê te torek civa ye

Dikit kor û 'ema morxê dilê qenc
Wusan her tê dimînit ba xem û renc

Dibê "Hêja ji bo te mewt-i nîne
Heman rahet be û çaliş be bîne

Nuha nîne mirin bo te menale
Tu her zêde bike mal û menal e"

Ku da rahet bibî şahane zende
Bikî keyfê wuha zewqê bi xende

Ji vê pursê dibî sersem wekî dîn
Diborînî bi xeflet her dem û hîn

Qe nabînî esasê vê heyatê
Li ser ba û hewa hate xebatê?

Mirin gavek ji te dûr nakevîtin
Hewayek boş e nefsa te dikîtin

Ku madem ev heyata pur hewa ye
Tu jî berde hewayê pur pur fena ye

Gur û berxê di cîkî da girêdî
Hezaran nî'met û xweşî tu pê dî

Gelo rahet heye jê re ji vana
Ji xeyrî derd û hesret,êş û jana?

Qe nabînî mirin wa ye heval e
Cuda nabe ji te,her dem li bale

Çi sewda û hewa ye dil kirî dêr
Ji hubba vê cîhanê nabite têr

Bi şorê vê hevala xayîn a zor
Emê mehw û fena bin û biçin gor

Çira hinde emîn î pê,eya dil?
Çira jê noşî kî zehra hilahil?

Ne noş û hingiv e ev şerbeta wê
Hemî xwîna dilê pur hesreta wê

Nebî zînharî pê puştê girêdî!
Bira bawer bikî meylê tu pê dî

Temaşa ke bi dil der vê hevalê
Ji qetl û kuştinê qet nabe xalî

Tu jî yek ferdekî ehlê dinê yî
Evanê kuştine,çêtir ji kê yî?

Te jî dê qetli ke bawer ke pur baş
Meke pê emnîyet qet'a mebe şaş

Heta firset heye her gahê ey can
Vexwe camê li keyfa şahê xûban

Wusan serxweşi be ba zewq û pur keyf
Ku qet'a his nekî derdê kem û keyf

Di vî halî de bimre îxtîyarî
Çi hacet bo te mewta îztîrarî?

Di şewqa dîlberî mehw û fena ye
Li te saxîyek baqî xuya ye

Hela saqî ji wî kûpê serencam
Tijî ke qelbê fîncan û dilê cam

Çi xewxa û şer û şor e di alem?
Çi keyf û şahî ye ev şîn û matem?

Çi tewlîd û çi terkîb in çi îş in?
Çi ecsad û ruh in pur noş û nîş in?

Çi erd û ev çi esman û sitêr in?
Çi aş in ev hemî seryan dihêrin?

Wekî dîn im ji van îşê xwîya ne
Hela derdê mezin,ê ku nîhan e!

Bi heqqê wan xem û derdê xwe kî tu
Bide saqî hela yek camekê zû

Ji min tu hiş bibe hiş bim bi yek car
Ji van derdê mezin dil bû wekî nar

Çi nar û pêtî ye qelbê min î kul
Bi camê muntefî ke agirê dil

Xuya bin zulf û pêçav û gulê rû
Di camê seyri kim der dil hemî nû

Ji wan çeşmê xezalî awurê şîr
Ji wê heybetpilinga ehsen û mîr

Bi medhûşî bibim heyran û sersem
Li wê husn û li wê nûra mucessem

Berî jê bê hiş im bêçare û jar
Çi lazim bo yekî wek min giranbar?

Ji xeyrî yar û saqî mutrib û mey
Mexwaze zêde ta dil pê bibit hey

Mebê "dunya wefakar e ji bo min"
'Ecaîb xwînxwir e xeddar e dujmin

Dixapînit bi van heylazîyê pîs
Te û tiflê dilê te nefsa iblîs

Emanet pê nexapî sed emanet
Ji van paşî diwxî pur ah û hesret

Mebêje ku "şebab e şîwekar e"
Gelek ew pîr e,fertût e,mekar e

Bi wê dava vedaye pur kirin seyd
Şebabê wek te wê pîrê kirin qeyd

Were qenc lê nezer de ey dilê pak
Ji bo paşê nebî jê qelb û dilçak

Tu guh de min muferreh kim rehê te
Guharek gewherîn têxim guhê te

Were guhdêre pendê pîrê dilnûr
Ku pê bî dilbinûr û sînemesrûr

Ji bo qeyda evê pîrê şikênî
Ji dest saqî vexwe camek Cemînî

Ji tesîra di dil de sûretê yar
Texeyyul dê bibit ew yara dildar

Ku dê şewqa cemala dîlber a dil
Di dil ma dimînit qeyd û silsil?

Binoşim mey di dil fanî fena bin
Ji qeyda hubba dunyayê reha bin

Ku ekdarê dinê gavek bi der dim
Ji halê dîlberê hinde xeber dim

Nikarim desti jê berdim çikû ew
Zîyade ehsen e ba şewq û pertew

Welê zêde sitemkar e be nazî
Siyasî yarek e der 'işqibazî

Helandin em di hîcranê şeb û rûz
Di dil de her dişewte pêtî yû sûz

Mil û zendê me badane fîraqê
Wekî perwane sotin îhtîraqê

Sîyehreyhan li etrafê gulê ne
Li hawîrdorê wan jî xar e lê ne

Xunav û avîya wek lûlû û dur
Muzeyyen kirne werda rûperê sur

Binefşe sunbul û nesrîn û nergiz
Bi reqs in ta seher pawançî yû diz

Hinik cezbe dikin hin mest û serxoş
Qîyamê hin dikin hin secde hin coş

Li wê gencê xelek dane du şehmar
Ji miska gerdena xizlan a Tatar

Ewan jî heb di damê da veşarî
Ji bo teyrê dilê xwînxwarê yarî

Te'ala xweş gul û xweş morxîzar e
Nîşanê morxîzaran morxê zar e

'Eceb mame di vî îşê mezin de
Di vê îpekrewa dil wek hesin de

Kesê zîba bitin şekl û qîyafet
Bîla 'eyb û tilî sîma û qamet

Bi xûbê dîlberê ew şahi bîtin
Bi nûr û şûle şems û mahi bîtin

Ji bezl û bexşîşa wê Hatimê Tey
Bûye Hatim xwedanê şuhret û hey

Mukellel heykelek husn û cemal e
Çi ahûçeşmek e gerdenşemal e!

Diheyrim ez di vê yara wuha qenc
Çewan kare bikit ev ezyet û renc!

Dikîtin fewqê 'adet zehmet û zor
Feqîrê muşterî wê tev kirin kor

Dibînim şan û ehwalê 'ecaîb
Di 'alem da,ji vê mehbûba saîb

Nizanim dê çi bêjim wayê weyla!
Ji vî halê dil ê Mecnûn û Leyla

Kî ye ku karibit bê îsmê e'zem
Bigîje qencisîmaya mukerrem?

Ji kû çengê me û teyrana 'alem
Menazil tey bikin bê nûra Adem?

Bide saqî vexwun çend camê 'ulya
Ku dil bê der ji qeyda hubba dunya

Tu camek paka pîrê ruhê mîne
Bide,dil pê bibit ronî yû bîna

Ji vê nefsa denî dil derdinak e
Ku bo şeytan û dunya destbirak e

Herîsa kafira emmare ya pîs
Xebîsa pur şeqî teşbîhê îblîs

Gelek emmare û serkeş di bê dîn
Zîyade sersem in jê her wekî dîn

Ji barê her wuha rûsari bûn em
Di şahrahê edeb bê'ari bûn em

Gelek rûreş,fedîkar û denî man
Ji ef'alê genî dil wek tenî man

Şev û rojan xebîsî ne me sen'et
Peyapey her dikin zêde qebahet

Du rû reş bûne mane gêj û heyran
Çi efsar e,çi tore,ev çi palan?

Di vî îşê xwe yê serkeş de daîm
Tefekkur her dikim,lê qelb e naîm

Çi çare w feyde ye dil bêxeber ma
Di bin barê gunahan bêhuner ma

Nizanim dê çewa bit axirê kar?
Bi vî hawî qe nabe hîçi yekcar

Meger saqî bi tewfîqa zîyade
Ji xomxana mezin hin cam û bade

Peyapey her bide tenwîrî ke dil
Heye îslahi bit nefsa ne 'adil

Ku madem her evê nefsa teme'kar
Bi camê ew dibit îslah û tê kar

Tu jî her lutfi ke ey saqîyê qenc
Bide da vê xebîsê têxime penc

Ku bişkînin diran û pencê nefsê
Bi nûra bade,e'ma kin di hebsê

Bimîne,ta temamî barikin em
Ji vê xana denî ya derd û pur xem

Emê jî koçê kin rokê bi zarî
Ji vî warê çepel,marê bi jarî

Felek bo kes musa'id nîne ey can
Muheqqeq dê fena bin ev ten û can:

Bixwo çavê gelek pîr û şebaban
Bira û yar û xemkerdi yû baban

Me wenda kirn û dane hev heware!
Ji vî derdê me dil pir ah û zar e

Ku ev be hatin û çûna cîhanê!
Çi keyf e tê de xeyrî êş û janê?

Gelek bê i'tîbar e çerxa dewwar
Zîyade qatil e,xeddar e,xwînxwar

Muzeyyen her wuha ba zulf û xalê
Dixapîne kesan ser têne balê

Bi pîra sernigûn bawer mebe qet
Dikit mehw û fena hem ser dike qet

Bi mislê ejdiha yê ku di yek hîn
Hezaran xelqê xwarî,dil tijî kîn

Qe nabêjî zimanê bêzimanan
Dibêjin her dem û an û zemanan

Dikin gazî hezar û parîne gul
Ji ber xeddarîya vî marê xwîndil

Dibêjin hem dikêşin ah û zaran
Hebaheb geştî û dê bîte baran

Evê sergermîya ku der qefa ye
Ji zehra marê pir pêçê hewaye

Te dî,ha ew jî rokê derkete der
Li erdê dê bimînî laşekî ker

Hewa ye ev cîhana bê beqa ye
Tu jê berde fenayê boş û ba ye

Ji ber vî marê xwînxwar ê cîhanê
Ji asîb û xemên vê bê emanê

Hemî serwê qedan ê mislê sunbul
Ku gulpare dibin ew herwekî gul

Tu bikşîn rencê mar û ’eqrebê yar
Ku da jê mestî dil bîte hişyar

Di dama ’eqrebanê yarê da bî
Ji afatê dunî qelbê cuda bî

Dehen pûstesîfet geh leb bi xendan
Bira der dil be narê derdê xûban

Bi zahir lebsekî badir bidêre
Wekî mey agirê dil pê veşêre

Ku yanî zahirî ba xelqê be tu
Di batin de li dîlber bit bi rû rû

Qelem asa bîla qal û bi halî
Li qelb û dil neqiş ke zulf û xalê

Wekî tiflan bibexşîne dilê xwe
Ji esrarê nîgarê van kulê xwe

Wekî xame bi dîlê dil tu halê
"X"ê û "cîm"a hebîbê behsike lê

Qe nabînî dil û qelbê hurûfan
Wekî deryayê Qulzem van zurûfan?

Hemî durrê me'anî ne dilê wan
Ne ba deng û seda ne ev xeberdan!

Ji behra mulkê ruh ev cewherana
Ketin qelbê hurûfê şubhê kana

Dilê wan pur xeberdan in wekî can
Û lê zahir sukût in,mest û heyran

Tu jî şubhê hurûfan bêxeber be
Di kana alemê de mislê zer be

Ne ku bulbulsîfet derd û kulê xwe
Bi ah û zarîyan bêjî kulê xwe

Dibêm,perwaneasa be di alem
Ne ku bêjî wekî bulbul kul û xem

Bîla qal û bi halê neqşê ke sir
Evan xal û xetan şubhê qelem pir

Tenê gotin nebe,karê bi sotin
Henavan dax-i de bêqal û gokin

Dibîtin ku ji marê dewra pir jar
Reha bî lê bi marê gerdena yar

Nexwî jehra jiha yê yarê bêtî
Dixwî bêşubhe jara mar ê gêtî

Mebe şubhê hebabê xerre ber av
Bi ger û bazîyan,bo bayê der av

Bila baran dibarîne hezer be
Bi xerbek dî biçit ba dil bi ker be

Şiyarî ke welê dil ke siyanet
Ji qews û tîrê dunya purxîyanet

Dide ser xwarîya xwe tîrê xwarî
Li qelb e her ewê derba neyarî

Dibînî xedrê dunyayê tu daîm
Nebî tê da biborînî tu naîm

Dibêjim hasilê guhdarî be,tê-
Diborin weqt û lê hişyari be ti.

Were saqî bide camê tu dîse
Ji dil guh dim evan pendê nefîse

Ne ew be,zêde bê'eql im hewakar
Ji kû der goşî kim van durrê şehwar

Gelek bêçare û bêqûti mane
Ji derdan dil wekî yaqûti mane

Bide saqî meya gulgûn û safî
Ji bo qelbê me wê derman e,şafî

Bi saya pîrê mazin mey binoşim
Ji pêsîrê xezalan sir bidoşim

Xwedî kim ez evî qelb û dilê jar
Bi şîrê ahû û xizlanê Tatar

Ku çapok bin di îşê gotinê kar
Di wan şûle bidin şewqa rûwê yar

Di karê şi'r û eş'aran sivik bin
Ji vî şîrê di wan me'nî gelek bin

Gelek nukte mu'emma û sir û raz
Ku tê da bin zîyade îşekî şaz

Bide min eşkera saqî tu bade
Fîraqa dîlberê kuştim zîyade

Ji hiş xistim nema qet îstîrahet
Evan tofanê xem dil kir hîlaket

Çi tofan û bela ne her demadem
Dibarin ew li vê dunya wekî sem?

Kesek nîne ku jê bêpare maye
Welê zêde ji bo 'uşşaqî daye

Ji narê fîrqet û derdê cîhanê
Nizanim dê çi bêjim bê beyanê!

Me xame lengî bû,ma 'aciz û zar
Ji vî derdê me yê purateş û nar

Qelem jî şaşi bû,ma lal û heyran
Ji van daxê dil ê ku bûye buryan

Nikarit ew dehî neqş û nuqûşan
Û hem xweş çêkitin şikl û numûşan

Li wê jî sedr û dil şeq bû heta nav
Di dev re tête der xwûna dil û nav

Nîhayet mane bêçare,cîgerşeq
Ji derdê dîlber û dunyaya naheq

Nizanim şev şev e,ro ro hemî şev
Me borî 'umri bê hasil wuha tev

Di hebsa zulmeta ten de şev û ro
Çî ye îro nizanim qisset do!

Perîşan û wuha pejmorde ne em
Ji pêsîrê xeman xwînxurde ne em

Meger dîlber ji rozulfê wekî şev
Ji rûyê fezl û îhsanê bide hev

Ji nûra wî rûyê xûrşîdê nûrîn
Li me rû vêkevit bin ronî û dîn

Ku saqî jî di vê navê du-sê cam
Bide noşim li ruwwê dîlbera şam

Ji nûra bade û dîdara saqî
Heye ba dîlberê dil bit mulaqî

Dibim azade û xalî ji derdan
Dibin rahet hemî daxê dilê jan

Weyane kengê ez karim îfade
Bikim behs û beyanek saf û sade?

Werîne saqîya dîse tu hin mey
Ku da çola xeman tevde bikin tey

Di dil de deftera xem tey bikin em
Bi nûra badeyê dil hey bikin em

Ji wê meyxaneya pîrê munewwer
Bide hin camê nûranî mukerrer

Bi qelbê paki em vê nameya pak
Bigînin xayetê pê bin ferehnak

Evê dara ku hinde xizmeta wê
Me kir,weqt e vexwun em şerbeta wê!

Bide da xetmi kin vê deftera xwe
Bi keyf û serxweşî NEQŞÎBERa xwe

Temam kin da nebin têda fedîkar
Evan neqş û nuqûşê pertewê yar

Bi saya şahê Şêrîna xwedansur
Teheyyur tê bikin ehlê xired pur

Hemî bêne temaşaya şekerxend
Ewan sînesîmî (yê) leb wekî qend

Eger ev zor û hîcrana nebûna
Li vî qelbê min î mestê 'uyûna

Daha şêrîn û rengînlefz û me'na
Di vê namê xuya bikra çi re'na!

Welê dil ma di hîcrana ker û lal
Ne sax û ne mirî ew her wekî kal

Di fetlê zulfê yarê ma perîşan
Ji dîde her dizên le'lê Bedexşan

Bi çola xistine b'deşt û çîya wê
Di ferqê dil li me kir du cîya wê

Serasîme perîşan û cîgerdax
Ketin deşt û newal û mêşe û dax

Seraser mehwî kir ruh ji xwe ten wê
Bi marê biskê wek miska Xeten wê

Bira meqtûlê marê yarê bim ez
Ne ku şahê dunê xeddari bim ez

Bide,wext e ji vê bezmê ku rabim
Ji bihna dîlberê sukran berabim

Heta sax im li dunya ba nefes bim
Di 'uqbayê jî wê dîse teles bim

Bira dunya û mafîha neyê dil
Ji xeyri şehrîyarim cuzî û kul

Bûye mîladî sala wek biheşt e
HEZAR û NEHSED û hem SÎ yû HEŞT e

Di HUVDE MARTÊ vê subha munewwer
Temam bû xatîma ew şubhetê zer

Û lê sala me ya romî HEZAR e
Û hem jî SÊSED û PÊNCÎ yû ÇAR e!

Ji Marta wê çûye şeş ro wuha tam
Xelas bû xatîma vê 'IQDÊ DURFAM

Di heftê-heştê rojan de temam bû
Evê 'Iqda durr î moşkî xîtam bû

Xîtam bû xatîma mektûba zerbext
Di sala yek HEZAR û PENCI yû HEFT

Ji hijmarê 'Ereb tiştê me gotî
Di PANZDE MEHREMÊ dil pê me sotî

Di PENCŞENBE di roja pur mubarek
Temam bû ev kitêba me bi carek

Dikim şukr û sena ba qelb û ezman
Demadem bo îlahê erd û 'ezman

Muweffeq bûme name hate xayet
Xweda kir fezl û îhsan û 'înayet

Welê derdê min î zêde serî da
Li min can û cîger tevde kerî da

Muherrem bo xabîsê cîcehennem
Gozîde ehlê Beyta fexrê 'alem

Ji bedbextî şehîd kirne perîşan
Dehenxişk û cîgernar û perîşan

Ji ber mezlûmîya şahê şehîdan
Kitêba me kete şînê cedîdan

Sîyeh poşame û tev cumle û herf
Ji çavan hêstirê xwînê dikin serf

Cîgernar im ji vê behsa cîgernar
Dixwim xwîna dilê pir bê hiş û jar

Şewatek zêde kefte qelb û sîne
Ji vê behsê dil û sîne birîn e

Kete fikra me zulma exbesu'nnas
Yezîdê pur 'eleyhîlle'ne-xennas

Di vê mahê Muherrem da Huseyn im
Digel şehzadekanê nûra 'eyn im

Şehîd kirne Yezîd û qewmê zalim
Ji vê dilxeste me zêde dinalim

Di deşta Kerbalyê bê kes û yar
Perîşan û şehîd kirne cîger nar

Û hem jî mudde'î bûn ew ku goya:
"Em in ummet" dibûn bêtirs û goya

Ewî îşî kirin wan zalimana
Di heqqê ehlê Beyta canê cana

Ji dil ez pê ne razî me dibarim
Çewan pê razî yî ey Girdîgar im?

Hemî tev qurret-ul 'eynê Hebîb in
Museffa tahir û pak û necîb in

Bi zulmek zêde û hetk û heqaret
Ji destê wan vexwin camê şehadet

Çewan rehmê li wan kafirderûnan
Rewa bînî bikî bo pîsê dûnan?

Cedê wan jî dibîte ma rewa kit
Ji bo wan dê şefa'et ew çewa kit?

Yezîd û 'Emr û Şemr û Îbnî Zeyyad
Di esfelsafilê wan şubhetê 'Ad

Bi şeytanê le'în re tevlî esker
Ewan rûreş-xebîsanê di pir şer

Di nîva qitr û qitranê ewana
Ewan şeytanruhê cehnemmekana

Mu'ezzeb ke bi enwa'ê 'ezaban
Ewan kafirmîsalê wek kîlaban

Îlahî şubhetê tavî di baran
Bibarîne li wan le'net bi baran

Mucedded ke tu her le'net di her hîn
Li wî qewmê xebîsê murted ê dîn

Cedîd ke le'netê her hîn û ezman
Li wan kafirkesanê şubhê şeytan

Di her hîn û di her roj û di her şev
Meke qet'ê bibarîne li ser hev

Heta mulkê te baqî bit mudamî
Li wan ke le'net û qehra temamî

Îlahî pir dikim zarî li babet
Di heqqê me bike lutf û 'înayet

Tu settarê û xeffarê gunahim
'Efû ke,setrê ke,tu yî penahim

Meke riswa û rûreş der du 'alem
Minê pirzenbidarê ba kul û xem

Bi heqqê zatê bîçûnê xwe kî,min
Meke riswa di wê roja texabun

Me her fezla te ye ummîd û hêvî
Ne ew bit,pur dikêşim serneşîvî

'Emel nîne di dest im fezl û îhsan
Ji xeyrî fi'lê bed hem pîsê pirsan

Gunahê hinde min der bêrizayî
Wusan kirne ew îşê bêheyayî

Bi xeflet 'umri borandî heme weqt
Sîyehrû bûme û hem zêde bed bext

Hezaran wayê weyla bo minê jar!
Dizanim layîq im bo ateş û nar

Dikêşim pur 'ezaban der cehennem
Ji ef'alê şenî' û fikra sersem

Mu'ezzeb min meke Perwerdîgar im
Feqîr û dilbirîndar û neçar im

Bi rehma xwe meke ey xaliqê hey
Bi şîşê qebhetê min can û dil key

Dikim zarî bi heqqê Mustefa kî
Û hem cumle resûlanê Xweda kî

Bi cumle enbîya û peyrewê wan
Xusûsa "çarîyar"ê çêtirê can

Dikim hêvî yû her dem pur ricayî
Ji bona xatirê ehlê 'ebayî

Me şermende meke nêv yar û exyar
Li dunya û li 'uqba bê kes û jar

Ji bo şahê şehîdê heqq ê mezlûm
Ji bo wê ehlê Beyta pak û me'sûm

Bi heqqê cumleyê al û sehaban
Ewên necmê huda pir şewq û taban

Bi heqqê wan şehîdanê hemî xwûn
Bi zatê hûşîyarê mest î mexzûn

Li me rehmet ke ey Rebbê rehîmim
Tu zanî pur gunehkar û zemîm im

Bide bo fexrê 'alem îzn û destûr
Şefî'ê min bitin ew heykela nûr

Ku da rûreş,fedîkar û perîşan
Nemînim ez di wê roja bi nîşan

Ji lutfa seyyîdê 'alem bibînim
Di roja mehşerê şermî nemînim

Şefa'et ke Resûlê Rebbê qadir
Xelas bin em ji pêt û lehbê agir

Neke der min ji nav ummet feqîrim
Ji bo min melceyî ey destegîrim

Şefa'et ger nekî min rûreşê bed
Ji destê van gunahê hinde bê hed

Xelasî nîne zanim pur hîsaban
Dibînim hem di cehnem de 'ezaban

Bi fezla xwe me ey Rebbê qedîr im
Bixefrîne,gunehkar û şerîr im

Ji bo şahê Neqşîbend pîrê pîran
Behayê bê buha der dîn û îman

Ewê şahînşehê genca yeqînê
Bi zikrê qelbî yû narê evînê

Rîya û kîbr û nifq û buxl û pîsî
Hemî sûzane enwa'ê xebîsî

Qelem bikşîne ser cumle xetayim
Mu'ezzeb min meke çendan sezayim

Bibexşe wî neyîstanê derûnpak
Çû gul xwînxorde ne dil pare û çak

Bi heqqê pîrê rind ê mestûr û mexmûr
Bi heqqê 'aliman ê dil hemî nûr

Bi heqqê 'aşiq û me'şûqê dilsûz
Bi ah û naleyê wan her şev û rûz

Bi heqqê wan gulê bax ê cemalî
Ku dil her dem ji wan tên ah û nalî

Minê rûreş,gunehkarê 'emelpîs
Bibexşe van û hem dilzadeyê 'îs

Eman sed el eman bê kes feqîr im
Di pencê nefs û şeytan de esîr im

Bike rehmet li min bê dest û pa yî
Ji destê van xebîsan de rehayî

Ji şahê Neqşîya û peyrewê yar
Dixwazin hîmmetê her weqt û her car

Li dunya û li 'uqba weqtê bê weqt
Dikin hêvî ji lutfa şahê pir bext

Gelek mexlûb in û zêde hezîn in
Di bin barê guneh,sîne birîn in

Bike şefqet li me rehmet eya Şah
Ku wundarê ne şaha bîne ser rah

Ji van ef'alê pîs ê xwe me tewbe
Îlahî red meke vê tewbeya me

Ji bona xatirê xeyr-ul beşer,tu
Evê tewbê qebûl ke der qeder tu

Ji bona xatirê van ruhê mazin
Qebûl ke ya Îlahî tewbeya min

Muweffeq ke di rahê rasitî de
Heçî heqq e ji bo me nasîtî de

Heta axirnefes tewfîqê Barî
Ji bo me lutfê kit her dem bi yarî

Bi heqqê wan cîgersûzê celalî
Nekî mehrûmê dîdar û cemalî

Neçar û bêkes im zêde gunah im
Tenê rehma te ummîd û penah im

Di weqta nez'a ruh erwahê pîr im
Di îmdadê bişîn wî şahê mîr im

Di zumra wî şefî'ê zenbîdaran
'Efu ke Eskerî ba cumle yaran

Me û dê w bavê me cumle musulman
Bixefrîne heçî mu'min tu hemyan

Digel zumra hebîbê Xaliqê kul
Bişîn cennet bi şadî bê xem û kul

Sehê Eshabê Kehfi te ji bo wan
Çewan bexşî,me jî bexş ke ji bo van

Di mulk û nî'metê baqî de hergeh
Temaşa kin ewê husna munezzeh

Te "Lewlake" emri kirye di Qur'an
Di heqqê wî hebîbê nûra çavan

Eger meqsed ne ew nûra mucessem
Bûya,mewcûd-i nedbû hêjî 'alem

Te xelqandî hemî ev 'alema han
Ji bo wî Mustefayê şah ê şahan

Me bo wî ruhê e'zem ya Îlahî
'Efû ke,setri ke cumle gunahan

Musetter ke bi wê setra xwe ya baş
Di nav 'alem de nebne qebhet û şaş

Ji bo wî min feqîrî ger tu şa kî
Ji çengalê 'ezabê xwe reha kî

Esîrek wek min ê dilpare mehzûn
Bi rehma te bibit mesrûr û memnûn

Ji wan deryayê rehma bê ser û bin
Çi jê nuqsan dibîtin ey Rebê min?

Di heqqê lutf û îhsana te ya kul
Dikim ez husnizennê ba ruh û dil

Gelek bawerqewî me dê 'efû kî
Ji rehma zêde zenb im tev mehû kî

Hezaran hemd û şukrê pakî dîse
Selat û hem selamên pur nefîse

Dibêjim hem muza'ef bin mukerrer
Ji bo Heq hem li ser zatê Peyxember

Li ser cumle sehab û peyrewê wan
Bi teb'îyyet heçî ummet li hemwan

Heçî hate dinê çûne yekayek
E'jî rokê diçim bêşubhe bêşek

Qîraet ê bikit ya guhidarî
Li vê behsê,evê namê bi yarî

Du'a kin hem bixwûnin fatîhe hûn
Ji bo min rûreşê şermende,mehzûn

Me dîse tevde nalîn û rica ye
Ji wê îhsan û lutfa bênîhaye

Îlahî Eskerî tevlî hevalan
Bi rehmet 'efwi ke van pur webalan

Şukur ya Reb ji bo te name nam e
Xîtam bû hem rehet bû xameya me

Hejmara tevekê beytê vê kitêba 'IQDÊ DURFAM digihîje:6579 Dawî hat. Temmet.

Elhemdu lîllahî Rebb-îl alemîn, selat û selam jî li ser Hebîbê Kerîm û li al û sehbîn,amîn.Temam bû nivîsandina muswedda diduya yê kitêba 'IQDÊ DURFAM di roja pêncşembê di gundê BÎRSINÊ,li ser destê Muhemmed Eskerî kurê şeyx Ebdurrehman lawê şêx Hesenê Nûranî, Aqtepî. Xwedê muqeddes bike esrarê wan û me jî bide xatirê wan û me û xelqê vî gundî û temamê musulmana,ji bela û afetê xwe muhafeze bike amîn,bî cahî seyyîd-îl murselîn. 18 Mayîs 1942, 12 Rebî'ulewwel 1362, Romî Mayîs 5,1359.

Minnet û sipasîyê bêjimare,ji Xwedayê te'ala re bin.Selavê pak û giranbiha li ser Peyxember û al û sehb û peyrewê wî bitin.Temam bû nivîsandina duwanzdeh pergê di mayî ,ji kitêba 'IQDÊ DURFAM li ser destê Z...ê Amedî yê kurê mela R... Xweda wan bi rehma xwe bibexşi, di roja sêşemmê li şehrê Diyarbekrê.
Muherrem Hicrî:24,14O1.Araliq Mîladî: 2,198O.TEMMET.(dawî)

# NAVEROK

1- Pêşgotin .......................................... 5
2- Benda Ewel .......................................... 7
3- Benda Duwem .......................................... 16
4- Benda Sisiya .......................................... 29
5- Benda Çara .......................................... 35
6- EV ZEYLA SEBEBÊ NEZMA KÎTAB .................... 47
7- Benda Pênca .......................................... 60
8- Benda Şeşa .......................................... 69
9- Benda Hefta .......................................... 77
10- Benda Heşta .......................................... 87
11- Benda Neha .......................................... 103
12- Benda Deha .......................................... 122
13- Benda Yanzda .......................................... 151
14- Benda Duwanzda .......................................... 172

# ŞÊX ESKERÎ

# IQDÊ DURFAM

**( Çîrokên bi helbestkî)**

**Wergêr ji tîpên Erebî:**

**Zeynelabidîn Zinar (Kaya)**

ISBN 91 87730 16 - 2

**Weşanên Apec-tryck & Förlag**